

Destan-Helbest û Mîtolojiya Huriyan

Alî Huseîn Kerîm

گه و النامه كئب



Instîtûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist-Almanya

Destan-Helbest û Mîtolojiyên Huriyan

Niviskar: Alî Husein Kerim

Redeksiyon: Dadil Xoçvanî

Edîtor: Muzaffer Avşar

Grafîk: Avşar Grafîk

Berge 1. G. Buccellati ve M. Kelly Buccellati q4 – DAM
b/ Iyre a

Berge 2. Muzexana Louvrê AO 19938

ISBN: 3-93093-64-6

Çapa Dudemîn 2004, Constanta

alikerim2001@yahoo.com

©Ali Husein Kerim

هه‌و‌نا‌مه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Weşanên

Institûta Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist-Almanya

Körnerstr. 94, 58095 Hagen, Tel.: 00 49.23 31 97 18 913

institutakurdî@yahoo.de

www.enstituyakurdi.com

| | |
|---|-----|
| Naverok: | |
| Pêşgotin | 5 |
| ETÎMOLOJIYA NAVÊ HORIYAN | 9 |
| DESHILATDARIYA LI EZMÊN | 15 |
| HELBESTA ULLÎKUMÎ | 23 |
| ÇÎROKA APPÛ Û DU KURÊN WÎ | 47 |
| ÇÎROKA ÇELEKÊ Û MASÎVAN | 51 |
| ÇÎROKA KEŞŞÎ'YÊ NÊÇÎRVAN | 53 |
| ÇÎROKÊN GURPARANZAÛ | 57 |
| DESTANA KURDO | 59 |
| Tarûmara Mala Kurdo | 62 |
| Qasid peşniyarên aştiyê ji Kurdo re dibin | 71 |
| Dema pesindayîna horiya'yê ! | 72 |
| Xweda bi zewaca Kurdo qayîl dibin û mizgîniya heyşt kuran didinê | 73 |
| Piştî Xilasiya Homandinê pêşbîniya şeş keçan jî vedibêjin | 74 |
| Kurdo Hevsera xwe re dibeje bila ziyafetekî amade bike û “boxe” û “mamizan” jî dawet bike! | 75 |
| Horiya ziyafetekî amade dike | 76 |
| Horiya'yê mêvanan vedixwîne ziyafeteke nû | 77 |
| Ji devê kesekî nayê nasînê re peyva cinaze der tê | 77 |
| Hişkesalî raselitiye û cotkar derdê baranê de ne | 82 |
| Kesekî nenas, anegoreyî fermanê bang li qasidên xwedayan dike | 82 |
| ŞIVIRA NANKOR | 89 |
| Şivira Nankor bi Zimanê Horiyan | 90 |
| Analîza Çîrokê bi Zimanê Kurdî | 91 |
| Şivira nakor bi Kurdiya Nûjen | 96 |
| ÇÎROKA TASÊ | 99 |
| Analîza Çîroka Tasê bi Zimanê Kurdî | 100 |
| Çîroka Tasê bi Kurdiya Nûjen | 103 |
| SIRÛDA TEŞŞÛB | 105 |

PÊŞGOTÎN

Hizra li nivisandina derbarê Horiyan dema min pirtûka “Kürtçe Etimolojik Sözlüğü“ amade dikir, di hişê min de ser û ber bû. Ez gihîştim encama ku Zimanê Horiyan kurdiya 5000 salan berê ye. Ev tespît kar û barê ji ber xwe derxistin, fişal û nepixandinê nîne. Ji ber ku hemû çîrok, helbest û hwd. yên horiyan ku bûne mijara vê pirtûkê ji belgenameyên dîrokê hatine berhevkirinê.

Herwusa pêngava destpêkê ez li rastî nivisareke horiyan ya III.‘min hezar salên B.Z. bûm. Ev nivisar ji hêla şahê horiyan Tiş-atal ve li ser pêykerekî ji mefreqê hatiye nivisandinê û naha li mûzexana Lûwrê de ye. Despêka nivisarê wusa ye: “*Tiş-Atal endan Urkeş*” ango bi kurdî dibe “Tasê Ato endamê Jorkaş”. Dema ku mirov Kurdiya pênc hezar salan berê û ya nûjen dide ber hev diyare bi tenê çend heb dengan cih guhortiye. Di wuşeya *endan* buye *endam*, şûna dengê *n* dîsa dengê ji firnika poz dertê ango *m’yê* cih girti ye. Helbet her navek xwayî wateyekî ye. *Tiş*: tîjik; *atal*: betil; *endan*: endam; *Urkeş* jî navê bajarê kevn yê Tel Mozan’a girêdanî Amûdê ye û wateya *jorkaş* diçingîne. *Urkeş/Ûrkeş*, di Kurdiya nûjen de tê wateya bajarê ku li kaş hatiye avakirinê.

Agahiyên zanyaran di derbarê horiyan de hîna tewaw zelal nebû ne. Ji ber ku hinek ji wanan dibêjin: “Horî ji başûrên Kafkasan hatine Mezopotamya’yê”, hinek ji wana jî dibêjin: “Naxêr! Ew gelê herî kevn yê herêma Mezopotamya bakûr in”. Rastî bi kolandinên arkolojîk yên dawiyê vê hizra dudemîn piştras dikin. Lewre çanda horiyan ji Kafkasan heya li ber Misirê belaw e. Lê belê navenda wê Kurdistane. Mirov dema şopgera destxistinên arkeolojîk, şêwe çandên hingê li ber çevan re derbas dike, hingê dikare bibe xwadiyê nêrînên mîsoger. Yeqîniya min, horî ji Serdema Neolotîk ya qonaxa bê amanên axî nîştecihên Kurdistanê bûn. Bermaweyên avasaziya xaniyên gilover, edetê wan yê gorkirina miriyan, dayîna balindeyan bi

nêta boraqê, pesindariya hîv û rojê, kevneşopiya dara pîroz (Dara Herherê), çêkirina amanên axî ji yê bê çerx û bi astar û yek rengî heya yên pir reng û pir xemilî her tiştî eşkere dikin.

Herwaha, sazkarên şaristaniyên Kûra-Erez, Tel-Xelef, Zarziyan, Biradost û Ubeydê êl û eşîrên horiyan bi xwe ne. Dibe ku ewana ji despêkê nav û kiryarên xwe bi rêya nivisaran nehîştine. Lê belê horiyan li Gewarûkê, Qaqizmanê, Karaza Erzoromê, Newala Çoriyê, îşkefta Dêreserê, Çemê Halanê, Göbekli Tepeyê, Şanîdarê ta li Xirbet Keraka Filistînê û hwd. fotoromana çanda xwe û rûdanên wê bi rêya wêne, pîrotgerî, pêyker û avahiyan ve destnîşan kirine.

Bermaweyên çanda horiyan hindî zêdene ku li ser erdnigariyeke pir berfireh mîna okyanusê bê serûber in. Ya rastî, dema ku mirov Çanda Horiyan û ya serdemên antîk û nûjen bi kemperî hev dike, ji ber wekheviya wana şaş û metal dimîne. Lewra, çavkaniyên ji piraniya ol û baweriyên heyî çand û hunera horiya ne.

Min, di vê pirtûkê de hinek nivisarên ji Zimanê Horiyan wergerandiye bi Zimanê Kurdî. Şeweyê wergera nivisaran yekser û neyekserin. Ji ber ku horîkî zimanekî pir dewlemend û pir zarav e. Di encama rêbaza wergera nivisarên horiyan sê rastî derketin holê: Ya yekemîn, tespîta kurdiya Serdema-Tuncê ye û ew jî Zimanê Horiyan bi xwe ye. Ya dudemîn, Zimanê Orartuya ye û ew kurdiya destpêka Serdema-Hesin e. Ya sisemîn kurdiya bi Hind-Ewropi ve hatiye honandinê ye. Ya çaran kurdiya kevnare û ya pêncan jî kurdiya nûjen e.

Ji ber vê egerê hin pêyiv û navlêkên horîkî di kurdiya nûjen de pila yekemîn nayên bi karanînê. Lêbelê, her çiqasî hin deng ketibin yan jî cihê xwe guhortibin jî, hemû peyiv û lêkdanên horîkî di curbecur zarav û devikên Zimanê Kurdî de dijîn. Ew, heroj û hergav di guhên mirovan de deng vedidin.

Ali Husein Kerim

Wateya durf û tîpan:

| | |
|---------|---|
| [.....] | peritiye |
| هه | hinek jê tê xwandinê |
| (...) | ji niviskar |
| | berdewam dike |
| ----- | aliyê din yan jî stûna dinê |
| ? | tekûz nîne |
| xx | diyar nebû |
| “ ”: | axaftina kesan |
| ‘ ’ | wateya pêyvan, axaftin di nav axaftinê de. |
| h | <i>h</i> ya ji gewriyê dertê |
| š | š |
| ž | z yan jî j |
| Bn. | binyêrin |
| Hwd. | her wekî din |
| *....- | pêyvên bingehîn |

هه و النامهه كئيب

ETIMOLOJİYA NAVÊ HORİYAN

Gengeşiyên li ser wateya navê horiyan her berdewam dike. Li Asya Nêzik gelek pêyv û navên ku durf û şikên navê horiyan didin hene. Girînge ji nava wanan yên herî guncav û rast bêtin hilbijartinê. Dema ku etimolojiya navên gelan têye selimandinê divê ziman, çand, bawerî, erdnîgarî û taybetiyên giyanî yên wana berçev bibin. Mînakî: dibêjin navê parzemîna Asya, ji welatê rojhilatê hîtîtiyan Azû'yê ma ye. Ango welatê eşîra Aziyan¹ ma ye. Herwusa ev navê gela ne. Lê belê dibe ku ev nav ji pêyva horiyan *asû*, ya ku bi di kurdî de ji wateya *aso*² yê derhati be.

Someriyan bi xwe re digotin sereşik. Sedema vî navî ne bitenê girêdayî porê wana yê reş e. Lewra porên bi dehan gelên wê heremê weke yê wana bûn. Yek dikare vê mijarê bi rastiyeke dema naha ve şîrove bike. Di Kurdistanê de rengê dolbendên serê endamên eşîretan cûda cûda ne. Heta mirov bê ku yekî nasbike ji dolbenda serê wî dizane ew ji kîjan eşîretê yan jî heremê ye. Mînakî: Li Başûrê Kurdistanê mirovên ji Konfederasyona Barzaniyan bi kefyaya sor, yên herêma Soran ya bi reş belek, ya Hewreman reşê bi şirik serê xwe girê didin. Ango dibe ku navê sereşik yê sumeriyan jî ber serpoşanê rengê reş be.

Etimolojia navê horiyan mirov dikare bi çend heb paradigmaya ve şîrove bike.

Paradîgma yekem, pêyvên bi wateya roj û teyran didin: Sum. *(h)u-ri-in* 'teyr', PHA **her-*, *hor-* 'teyr', Hurr. *eribuski* "teyrebazê Teşşûb yê baskê wî ji zêr", Hurr. *herarî* 'bask', Hîtt. *haran* 'teyr', Gr. *orneon* 'teyr', ON *ari* 'teyr'

¹ Eşîra Azo, Azî yan jî Ezî li Çêwlik û dor û berê wê ne. Herwaha ev herên rohilatê hîtîta ye.

² *aso*: ufiq, şifaq, rohilat

Mısır *horus/haru/hor* ‘xwedayê roj û ezmên, Hurr. *hawureni* ‘ezman’, Av. *hvar* ‘roj’, Kurdî *hor/xor* ‘roj’.

Gelek caran sembola mirovên Serdema Seretayî heywan in. Di bingehê vê hizrê de sedemên olî û civakî hene. Ji nav wana de yên herî zêde bikar anîne teyr, şêr û boxe ne. Horiyan ev hersê simbol jî bikaranîne. Horiyan berê teyr bi tenê paşê bi rojê ve û dawiyê de bi *Dara Herhereyê* ve tevlihev kirine.

Ji nav cîsmên ezmên yê herî balkêş roj e. Ji nav balindeyan de jî teyre. Bi pêhevghana teyr û rojê ve horiyan semboleke berkeftî afirandine. Ev simbol, paşê bi encama hinek



Mohra şahê Mitanian Šauštatar. B.Z. 1500

guhorandinan bune durfên alên hîtît, asûr û kenaniyan.

Teyr, “*sembola bilindahiyê, giyanê rojê û weke prensîp sembola giyanê her tişyi ye. Teyr, weke çivîka ku jiyanêke bi tîrêjên rojê dagirtî dijî hatiye naskiri nê. Ew balindeyeke cewherê wî ji elemendên ronahiyê, ango ji agir û hewayê serûber buye. Tersê wîna jî kund e û ew jî sembola tariyê û mirinê ye. Teyr, bi rojê re hatiye naskirinê. Ew bereketê dide erdê û rola bav dilîze. Herwusa nimana cinsê mêra ye. Ew bi leza bagerê difire weke sembola esalet û lehengiyê hatiye pênasînê.*” “.... *teyr di kevne şopiyên Vedîk’ê de qasidê*

Îndra'yê û hilgirtê somayê ye. Teyrê bi mil yê ku li Suriya antîk hatiye dîtinê, ew perestina rojê eşkere dike. Ango bi ve sembolê ve hizra giyanê bêmiriniyê destnîşan kirin e.”³

Sembola horiyan ya herî pir nav û deng, kompozisyona teyr, roj û dara jînê (Dara Herherê) bi hevra ye.



2. Dara Herherê û roj li ser baskê teyran⁴.

Mircea Eliade dibêje: “*Dar, sembola jiyana bêmiriniyê ye.*⁵“ *Eger bi şeweyekî ontolojîk (zanyariya hebûnê) bête nîrxandin bêmiriniya darê ‘rastiyêke mîsoger e.’ Lewra ji bona ku dar tîk û dirêje weke sembola germiçankê dinyayê hatiye destnîşan kirinê. Ji bilê vê, bi rihên xwe ve dinya libinerdê; bi şaxên xwe yê daketî û hilketî mîna pêlikan ve çiyar, anga bi dunya navîn, bi bilindiya xwe ve jî ezmên derbîran dike.*⁶

³³ J. E. Cirlot, A Dictionary of Symbols, second edition, Routledge, London, 1971.

⁴ H. J. Kantor - Plant Ornament in the Ancient Near East, Chapter XIV: Mitanni, s. 557

⁵ Mircea Eliade, Istoria Credintelor și Ideilor Religioase, 2007, Polirom, București.

⁶ . Black & A. Green, Mezopotamya Mitolojisi Sözlüğü-Tanrılar, İfritler, Semboller, Aram yayınları, İstanbul, 2003; Mircea Eliade, Dinsel İnançlar ve Düşünceler Tarihi, Kabalıcı yay. 2007-İstanbul; Sigmund Freud, Dinin

Anegoreyî baweriya wîkîngan yan jî bakuriyên antîk, dara kozmîk *Yggdrasilj*, rihên xwe dirêjî heya “*dojeha derewîn*“ ya libinerdê dike.⁷ Di Xiristiyanî yê de dar sembola mirin û jiyânê ye. Di Îslamiyetê de, dar berhemekî buhuştê ye û sembola jiyana serfiraziyê ye. Di Êzdayetiyê de baweriya *Dara Herherê* heye. Kozmogoniya Mîtolojia Kurdan dor û berê vê darê hatiye şîrovekirinê.


Herwusa nav û pêyvên mîna Sum: (*h*)*u-ri-in* ‘teyr’; PHA **her-*, *hor-*, Hurr. *eribuski*, *herari*, Hitt. *haran*, Gr. *orneon*, ON *ari* û Mısıri *horus/haru/hor*, Ugarit *hry* ‘hur’, Hurr. *hawurni* ‘ezman’, Av. *hvar* ‘roj’, Av. *Huraodha* ‘dadwer, çak’ û Kurdî *x(h)or* ‘roj’, *hor* ‘mihrihan, dilovan’, *hur* ‘azad’ bi navê horiyan re têkiliya xwe hene.

Di Avestayê de çiyayê *Harî* heye. Dibe ku ew der devera destpêkê ya ku horî lê niştê bibûn. Lewma ji wana re gotine horî, ango xelkê çiyayê *Harî’yê*. Bi guman, dibe ku dema berbanga dîrokê bi çiyayê Agirî re digotin çiyayê *Harî*. Agirî him ji bo horiyan, him jî ji bo hevniyadên wana orartiyan çiyayekî pîroz e. Dema ku ji navê *Hagirî* dengê *g* derxin *Hairî* dimîne û bi gengazî navê horî ji hingê derketibe holê. Herwaha bingehê çanda Kûra-Aras jî wan dor û beran e. Afînêrê vê çandê jî horî ne.

Şêweyê baweriya horiyan di mîtolojî, efsane û çîrokên wana de hatiye destnîşan kirinê. Angoreyî baweriya wana mirov çawa hewceyî xwedayan e, xweda jî wusa hewceyî mirovan e. Ango weke mîtolojiya Mezopotamya jêrîn wusa tund û req nîne. Dema ku mirov van berhemên çand û edebiyata horiyan bixwîne, ji xweberê serwextî vê rastiye dibe.

Kökenleri, Payel yayinlari, 2002-İstanbul; Ebru Uncu, The Cult of the Sun in Mesopotamia, Anatolia and the Egypt Civilizatons, Volume 5, s. 349-366, 2013

⁷ Völuspâ, 19; Grimnismâl, 31.



3. Di dawiya III. Hezar salan û destpêka salên II. B.Z. de deverên Horî lê dijiyan (A. Mancini)

کتابخانه و نامهی کتیب

هه و النامهه كئيب

DESTHILATDARIYA LI EZMÊN

“Efsaneyaya Hukumdariya li Ezmên”⁸, mitolojiyeke bi şêwedestanbêjî ya Hurriyan e. Mirov dikare bêje ku, ev mitolojî ne bi tenê hizir û ramana bingehîn a ol û ayindariya horiane, di domana dîrokê de buye kaniya Kozmogoniya Ene-dolî û Yûnanê jî.

Babeta “Efsaneyaya Hukumdariya li Ezmên” ji bo dest-xistina hukumdariya ezmên şere di navbera sê nifşên xwadayan de rû dide ye.

1. Xwedayên li ezmên û yên erdê reş û tarî guhdarbikin!⁹
 2. Bila [.....] baş... bibîzin, Na[na],
 3. bila [Napšara, Mînk] û Amûnk bila Ammezzaddû¹⁰ bibîzin
 4. [.....] bav û dayîk bibîzin!
-
5. [Anu, Ant]u, Îşhara, dê û bav bibîzin. Enlîl,
 6. [Nînlîl,] ewêndinê yên ku demek dirêj bi behre û bi tirûşdar xwedati kirine
 7. [.....] û [.....] bila Ulkulimma¹¹ bibîzin.
 8. Demek ji deman Alalû Li Ezmên Hukumdar bû. Alalû
 9. li text rûniştîbû, yekemînê xwadayan Anû'yê biqudret, li pêş wî
 10. disekinî. Xwe ber piyên wî diçemand û ji bo vexwarinê tasik

⁸ E. O. Forrer, “Eine Geschichte des Götterkönigtums aus dem Hatti-Reich”, Annuaire de l'Institut de Philologie et d'Historie Orientales, 4, 1936; H.G. Güterbock, Kumarbi Efsanesi, Çev. Sedat Alp, Türk Tarih Kurumu Yayını, Ankara 1945.; Richard Caldwell, The Origin Of the Gods, A Psychoanalytic Study of Greek Theogonic Myth, Oxford University Press, New York, 1993.; Steve Kershaw & Steve Kershaw, A Brief Guide to the Greek Myths, London.

⁹ Albrecht Goetze, ANET (Ancient Near Eastern texts), 1950

¹⁰ Navên xwedayên herî kevn yê horiyan e.

¹¹ Ji navê Ulkullima jî diyare ku ew jî navê xwedayekî kevn yê horiyan e.

11. dida destê wî.

12. Anû li serhev neh salan li ezman paşatî kir. Di sala nehan de

13. Anû, dijî Alalû dest bi şer kir; wî, ango Alalû têkber,

14. û ew (Alalû), ji ber wî banzda. Û wî, ew ajote jêrê li bin xaka reş û tarî.

15. (Alalû) (reviya) çû nav xaka (sar û) tarî, lê Anû jî ser textê (wî) rûnişt.

16. Wexta ku Anû li ser text rûdinişt Kumarbiyê xurt xwarin (yan jî vexwarin) pêşkêşî wî dikir.

17. Xwe davête ber piyên wî, çok vedida û ji bo vexwe tasa mêtê dida destê wî.

18. Anû li serhev neh salan li ezmên hukumdar bu. Di sala nehan de Anû

19. dijî Kûmarbî dest bi şer kir; Kûmarbî jî mîna Alalû,

20. dijî Anû berxwe da. (Anû) Pêşberî Kûmarbî

21. êdî nikaribû raweste, Xwe zorê ji destên

22. Kûmarbî xelaskir û banzda, Anû mîna balindeyekî firya û çû ezmên.

23. Kûmarbî da pey wî û lingên Anû qefand

24. û ew ji ezmên kişande jêrê.

25. Wi (Kûmarbî), kaboka¹² wîna (Anû) gezkir; û ava mêtaniya Anû kete hinavên wî.

26. Dema ku giyane hev, gava ku Kûmarbî ava mêtaniya wî daqurtand,

27. (Anû) kefxwaş bû û keniya. Berê xwe zivirandê û

28. gote Kûmarbî: “Ez bala xwe didimê

29. kêfa te bi cihda ye, ji ber ku te avika mêtaniya min daqurtand.

¹² Ya rastî “organê mêtaniyê” ye. Ji ber gotina nazik dibêjin “kabok, yan jî çok”.

30. Di hişê xwe de xwaşhal nebe ! Min barekî giran
 31. kire li wêderê: Li destpêkê min tu bi xwadayê bagerê yê zadegan du canî hîşt.
 32. Peyra jî, min tu bi Çemê Aranzaḥ¹³ aviskir, herwaha, tu, li ber êş û jana wî nukarî xwe ragirî,
 33. û sisemîn jî min tu bi Tašmišuyê¹⁴ giran du canî hîşt. Bi tovê van her sê
 34. xwedayên bi dehşet erjenger min çande hundirê te. Îjar tuyê herî û
 35. serê xwe teht û zinarên çiyay bixî
 36. û biqedî!”

37. Piştî ku Anû axaftina xwe qedan, bilindî ezman bû
 38. û xwe veşart. Kumarbî tû kir,
 39. şahê bihiş. Ji devê xwe tif kir [.....]
 40. tevlihev. Ti[fa....] Kûmarbî
 41. [ket li] çiyayê Kanzûra



3. Li Yazılıkaya tabloya malbata xwedayê bagerê Teššub. 41 Kumarbî, 42 Teššub, 43 Jina wîna Hebat, 44 kurê wana Šarumma, 45, 46 boxeyên (alîkarên) wîna Šerrî û Hûrî

¹³ Aranzah, di Zimanê Horiyan de navê çemê Dicle'ye.

¹⁴ Navê Xwedayekî Hurrian e û ew Kurrê Kumarbî û birayê Teššub e.

42. û [Kûma]rbî bi gir û hers [li Nipp]ur'ê¹⁵
 43. [.....] çû. Li cihekî herî baş [.....]
 44. [.....] li jêrê binecih bû. Kûmarbî [.....]
 45. [meh] jimart. Meha heftan (yanjî nehan) h[at]

(Ji vir û pêde stûnên şikestî hene. Herwusa ustûnên II., III. û IV. hindî şikestine ku mirov bi zehmetî kêşeka buyeran serwext dibe. Ji vir û pêde çi buyer pêk hatine divê bi pûxteyî şîrovebikin.)

Stûna II.

1-3: (Anû, berya kû bizê di zikê Kûmarbî de bang li xwedayê bagerê dike, peşniyara çend deverên laşê Kûmarbî dike, da ku ew ji wan deran re ware dunê.)

Stûn II.

4-22: Xwedayê bagerê bersiva banga wî didê û dibêje: “*Tu her bijî ! Tu kaniya hiş û aqilanî şaho! ... Wê Erdê qudreta xwe, ezman wêrebîna xwe, Anû mêraniya xwe, Kûmar hiş û zanyariya xwe, Nara hêza xwe [] zadeganî û hişê xwe bide min.*”

(Di berdewamiya wê de, behsa dayîna boxeyê Šerišu¹⁶, ereba peşbaziye, ereba cengê ya çar teger û hin tiştên di tê kirinê. Paşê, xwedayê bagerê behsa qudret û hêza xwe dike û ji bo tola Anû hilde sond dixwe.)

¹⁵ Bajarê Sumeran ji bo xwedayê zanyariyê Enlîl hatiye avakirinê. Bi navê Enlîl parezgeheke mezin li wê derê hatibû avakirinê.

¹⁶ Šerišu û Tilla navê du boxeyên xwedayê bagerê yê Teššûb'in. Teššûb li ser boxe hatiye neqîşandinê. Šerišu, wek qasidê xwedayê bagerêye û di navbera wî û mirovan de qasid e. Erkên Tilla ne diyarin. Di Zimanê Kurdî de Šerî wek bi navê şer mîrat ma ye. Tilla jî di nav sondan de her tim tê bi kar anînê. Mînak: *walle, bille, tille*. *Walle*, navê xwedayên kevnare Alalû, El, Îl'e; *Bille*, navê xwedayê bagerê Bel yê Kenaniya ye. Hetta, tê gotinê ku wergera navê Teššûb'e horiyana e; *Tille* jî navê boxeyê xwedayê bagerê ye.

Stûna II.

23-28: (Anû, dîsa behsa deverên ku xwedayê bagarê jê derkeve dike. Di encamê de ji nav van ciyan de li ser dev û “*ciyê baş*” jî heye¹⁷.)

Stûna II.

29-38: Xwedayê bagerê bersivê dide û dibêje: “ *Eger ji vê derê re derkevim ..., dibe ku dê zîyanê bide hişê min, eger ji wê dera hanê re derkevim dê guhê min bilewitîne ... Eger ez ji “*cihê baş*” re biçim jinek dê mim pêşwaziya min bike...*”

Stûna II.

39-54: Kumarbî meşya û derkete li pêş Ayaş¹⁸ gêj bû û kete erdê... Kumarbî gote Ayaş: “*Ka hûn kurê min bidine min, ezê wî daqurtînim û buxwim....*”¹⁹ Qaşo Kûmarbî tiştêkî bixwe dîtibû. Lê belê devê wî birîndar bû û li ber êşa dev naliya.

Stûna II.

55-70: Li ber gilî û gazine Kûmarbî, Ayaş peşniyara civata pispor û jêhatiyan kir û got: “*Bihêle bila ew biçin û gazi ‘hejaran’ bikin.! Destûrê bidin bila hêjar boraqên xwe bidin we! Bihêle bila ‘hejar’, merxwas, beg û dewar efsûnan çêbikin*”.

Stûna II.

71-75: [ew] efsûne kirin [], xurekên ayînî her kişandin []. Herwaha, xwedayê bagarê yê dîlawer ji “*devera baş*” re hate dunê.

Stûna II

76-87: Piştî ku xwedayê bagarê hate dunê, Anû agahdar kirin.

(*Ji vir û pêde ustûn şikestî ye. Di ustûna sisemîn de bi tenê dawiya rêzikan maye.*)

¹⁷ Ciyê baş, jib o organên zayinê tê gotinê.

¹⁸ Ayaş, di Zimanê Horiyan de navê xwedayê avê Ea'yê someriyana e.

¹⁹ Buyereke wusa di Destana Hesîdos a yûnanî de jî heye.

Stûna III.

2-18: Anû ji bo Kumarbû bi alikariya xwedayê bagarê tunebike planan çê dike.

Stûna III.

19-25: (*Xwedayê bagerê xwe ji bo têkoşînê amade dike.*)

26. xwedê re ez neletê [dikim]. (?)
27. û ez xweda ZA.BA.BA ne[let]ê dixwazim. (?)
28. Ê ew hanîn bajarê
29. naha ji gelek caran li dijî min şerdikin.

30. Boxe Şeri bersiva xwedayê bagerê da û gotê:

31. Xwedayê min, tu ji bo çi wî nelet dikî. [].
32. ma xwadêyan re? Xwedayê min ji ber çi wî [xwadyî...].
- 33 û xwda Enki (Ea) re nifiran dikî...?

(Ji vir û pêde nivisên li ser ustûn nayê xwandinê. Lê belê di parçeyên heyî de, behsa şerekî dinê tê kirinê. Lê belê vê carê hempayên Kûmarbû kîne ne diyare. Di nivisarê de navên xwedayên Anû, NAM.ĤE²⁰ û Ea derbasdibe, lê belê rolên wana ne eşkere nîne.)

(Dor û berê 50 rêzikên ustûnê çaremîn nayêne xwandinê. Lê belê bi alîkariya motîfên têkiliyên navber buyeran va nivisar hatiye wergerandinê.)

3. [] û erebe çû []
4. [...] erebe çû ha çû [.....
5. [.....] naha [.....]
6. [] erebe şeş [.....] derbasbû
7. û erebê mêraniya wî hilda.
8. Erebe vegeriya bajarê Apzûva'yê.
9. [] û çareseriyek hate bîra wî.
10. [] dewisand ? Ea spîbûna [.....]
11. [] cihan ji pey bajarê Apûva'yê re dihat.
12. [.....] û şahê çîlspîbûn û eşkeretiyê dijmire, [.....]

²⁰ Xwedayekî nenas e. Bi navê wî parastgeha ^ENAM.ĤE jî he ye.

13. mehek, [du] m[eh, sê meh derbasbû;]
14. çar meh, pênc meh, şeş meh derbas bû; [heft meh;]
15. heyşt meh, neh meh derbas bû. Aha! Meha dehan.
16. Di meha dehan de dunya dest bi qêrînê dike [.....]
17. lê dema ku dunya diqîre, [.....]
18. û [du] zarokan diwelidîne, pêyamnêrek diçe û
[.....]
19. Ea yek carî wusa lê dinyêre [.....]
20. agahiyek baş [.....]
21. dunyayê du zarok welidand. [.....]
22. gotinên Ea [.....]
23. ... hate jêrê berpir[siyarek]
24. ji bo şah dest bi dayîna diyariyan kir
25. mantoyek û ew [.....]
26. li seryek zîvî [.....]
27. teşiyek [.....]

(*Stûnên ve tablêtê bi jêrnivisekî ve diqede:*)

28-35. tablêta helbesta yekemîn ji hêla [.....]. [kurêî], neviyê [.....]î û neviyê [.....]ê, şagirtê [.....] Aşa [.....] hatiye nivisandinê. Ev tablet xesirî bû. [.....] min, A[şa-.....] ew di bin çavdêriya LU ev nivisandiye (?)

Bi heyf û mixabin nave vê helbestê nehatiye parastinê. Herwaha ji ber sedema şikestin û ziyanên heyî nivisara ser tablêtê hemû nayê xwandinê. Ji ber vê sedemê têkoşîna ji bo *Hukumdariya li Ezmên* mirov nikare bighêje encameke vebirî. Lê, bigumanî di encamê de Kumarbî cihê xwe yê li ezmên dest xistiye û helbest wusa qediya ye.

Dema ku mirov bala xwe dide “*Helbesta Ullikummi*”, diyare li ser textê ezmên Xwedayê Bagerê rûdinê. Di vê efsanê de buyerên gelek zayînan hene. Di ustûna çaremîn de erd ango dunya dizê û piştî neh mehan du zarokan tine dunyayê. Di vê buyerê de erd mina heybereke mê hatiye hizirandinê. Angoreyî

çend kesên Lêkolîner, di encama zayîna erdê/dunyayê Çemê Aranzah û Taşmişu ji dayika xwe dibin. Ew teşîya ku li dawîya ustûna çaremîn hatiye nivisandin jî semboleke xweser e. Diyarê Çemê Aranzah wek keçekî hatiye hizirandinê. Ji ber ku teşî alavê honandina hiriyê ye û jin bi kar tînin.

Lê belê dive mirov di dawîya vê senaryoyê de afirandin, yan jî zayîneke cûda bihizire. Di despêkê de behsa ji dayîkbûna xwedayê bagerê *Teşşub*, *Teşmişu* û *Aranzah* tê kirinê. Di zayîna yekemîn de hatina li dunyayê ya xwedayê bagerê girînge. Ji ber ku divê xircira/kaos'a ji bo desthilatdariya ezmên biqede û qehremanê wê serkeve û bibe hukumdar. Ev qehreman xwedayê bagerê *Teşşup*' e.

Di vê nivisarê de zayîna dunyayê ango ya erdê tişteki xwesere. Naveroka wê di çêbûna mirovan eşkere dike. Ji wan yek dê bibe teşîrês ku ew jine, yê dine jî ajovanê erebê ye û ew jî mêre. Heya naha derbarê afirandina erdê û ezmên, ya jîndar û heyberan ti destanên horrian peyda nebûne. Diyarê di dawîya nivisara "*Efsaneya Hukumdariya li Ezmên*" de qala afirandina mirovan ji hatiye kirinê.

Angoreyî mitolojiya Hurrian dibe ku nave mêrê destpêkê *Teşmişu*, nave jinê despêkê jî *Aranzah* e. Her çiqasî ev her du nav mina navê xweda û xwedawenda hatibin destnîşan kirinê jî, biguman ew mirovên despêkêne û bi hevşabûna xwedayan û erdê ve hatine afirandinê.

Digel mînaheviya mitolojiyên afirandinê mirovan a hori û sumeriyana cûdabûnê bingehîn jî hene. Di mitolojiya sumeriyana de xwedayan mirov bi heriyê çêkirine. Di kozmogoniya babîlê de jî, ji bo xizmeta xwedayan bikin, anegoreyî fermana Marduk bi xwîna xwadayekî mirovê destpêkê afirandine. Lê belê di ya horiyana de ne wusa ye. Mirov, di serdema "*Şere Dudemîn ê Kainatê*"²¹ yê navbera xwedayan de bi şeweyekî pîşadî û rasthatî peyda bûne.

²¹ Bivêja "*Şerê Kainatê yê Dudemîn ê Xwedayan*", anegoreyî mitolojiya Hurrian ji hêla niviskarê vê pirtûkê Ali Husein Kerim hate destnîşan kirin.

HELBESTA ULLÎKUMMÎ²²

Tablêt 1.²³

Stûna I:

1. [.....] xx [.....]
2. Giyanê bi hewnê dagirtî [.]
3. [. . . .] hildide. Helbesta Kumarbî ya
4. bavê hemû xwedayan bibêjim.
-
5. Kûmarbî ruhê xwe bi hiş û hewnê dadigre
6. û “rojeke xirab” weke “mirovêkî xirabkar” mezin dike.
7. Dijberî xwedayê bagerê planên fênekî çêdike
8. û jib o dijî xwedayê bagerê raweste serhildêrekî mezin dike.
-
9. Kûmarbî ruhê xwe bi hiş û hewnê [dadigre]
10. û vê mîna cevherekî giranbuha bi xwe ve dike.
-
11. Dema ku Kûmarbî giyanê xwe bi hiş û hewnê dagirt,
12. Di cî de ji ser textê xwe daket,
13. gopal hilda destê xwe, solên
14. surelê [pê]kir.
15. Ji bajarê Urkeš'ê²⁴ rêket

Şerê Yekemîn di navbera Alû û Alalû de ye; “Şerê Kainatê yê Sisemîn” jî di navbera pevgihaniya ku serkeşê wê xwedayê bagerê Teşşub'e û kurê Kumarbi, Ullîkummî yê ku laşê wî ji kevirê diyorît dirist buye pêk hati ye.

²² Ji guhastina nivisên mixî bi latînî û werger ji hêla H. G. Güteberg ve hatiye çêkirin. H. G. Güteberg, Kumarbi 1946.

²³ A. XVII 7 + XXXIII 93 + 95+ 96 + MGK 7a + 7B; b: XXXIII 98 + MGK 8; C: XXXIII 102 + 104 + MGK 9; D: XXXIII 92 + MGK 9; D₂: MGK 11; KUB XXXIII 95; Hans Gustav Guterbock, The Song of Ullikummi: Revised text of the Hittite version of a Hurrian Myth, Oriental Institute, University of Chicago, publisher The American Schools of Oriental Research, New Haven, 1952

16. û gihişte Îkûnta²⁵, yê.

17. Û [.....] Îkûnta [.....]

18. Li ser lotkeyê girekî ye

19. Girekî wusaye ku direjîya wê hewqasî 3 mîlan û firehiya wê jî

20. dighêje nîv mîlî. Lê belê serejêriya wê nenas e.

21. Piştî demekî kete di bin barê nefsa xwe de kete xweyeke giran.

22. Çû li ba tehtî. Mêraniya wî derbasî wê bû. [...

23. [.....] pênc caran bi wî şabû,

24. [.....] deh caran bi wî şabû,

(ji vir û pêde du rêzik şikestine û dor û berên 30-32 rêzikan jî webda ye.)

Stûna II:

1. wenda

2. wenda

3. wenda

4. wenda

5. wenda

6. [“..... Kûmarbî bavê xwedana ye.”

7. [..... Kumarbî dît,

8. [..... Çû ber deryayê

9. [Împalûrî’yê]²⁶ careke dine bi deryayê re

10. dest bi axaftian kir û got: “ji efendimê xwe re bêjim

11. [.....-] kirî [....] û derya

12. [.....] dît (?) dît.

²⁴ Urkeş, bajarê Kumarbî ye û navê naha Tell Mozan’e û li ser parezgeha Emûdê ye. Ev der, B.Z. hezara III. payîtextê horiyan e. Li vê derê yekemîn car bi Zimanê Horiyan bi xwe nivisar amade bûne.

²⁵ Bajarekî dinê yê horiya’ne.

²⁶ Xwedayekî horiya’ye alîkar û qasidê Kumarbî’ye.

13. [.....] Kumarbî bav û bapîrê xwedaya ye.”

14. [Dema ku deryayê] gotinên wî bihîs[tin],

15. deryayê Bersiv da Împalûrî:

16. “împalûrî [wezîrê min]!

17. van tiştên li te ra dibêjim,

18. van gotinên min [guhdar bike]!

19. gotinên ez dibêjim guhdar bike!

20. naha here û Kûmarbî re bêje: “Jib o çi

21. Wusa bi gîr û hêrs hatî malê (mala xwe?)

22. Herwaha mal lerizî û tirs

23. kete dilên xulaman. Li pêş te

24. dara wurzê ji mêj ve şikesti ye,

25. xwarin ji mej ve li pêş te amade ne,

26. li pêş te şev û roj

27. sazband alavên xwe

28. amade digrin. Rabe

29. û ware mala min !”

30. li ber van gotinan Kûmarbî rabû,

31. û Împalûrî, ji pêş wî de çû;

32. Kûmarbî ji mala xwe [rêket]

33. Ew, çû ha çû [....], Kûmarbî,

34. Xwe gihande mala Deryayê.

35. Derya'yê got: “Kûmarbî re

36. bila ji bo rune kursiyekî daynin,

37. bila sifreyekî daynin pêş wî

38. bila xwarinê jêre bînin,

39. bila ji bo vexwe bîrayê jêre bînin!”

40. Xarinpêjan, xwrek anîn, sakiyan jib o ew vexwe jêre
mey anîn.

41. carekî vexwarin, du caran vexwarin,

42. sê caran vexwarin, çar caran vexwarin, pênc caran
vexwarin

43. şeş caran vexwarin, heft caran vexwarin. Kûmarbî,
44. bi wezîrê xwe Makîšanû re got:
45. “M[akišanû wezî]rê min! ji bo vê gotina min
46. baş [guhdar] bike! rajê gopalê xwe,
47. pêlavên [surellayê] pêke û [....-]yê
48. [... here û avan [....]
49. û bi avan re [bêje]ku:
50. [....] Kûmarbî [..... “]
(ji vir û pêde şikestiye)

Stûna III-IV.

(Rêzikên despêkê yên van ustûnan baş nehatiye parastinê)

1. (nine)
 2. (nine)
 3. (nine)
 4. (nine)
 5. (nine)
 6. kevir (?), kevirî [.....]
 7. û alikariya zayîna wî ki[rin]
 8. niçikê zinêr çû [.....]
 9. kurê Kûmarbî [.....]
 10. jinên [(xwedawend)], alikariya zayîna wî kirin [....]
 11. û xwadwenda GULŞ û M [AH] ew bi Kûmarbî re [.....]
 12. ew li ser çoka Kûmarbî dan rûnişkandin.
 13. Kûmarbî ji bo kurê xwe ji dil û can şabû.
 14. Ê ji bo wî navekî baş hizirî
-
15. Kûmarbî ji [ber] xwe de got:
 16. “Gelo ez çi navî bidim vî zarokê ku xwedawenda ew anîne ?
 17. Dive navekî wusa be, ku wek tîrekî çawa ji bedenê derkeve be.
 18. Belê bila nave wî Ullikummî be!

19. Û bila [notila xwedayan] hilkişe ezmên.
20. Bila bajarê xwaşik Kummiya'yê birûxîne.
21. Lê belê, dive xwedayê bagerê bixe! Wîna wek termekî parçe parçe bike!
22. bihêle bila mina miroyekî di bin lingên xwe de bipelixîne,
23. lê, bila xweda Taşmîşu jî nola gihayê tilîperê hûr hûrî bike.
24. Bihêle, bila li ezmên bibe nêçîrvanê hemû xwedayan
25. mina şikandina pincên vala, bila hemuyan parçe parçe bike.”

-
26. Kumarbû piştî van gotinan,
 27. dîsa ji ber xwe de axaftî û got: Gelo vî zaroyê bidim li ba kê?
 28. Kiyê lê miqat be, kiyê wî baldarî mezinke?
 29. Kiyê wî veşêre û
 30. û kiyê wî bibe dinyaya tarî ?
 31. Dive xwedayê rojê [û xwedayê hîvê] wî nebînin!
 32. Gereg xurte şah, xwedayê bagerê yê li Kûmmiyayê jî wî nebîne
 33. û dive wî nekuje ! dive kesek jî nebîne
 34. Şahbanuya Nînovayê Îştar jî dive wî nebîne,
 35. Dive wîna weke çîtikên tilîperê
 36. Hûr hûrî nekin.

-
37. Kûmarbî bi Împalûrî re dest pê kir û got:
 38. “Guhê xwe baş bide gotinên min Împalûrî!
 39. Rajê gopalê xwe û hilde,
 40. pêlavên surellayê pêke û bikeve rê!
 41. here li ba xwedayên Îrşirra'yê
 42. û van gotinên min ên pir girîng li wana ra bêje:
 43. ‘Werin li vê derê! Kumarbî, bavê xwedayan
 44. gazî we dike!

45. Tawilê werin û [armanca gazikirina xwe hînbin!]

46. Xweda[yên Îrşirrayê] dê kurê min hildin

47. û [bibine] li dinyaya binerdê. Lê Îrşirrarî

48. dê [wî veşêr]in, lê dive ew têkoşîna xwedayên mezin
[nebîne.]”

4. [.....] împalûrî

5. [dema] ku ev gotin bihîst rayîşte gopalê xwe,

6. pêlavên lezê pêkirin

7. [....] Împalûrî [çû],

8. [û] xwe gihande Îrşirriyan.

9. Împalûrî bi Îrşirriyan re

10. waha got: “werin !

11. Kûmarbî, bavê xwedayan [gazî w]e dike!

12. ji bo çî karî [gazîdke]

13. hûn niz[an]in! zû werin!

14. gava ku [Îrş]irriyan ev gotin bihîstin

15. [...] lezandin

16. [û ...] bezandin (?) û rê di yek carî de

17. qedandin (?) [û] xwe gihandine [li] ba Kûmarbî.

18. û Kûmarbî bi Îrşirriyan re,

19. dest pê kir û got:

20. [“vî zarokî hil]din û ‘diyarî’(?)

21. [bikin(?)] û wî bibin li xwaliya reş!

22. [zû] bikin, bilezînin!

23. û wî (bidin) Ûpellûrî²⁷

24. ser milê wî rastê cih bikin!

25. bila bejna wî rojê gazekî dirêj be.

26. Lê bila rojê (200 mêtroyî) bejnê bide!

27-28. dema ku berekî mezin bi bejna wî ve bikin, û ewê
dehşet-erjeng

²⁷ Dêwekî mîtolojîk e. Erdê û Ezman li ser wîne.

29. xûya bike.

-
6. Piştî ku Îrşirr[ariyan] ev gotin bîhîstin,
 7. rahîştine [zarokê] li ser çokên Kûmarbî. Îrşir[rariyan]
 8. zarok rakirin û [ew] mina cilekî li ser sîngên xwe ve
 9. çespandin û [zarok jorêva] bilind kirin û birin li ba Enlîl²⁸
 10. danîn ber çokên wî. Enlîl nişkava (çavên xwe) vekir,
 11. zarok dît. Li pêş wî xwedayek disekinî (?),
 12. lê laşê wî ji kevirê diyorîtê çêbibû.

-
13. Enl[il ji Îrşirrariyan] pirs kir got:
 14. “Ev [zarokê] kê ye? Ma gelo xwedawendên çarenivîsê û
 15. make-xwedawendên ew mezin kirine? Kîjan xwedayên gewre wî dibîne?
 16. Cengên mezin [.....] [.....]
 17. [.....] [.....] Kûmarbî, xwedayê bagerê
 18. çawa mezinkir [eynî naha jî] vî kevrê diyorît jî
 19. [nola ser]hildêrekî mezin dike.”

-
20. dema ku Enlîl axaftina xwe [qedand],
 21. zarok danîne li ser mile rastê yê Ûpellûrî

-
22. Kevrê diyorît mezin dibe û Wîna bilind dikin.
 23. Di nava rojekî de gazekî bejnê davêje,
 24. lê mehekî de 200 mêtroyî mezin bû.
 25.
 26.
 27. 15 roj derbasbûn û bejna kêvir dirêj bû. Û ew, di deryayê de li ser çokan
 28. weke ustûnekî disekinî. Kevir ji nav avê derket.
 29. Û bejna wî [.....]bû. Û derya
 30. [...?] notila kincekî dighîşte heta cihê şûtika wî.
 31. Kevirekî radibe li ezmên de

²⁸ Xwedayê Sumeriyan yê zanyariyê ye.

32. dighêje parezgehan û mala kuntarra.

33. Ji vê egerê xwedayê rojê bala xwe da jêrê û Ûllik[ummi] dît.

34. Gava ku Ûllik[ummi] jî xwedayê rojê d[ît], Xwedayê rojê

35. [pirskir:] “Ew xwedayê bi lez û bez yê di nav deryayê de ki[ye]?”

36. û laşê wî [...] ji xwedayan qet yek jî nizane”

37. Xwedayê rojê yê li ezmên berê xwe zivirand û çû li deryayê.

38. û dema ku xwedayê rojê ji deryayê derket destê xwe bir li ser eniya xwe

39. [.....] û bi hêrsan

40. [.....]wî hat guhortin.

41. Xwedayê rojê dema ku [kevir] dît, xwedayê rojê

42. cara dudemîn ji çiyar re [derbas bû] [çû bervî jo]r û kete ser rêka xwe

43. û çû li ba xwedayê bagerê.

44. Û Teşmişû bi [xwedayê bagerê re dest pêkir û waha got:]

45. “Xwedayê rojê yê li ezmên [ji bo çi tu hatî li vê derê]? Ji ber çi pirsgirêkê hatî li vê derê?

46. Yeqîn mijareke pir girîng e. binasiyeke [ne] vala ye.

47. dibe ku, sedema şer û pewçûnek bi zebr û tund e.”

49. Xwedayê bagerê bi Teşmişû re wusa got: “[ji bo wî kursiyekî]

50. daynin, ji bo xwarinê masê bixem[ilînin]!”

51 Dema ku ew diaxifîn, xwedayê rojê [hate] cem wana.

52 Ji bo rune kursiyek danîn, (lê) ew, [rû]nenişt;

53 mase xemilandin, wî, des[tê xwe dirêjnekir; vexwarin

54 danê, wî, piyale(?) negirt.

55. ji ber vê egerê xwedayê bagerê waha gote: “xwedayê rojê:
[kî]jan xulamî [kursiya] xirabe
56. danî û tu rûneniştî? [kîjan] xwarinpêjî xwarinên
bêçêj
57. [an]în û te nexwar?
58. Kîjan sakiyê [meya] temsarkî da û te venexwar?”

Tablêt II.

Stûna I:

1. Ev rêzik pir hinciriye.

2. Gava ku xwedayê bagerê ev gotin [bihis]tin bi hêrsan
[] guherî.
3. .]... û xwedayê bagerê
4. [bi xwedayê rojê yê ezmên re] axaft û got:
5. “[nanê li ser masê] pir xwaş e. Ji wêna buxwin!
6. Çêja [mêya di piyalê de] pesindar e! Ji wêna
[vexwin!]
7. Herwaha têhnîti û birçîbûna xwe bi wana ve ji
biewiqînin,
8. Paşê li erebeya çar têker siyarbin û bilindî ezmên bin.”
9. [Xwedayê rojê yê ezmên dema ku ev gotin] bihîst
10. ve[hişî] û dilşadbû.
11. [nanê li masê] xwaş bû [û] jê xwar.
12. [çêja mêya di piyalê de] xwaş bû ji wê vexwar.
13. [Û xwedayê rojê] li erebeya xwe ya çar têger siyar
bû û çû bilindiya ezmên.

14. Piştî çûna xu[dayê rojê] xwedayê bagerê
15. bi jîr û aramî hizirî. Xwedayê bagerê û Taşmişu
16. bi destê hev girtin û ji Kuntarra'yê, ji mala xwedayan
rêketin.
17. [Xwîşka wî] Îştar bi zîrekî ji ezman re hat.
18. Û Îştarê xwe bi xwe re got:
19. “Ew herdu bira kuda diçin?”

20. Û heman demê de Îştar bi herdu [birayan] re
21. eyan bû.
22. Destê hev girtin,
23. û (gihîştin) li ser çiyayê Hazzî.²⁹
24. Û şahê kummiya'yê rûberiyê wî bû,
25. Belê, rûberû man, ew (û) yê tirsehêz,
26. cinawirê ji kevir! Û wî ew cinawirê kevir ê hewelnak
27. û ji hêrsa xwe []
28. veguhêzî.

-
29. [Û] xwedayê bagerê runişt li erdê, hêsrên çavên wî wek çeman diherikî.
 30. Xwedayê bagerê, çavên wî tijî rondik got:
 31. “Kî dikare li pêş dîmeneke wusa hêrsebarî xwe ragire?”
 32. Kiyê biwere û here dijî wî cinawirî şer bike?
 33. Kî dikare temaşeyî bergeha wî ya tirsnak bike?”
 34. Îştarê li xwedayê bagerê re got:
 35. “Heylo birayo! Ew, ne kêr ne jî Dizane,
 36. lê belê, deh qat zêde hewer dane wîna!
 37. Û ferzendê ku []
 38. anî sere wan
 39. [.....] tu nizanî. [Eger] em li mala Ea'yêbûna,
 40. [.....] eger ez zilamek bûma,
 41. te [.....] çênedikir
 42. ezê herim [.....]”
- (du rêzik wenda ne.)

Stûna II:

(Ji despêka vê ustûnê 25 rêzik kêr in.)

1.

²⁹ Çiyayê Hazzî, Çiyayekî dor û berê Antakya hatiye destnîşan kirinê. Biguman çiyayê Keldağ'e.

2.
3.
4.
5. Îştar kilaman dibêje
6. û ji deryayê Kevrekî xîç hilda.
7. Û ji deryayê pêlekî mezin hat.
8. Pêlê mezin deng li Îştar'ê kir (û gotê):
9. “Tu ji bo kê distirêyî?
10. Ji bo kê devê xwe bi [..... ?] tije dikî?
11. Ew kesa ker e nabhîze,
12. ew kor e nukare bibîne.
13. Dilovaniya wî qet tune ye.
14. Here ji vê derê Îştar! Birayê te hîna newêre,
15. kelaxê wî hîna têra xwe tirsnak nîne,
16. bêje wî bila hinekî wêrek
17. û tirsnak be.

-
18. Îştarê³⁰ ev pêyv bihîstin, pêl vekîşiya.
 19. Wê çengan û galgatûrî³¹ ji destê xwe avête hêlekî.
 20. Lê [.....
 21. û bi dengî bilind .. [...
 22. çû û [.....

(Di dawîya vê ustûnê de sê rêzik kêmin)

Stûna III.:

(Ji despêka vê ustûnê de dor û berê 8 rêzikan kêmin in, rêziken yekemîn û duyemîn jî hincirîne.)

1.
2. [Xwedayê bagerê bi Teşmişu re wusa dibêje]:
3. “Bila alifê ajalan tevlihev be, bila rûne tenik bînin
4. û bi wî rûnî ve qoçên Boxe Şerîşû bête biriqandinê.

³⁰ Xwedavenda bereketê, evîn û şer ya Sumeriyan e. Horiyan jî ew perestine û navê wê bi Zimanê Horiyan Îşhara ye.

³¹ Amûrên mûzîkê ne.

5. Lê bila boça Boxe Tilla jî bi zêr rûkêşî bikin
6. û gerîde bê barkirin ên bihêz
7. bînin hundir, lê ji bo derva
8. kevirên mezin daynin, gazî gurîniya ezmên bikin,
9. ba û baran bila tehtên dirêjiya xwe 90 fersahan parçe parçeyî bikin,
10. lê bila hewqas 800 fersahî be.
11. Ba û barana ku (we) gazîkir, berqvedanên bihêz,
12. bila ji xewê hişyarbin.
13. Gerîdeyên bi çar teger amadebin.
14. Piştî duristkirina kar û baran min agadar bike!”
15. Teşmişu, dema ku guh li van gotinan bû
16. bi xiroşî karîger bû. Şerîşu ji çêregahê anî.
17. Boxe Tilla jî, ji (çiyayê) Îmgara'yê [anî,]
18. û ji derva ew kir.
19. Rûnê zirav anî û pê qoçên Şerîşu biriqand.
20. Lê boça boxe Tilla jî,
21. bi zêr rûkêşî kirin. Lê gerîdeyan
22. [.....] kirin.
23. Kevirên mezin danîne derve,
24. gazî gurra ezmanan kirin. Bi dirêjiya 90 fersahî
25. zinar parça parçayî kirin.

(19 rêzikên dawîya vê ustûnê wwendana ne.)

Stûna IV:

(Heft rêzikên vê ustûnê hatine hincirandinê)

8. [.....] [.....] ...
9. [.....] 1000 milî [.....] ji bo şer cihê xwe girt.
10. çek û rext hilda, erebeyên xwe hilda,
11. ji ezmên ewr anîn
12. xwadayê bagarê berê xwe da cinawirê kevir.
13. Ê ew dît. Berê bilindihiya wîna [.....] bû
14. vê bilinbûna wî veguhast sê caran [.....]
15. Xwedayê bagerê digel Taşmişû axaft:
16. “Erebe [.....]”

(Rêzikên 17-22'yan parçabûne, 20 rêzikên berdewamiya wana jî wendane.)

Tablêt III

Stûna I.

(Li despêka ustûnê de 30 rêzik kêmin.)

1. (ev rêzik hinciriye)
2. Û xwedayan, gava ev pêyv bih[istin,]
3. Erebe rêk[ûpêk kirin]
4. rêva birin. Xweda Aştabi³² [.....]
5. hilpekiya û wî, [....] ere[be]
6. erebe (?) ber[hevkirin (?). ...]
7. û wî kire gurre gurr, Aşt[abî]
8. û ji gurriniya ezmên [.....]
9. berda bin deryayê û [(alavek) ...]
10. (av) kişandin. Û Aştabî [...]
11. 70 xweda derdest kirin, lê car[ek dinê]
12. Pê nikaribû. Û [...]
13. û 70 xwadê d[i bin] deryayê de
14. kevirê diyorît, laşê [.....]
15. hej[and] –nd, [.....] ezman
16. w[ek] telîsekî va[la] û kevirê diyorît
17. [.....] tel av[êt] li pêşiyê de 1900 cot seat (navber)
18. [.....] li erdê tarî de, [.....]ek
19. Kevirê ristim hildigire û li mala Kuntarra re
20. Digihîne kevirê diyorît [.....] ya li 9000 cot seat dûrahiyê,
21. lê belê firebûna wî navbera 9000 cot seat in. Û ew, li Kummiya'yê de li derê bajêr [....]
22. gava ku hilperiya, kevirê ristim li ser Hebat'ê û mabedê re bilind bû.
23. Herwaha Hebat, aga li xwedayan nebû

³² Xwedayê şer yê Hurian e û di payebilindiya ZA.BA.BA'yê babîlê de ye.

24. û xwedayê bagerê û Şuw[aliyatta] bi çavên serê xwe nedit[ibû].

-
25. Hebatê ji Takîti re [ev pêyiv] gotin: “pêyvên girîng yên
26. [xwedayê bagerê nabizim],
27. agahiyan ji Şuw[aliyatta] û hemû xwedayan nabîzim.
Evê ku jêre dibejin U[lilikûmî]
28. dibeku wî kevirê diyorît
29. mêrê min [xwedayê bagerê] yê xoşewîst têkber!”

-
30. Hebat’ê carek dinê gote Takiti: “ Got[inên] min
31. guhdarke! Rahêje gopalekî, lê pêlavên surelê³³ [pêke!]
32. here x[udayên] [.....]! Dibe ku
33. kevirê [d]iyorît mêrê min[xwedayê bagerê şahê
xoşewîst kuşt]! Hilo! Here ji bo min [xeberê bîne!”

-
34. [Takîti, gote Hebat’ê]:
(*Berdewama wê şikestiye, diyare heya dawiyê navbera 15-20 rêzikan kêmîn.*)

Stûna II:

1. Gava ku Taşmişu gotinên xwedayê bagerê bi[hîst]
2. tawilê rabû, [rahişte] gopal,
3. pêlawên surelê pêkir.
4. Derkete li ser baruyeke bilind, [û]
5. li pêş Hebat’ê sekinî û gotê: “Heya
6. salên ji bo wî hatine diyarkirin tijebî divê [efendiyê mi]n di asteke jêrê de [bimîne (?)]”
7. Gava Hebatê, Teşmişu dît,
8. hinek mabû ji banî biketa xarê;

³³ Pêlavên Surelê di wateya pêlavên ba, yê lezê de ne. Di çîrokên Kurdî de hespê Surelayê hene û difirin. Herwaha, di destanê de pêlavên ku bi ba dimeşin, mirov dikare weke pêlavên surale bi nav bike.

9. eger gavek disa bavêta, dê ji banî biketa, lê belê jinên serayê
10. ew girtin û nehîştin (bikeve). Taşmişu piştî axaftin
11. qedand, ji baruyê hate xwarê,
12. û çû ba xwedayê bagerê. Taşmişu, careke dinê
gote xwedayê bagerê:
13. “Em li kîderê bi cih bin? Li çiyayê Kandûra’yê?”³⁴
14. [Eger (?)] em li çiyayê Kandûra’yê binecih bin,
15. [yekî di]nê jî dê li çiyayê Lalapaduwa’yê³⁵ bi rûne!
16. [.....] bibine kîderê? Hingê li ezmên şah ji namîne.

-
17. [Taşmiş]û carekî dîsa gote xwedayê bagerê: “Xwedayê bagerê, efendiyê min ! gotinên min
 18. [guhdarke!] Ji bo tiştên ezê bejim
 19. guhê xwe baş bidê min! Were, em herin bajarê Abzuwa’yê,³⁶ li pêş Ea.
 20. [Ê] careke dine pirsyariya gotinên li ser tableta kevn bikin!
 21. [Ê] [kêliya] ku em gihîştin li mala Ea, li pêş deriyê wî
 22. [.... caran û] li pêş’ya Ea, emê pênc caran veçemin.
 23. [Ê] [dema ku] em bighêjin li [ber] deriyê Ea,
emê li peş wî dê panzdeh caran xwe veçemîn.
 24. Dibe ku Ea [.....] û Ea, dibe ku
 25. [.....] gunehê wî me bê û
 26. [hukumdariya]meye berê dîsa ji me re bihêle.”
 27. Kêliya ku [xwedayê bagerê Taşmiş]u guhdarkir, kete li nav lez û bezê
 28. [û ew,] tawilê ji kursiya xwe rabû,
 29. [.....] ji destê hevdu girtin û yek derbî rêya xwe qedandin. Ê gihîştin

³⁴ Ciyê xwe ne diyare.

³⁵ Çiyayekî dinê yê li welatê horiyana e.

³⁶ Bajarê ku xweda Ea lê rûdinê ye.

30. bajarê Abzuwa Çûn mala Ea û ew, li tawil[ê derketin pêş Ea].
31. [.....] ... pênc caran xwe veçemandin [.....]
32. [.....] panzdeh caran xwe veçemandin.
33. [..... ra]bû [û ev pêyivan]
34. [jêre] gotin: [.....]
 (35-39 *pir kê m tişt jê mane, dumahika wê na jî şikesti ye; Ango 50 rêzik jê kêmin.*)
 (Parçeyê li pey vêna, di navbera ustûnên II. û III. de, dibe ku bibe jî û nebe jî.)

F = Stûna I. (?):

Despêka wê şikestiye.

1.
 2.
 3. Ea, [pir gotinên ku hişê wî zela kir] guhdar kir
 4. û derket çû nav baxçe.
 5. Hemû xweda [li pêş] rabûn li ser piyan
 6. lê ji bilî xwedayê bagerê [.....]
 7. ew, xwedayê mezin, şahê [Kummiya']yê
 8. [li pêş wî ra]nebû.
-
9. Ea, bala xwe da xwedayê bagerê
 10. [û] bi wî [enirî]

Stûna III.:

(Despêka wê şikestiye, ji rêzika yekemîn pêde 35 rêzik kêmin.)

1.
2.
3. Destê xwe (?) [.....]
4. li dema [.....]
5. ji civînê de [.....]
6. Ê dest bi qîrîn û hawarê kir [.....]
7. “her bijî, Ea! [.....]

8. Kî li pêş û paş [.....]
9. Nermkirina xwedayan (?) [.....]
10. Ji bo çi ji wî derbasbu(yî)? [.....”]

-
11. Ea, [waha gote Enli]:
 12. “te agadar [dikim: Kumarbî]
 13. dijî xwedayê bagerê di avê de ser[hildêrek mezinkir]
 14. û qa[ma wîna û ew, mînaekî]
 15. radike [.....]
 16. [.....]
 17. [.....] [..... kev]n (?)
 18. [.....]

19-22 “gelekî hincirîne)

23. Ea dema got[inan-je,]
24. û [çû] li ba Upellurî
25. Ê Upellurî çavên (xwe) [vekir (?)]
26. Upellurî, ji Ea re [ev pêyvana got:
27. “Tu her bijî, Ea! [.....”]
28. Ji bo Upellurî jiyan [.....]
29. Upellurîyê ku li ser er[d û ezma]n saz kirine.

-
30. Ea, [dîsa go]te Upellurî: “Ma tu nizanî,
 31. Upellurî? Qey kesekî ji bo te agahî nehanî?
 32. Agahiyên xudayê zîrek yê ku Kumarbî dijî
xudayan afirandiye,
 33. û Kumarbî
 34. çawa plansaziya kuştina xwedayê bagerê dike û
 35. dijî wîna serhildêrek afirandi ye ma te nebîstiye?
Ma tu di avê de
 36. mezinbûna kevrê ristim nizanî? Ê wî, weke
 37. rakir û avête ezman, paresgehên pîroz
 38. û li ser Hebat’ê. Ê tu (êy) Upellurî, ku tu ji erdê tarî
 39. dûrketî, lewma wî xwedayê çalak agahdar nînî?”
-

40. Upellûrî bersiva Ea da û gotê: “Dema ku ezman
 41. û erd li ser min avakirin, haya min ji tiştê tune bû.
 42. Dema ku hatin ezman û erd bi kêreke (?) (bi mîsî)
 ji hev qetandin,
 43. min ew ji nizan bû. Naha milê minê rastê (?) hinekî
 44. diêşe, lê belê ew xweda kiye ez niza[nim]!
 45. Ea piştî wan gotinana bihîst, Upellûrî
 46. hingê milê xwe yê rastê zivirand; û kevirê ristim,
 47. li ser milê (?) [rastê] yê Êpellûrî weke stûnekî (?) sekinî
 bû.

- 48. Ea, vecarê vegeriya xwedayên kevnar û gote wana:
 49. “Xwedayên kevnar yên ku pêyvên kevn dizanin, guhê
 xwe bidin gotinên min!
 50. Wan [ma]lên mohrê yên mêjve, ji bav û kalan mane
 dîsa vekin!
 51. Ê bila mohra bapîrê wî yê hê ji berê ve bînin,
 52. -53 [û ewana] careke dinê mohirbikin! Ê bila wê kêra (?)
 (mîsî) ku ezman û erd ji hev qetandin derxînin!
 54-55. [Ê] bila ji bin re lingên kevirê diyorît ê ku
 Kumarbî ew dijî xwedayan afirandiye jê[kin (?)]!”

Stûna IV.:

(Ji berya rêzika yekemîn 23 sê rêzik kêmin, sê rêzik jî peritîne.)

1.
2.
3.
4. Lê Taşmişu [.....]
5. [.....]
6. dest bi axaftin+e kir: [“.....]
7. li laşê wî de [.....] li serê wî de (?) [.....]
8. Por [.....]

- 9. Ea, bersiv da Taşmişu: “Tu pêşve here (?)!”

10. Ez digel kurê xwe (?) [.....] disekinim. Bêhna min teng bû ye(?).
11. [.....] di cihanê de (?) tiştên ku min bi çavên serê xwe dît[ibû]n bila bimirin! Ê ew xubaran (?)
12. [.....] dimînin.”
-
13. Ea, dîsa gote Taşmişu: “Ewilî min ew,
14. [.....] kevirê diyorit têkbir. Herin û dîsa dijî wîna şerbikin!
15. [.....] êdî (weke) stûnekî (?) nesekine!” Taşmişû
16. [.....] dilşad bû û sê caran (çepik) lêda (?) û jorê
17. [.....] bihîstin; du caran çepik lêda (?) û li Kummiya’yê
18. şahê leheng xwedayê bagerê [bih]îst. Ji ber vê egerê gihîştine cihê civînê
19. û hemû xwedan dijî Êllîkumma’yê ji kevirê diyorît mîna dewaran
20. Dest bi borîniyê kirin.
-
21. Xwedayê bagerê weke banzda li ser erebê (?) û bi gurîniya ezmên ve
22. gihîşte li ber deryayê. Xwedayê bagerê dijî kevirê diyorît şerkir.
-
23. Kevirê diyorît gote [xwedayê bagerê]: “Ez ji te re çi bêjim? Xwedayê bagerê!
24. Herdem lêxê! Giyanê wîna hundirê [.....] disekine (?).
-
25. Ezê hemû tiştan ji te re bêjim ey xwedayê bagerê: [giyanê te]
26. Fena cevherekî giranbuha g[irêda]! [.....] ezê paşatîyê
27. bikim û Kummiya [.....] û mala kuntarra

28. wergirim, lê weke xwedêyan li ez[man-]im!”

29. Ullîkummî, [.....-] re [..... got: “.....]

(*Li berdewama wê de bi tenê dawiya rêzikan mane.*)

Ev efsaneya, dema di hîtîta’de jî gelekî berfireh dihate gotinê. Ji Zimanê Horiyan wergerandine Zimanê Hîtîtî. Kaniya vê efsanê weke “*Hukumdariya li Ezmên*” bingehê Mîtolojiya Horiya ne. Her dû jî, ji plansaziyên fênekî yên Kummarbî dest pê dike û heya serkeftina xwedayê bagerê destnîşan dike.

Li devereke efsanê de derya Kummarbî vedixwîne ziyafetê, lê mixabin piştî 37 rêzikan yên dinê wenda ne. Ji ber vê egerê di çîrokê de peşkeftinên li pey re eşkere nabin. Di efsanê de Kummarbî ne bi tenê serhilderek e. Dost û hevalên û peywendiyên wîna jî hene. Ji ber ku Derya hevalbenda wî ye.

Ji ber sedema peritîbûna tablêtê bigumanî mirov encama wê têderdixe. Lê belê diyare her çiqasî Kummarbî nexşekeşiyek pir zîrek amede kiribe jî, nukaribiye xwedayê bagerê Teşşub ji ser textê wî bîne xarê. Ji ber ku di hemû diroka horiyan de Teşşub ji nav xwedayan de asta yekemînde dihate dîtinê. Herwusa rola bavê xwadêyan dîsa ya Kummarbî ye. Kummarbî xwedayê li pêş serdema B.Z. III. hezar sala ye. Ji wê serdemê pêve li Asya-Pêşîn de şerên deshilatdariyê zêdetir in. Êdî li şûna bajar-dewletên piçûk împaratoriyan mezin ava dibin û ramana wana ya sereke cihangîriya welat û gelan e. Ji wir û pêve xirecîreke mezin dikeve nav civaka mirovan. Şûna aşîtiyê şer, şûna jînê mirin, şûna guhorandina berheman talan, şûna avakirinê xopan kirin seran ser mîna kavûsekê dikeve li ser civakên Asiya-Pêşîn. Herwaha, pozberiyên ji bo dagirkeriyê û berxwedana dijî wana, saya xwe davêje li ser hizir û ramanê. Her kes, civak û rêber ji bo kiryarên xwe bidin peji-randinê, di aliyê hizrê de ji bo xwe qewlikên ol û ayînî amade dikin.

Dema ku mirov ji buyerên “*Hukumdariya li Ezmên*” û “*Destana Ûllikummi*” lêkolîn dike, weke ku jiyana civakî û

siyasî ya horiyan temaşe dike. Ango, Kummarbî xwedayê serdema bavik, êl û hozên horiyan e. Dibe ku Kummarbî navê sazkarê destpêkê yê bajar-dewleta horiya be. Herwusa bajar-dewleteke horiyan navê wê Kummiya/Kummanî, parazgeha pîroz ya horiyan bû. Ev bajar hingê û hewqasî çend hezar salan navende hecê bû. Îjar ev bajarê pîroz li ser navê bavê xwedayan Kummarbî bû. Diyare navê bajêrê Kummiya ji ber navê Kummarbî hatiye dayînê.

Etîmolojiya Kummarbî hîna diyar nebûye. Yeqîn bi Zimanê horiya ne. Bi horîkî kumdi/kumtî di wateya 'kumik, qule, bajarok' de ye. Biguman, Kummarbî ji wateya sazkerê bajêr yan quleyê hatibe afirandin.

Kummarbî nûnerê qewmê horiyan e û parêzkerê dewr û dema berê ye. Cara yekemîn, Kummarbî dijî serdestiya Anû şerdike, lê di vî şerî de mîna ku nukare xwe ji hizrên pirêhî biparêze. Ango yekbûna ol û ayîna horiyan, ya sûmer û samiyân diyare ji hingê ve dest pê dikê û di encama vîna de teogoniyeke dîliqî û tundrû bi serûber dibe.

Cara duyemîn, dema ji dayîkbûna xwedayê bagerê Teşşub'e. Teşşûb, berya vê serdemê bi tenê hewa xwaş, baran û bereketê ve mijûl dibe. Lê di serdema şer û cengan de, êdî mirov hewcê serleşkerên cengawer in. Ji bo vê armancê xwedayê bagerê bi gurrîniya ezmên, û vijîniya ba û bagerê anga tirs û gefane. Ji ber vê egerê rola sereke didine wî.

Di cara dudemîn de Kummarbî, dixwaze endamê hizra dîliqî û dureh (xwedayê bagerê) hê li roja dayîkbûnê daqurtîne. Lê belê di vê qonaxê de ew tenê ye, bê dost û bê heval e. Haya figurên dor û berên wî ji xetera hêza rûxandinê ya kozmogoniya nû tune ye. Tekoşîna Kummarbî bi şeweyekî ezîtiye dinirxînin. Şerê qonaxa dudemîn yê Kummarbî ji bo parastina hebûnên heya hingê hatibûn berhev kirinê ye.

Bi şerê sisemîn ve Kummarbî di keseyatiya Îllukumî de dijî hizrên dagirker rikeberîyeke xurt destnîşan dike û vê carê

hin dost û hevalên wîna jî hene. Buyerên di vê qonaxê de mîna şeweyên tekoşîneke rizgariyê ne.

Mîtolojiya horiyan sê şewazan mirov dikare karakterîze bike. Ya yekemîn a etnîkî ye û ya horiyan bi xwe ye û zêdetir Serdema Neolotîk ya bi qonaxa amanên axînî derbîran dike. Ya dudemîn, mîtolojiya serdema Tunc yên hemû qonaxên wê ye. Hingê hikara mîtolojiyên dereke çêdibe û gel bi hev re didin û distînin. Ji hingê pêve êdî xwedayên horî, sûmer, babîl, kenan û hîtîtiyan hemû têkilhev dibin. Bi vana hemuyan re dibêjin mîtolojiya Mezopotamya'yê. Ya sisemîn, dema ku horî li Anatoliyayê û rojavayê derya spî derketine pêş û bûne Împaratorî, hikara mîtolojiya wana li ser hîtîtiyan, yûnan û fenîkiyan çêdibe. Dîrok nas bi vîna re dibêjin ku, horiyan rola veguhêztina mîtolojiya Mezopotamya'yê lêystine.

Gava ku mirov mîtolojiya "*Hukumdariya li Ezmên*" û "*Strana Ullikummi*" digel *Thegoniya Hesîdos* a Yûnaniyan dide li berhev pêjna wekhevîyê dibe. Di "*Hukumdariya li Ezmên*" xwedayên despêkê *Alalû*, *Anû* û *Kumarbî* ne. Paşê yekî sereke yê dinê ango xwedayê bagerê *Teşşub* derdikeve holê. Evana hemû mîna bav û kuran tene rêzkirinê. Di *Thegoniya Hesîdos* de *Uranos-Kronos-Zeûs* he ne. *Kumarbî*, organê cinsî yê *Anû* gez dike û wî dixesîne, *Kronos* jî bavê xwe *Uranos* bi dasekî ve dixesîne. Angoreyî Mîtolojiya Horiyan xwedayê bagerê û herdikên dinê bi avîka *Anû* û tûka *Kumarbî* peyda dibin. Di *Hesîdos* de dema ku *Kronos* organê cinsî yê bavê xwe jê dike, xwîn jê diherike. Ji vê xwîne xwedayên tolhildanê diafirin. Hem di Mîtolojiya Horiyan de, hem jî di *Hesîdosê* de armanc afirandina xwedayên tolhildanê ne. *Kumarbî*, dixwaze kurê xwe daqurtîne, *Kronos* jî, ji bilî *Zeûs* hemû zarokên xwe dadiqurtîne.

Di navbera *Helbesta Ullikummi* û *Şerê Tîtan*an ya Mîtolojiya Yûnan hinek cûdabûnên xwe hene. Lê belê *Tîtan* û *Kevirê Ristim* heman rolê dilêyzin. Xwedayên yûnanan, li hember *Tîtan*an bê desthilat û neçar in. Di *Helbesta Ullikummi*

de jî wusa ye. Hemû xweda û xwedawend di nav hela hela û neçariyê de ne. Ullikumma pir mezine, *Typhoeus* 'ê yûnanan jî mezin hatiye danasîn. Di Mitolojiya Horiyan de xweda dixwin, vedixwin, dizevicin û dimirin. Di ya yûnaniyan de jî ev cure buyer hene.

Upellûrî, xwedayê ku Ullikummi li ser milê wî disekine ye. Hindî xêvike ku haya wî ji vê nîne. Bi tenê eşekê li ser milê xweyê rastê hes dike. Di Mitolojiya Yûnanan de ezman li ser milên Herakles disekine. Herakles ji bo balîvekê bide ser milên xwe, ji Atlas daxwaziya kêliyekê girtina ezmên dike. Herwusa dunya li ser ustukura Atlasê xapandî de dimîne.

Di Helbesta Ullikummi de Îştâr dixwaze bi bedewbûn û muzîka xwe ve Ullikummi dilkêşan bike. Da ku Hukumdariya xwedayan nerûxîne. Lê belê ew jî bisernakeve, ji ber ku Ullikummi bêhest e, ker û kor e, ne dibîne ne dibhîze, ne jî hes dike. Gulperiyên (sîrene) mitolojiya yûnanan jî bi muzîk û bedewbûna xwe deryavanan ji rê derdixin.

کتابخانه
کتابخانه

هه و النامهه كئيب

ÇÎROKA APPÛ Û DU KURÊN WÎ³⁷

Demekî ji deman, bajark hebû navê wî bajarî Şûdûl (ê) bû. Şûdûl, li jora deryayê û hêla xaka Luluwayanê bû. Li wî bajarî mirovek hebû û jêre digotin Appû. Ew xweyê gelek pez û dewaran bû, ji ber vê egerê Appû dewlementrîn mirovê wê heremê dihate zanîne. Eger hemû zêr û cevherên wîna berhev bikin hewqasî cihê bêderkî dadigot. Ji aliyê bûjenî çî kêmaniyên wî tune bû. Digel vîna jî kêmasiyeke wî jî hebû: Bê kur û bê kok bû. Kalên Şûdûl'ê dema ku digel wîna rûdiniştin li ser sivrê, yekî goşt û nanê çewir, yekî dinê jî mey dida kurê xwe. Lê belê Appu nan nedida tu kesî û pir berxwe diket. Her çiqasî ev rastî li pêş çevan veşartî bû jî, ev rastî li qata xwedayan de eşkere bû.

Rojekî ji rojan Appû rabû çû mala xwe. Derbasî odeya xewê bû û hema gîzmê wî di lingan de yekser kete cihê xwe û raza. Jina Appû bi xulam û berdestiyan re got:

- Ew, heya naha serfiraz nebuye. Ma gelo dikar naha biserkeve?

Jina wî jî tevî kincan xwe cem wî dirêjkir. Appû xwe ji daxwaza cinsî safî dîke. Jina wî jê dipirse:

- Tu heya naha qet serneketî, tê wêtrê tuyê vê carê serfiraz bî?

Appû bersiva wê dide û dibêje:

- Tu jinî û cinsê mê yî, ji ber vê tu qet tişteki jî nizanî.

³⁷ J. Siegelova, Appu-Marchen und Heddamu-Mythus (Studien zu den Boğazköy-Texten, Wiesbaden, 1971:34; Sholmo Izrael & Rina Drory, Israel Oriental Studies XV, Language and Culture in The Near East, Tel-Aviv University; Dawid P. Wright, Ritual in Narrative, The Dynamic of Feasting, Mourning, and Retaliation Rites in the Ugarit Tale of Aqhat, 1953, 2001 de ABD'de basılmıştır.

Appû ji cihê xwe rabû, rahîste berxeke çîlsipî û çû ba xwedayê rojê. Xwedayê rojê ji ezman berê xwe da jêrê û ew dît. Ji wî pirsikir, gotê:

- Çi pirsgirêka te heye bêje ezê wê çareser bikim.

Gava Appû gotinên xwedayê rojê bihîstin ji dil û can dest bi axaftinê kir û got:

- Xwedayan gelek tiştên baş dane min, qet tiştek ji min kêr nîne; lê belê kemasiyeke min heye: Qet kurê min nînin.”

Xwedayê rojê bersiva wî dayê û gotê:

- Here ! vexwe û serxoş be, paşê jî biçê mala xwe û tevî jina xwe razê. Paşê xwedayên zarokekî bibine te.

Appû vegeriya mala xwe û xwedayê rojê jî hilkişiya li ezmên. Xwedayê bagarê, ji sê fersah dûrahiyê ve xwedayê rojê dît û gote wezîrê xwe:

- Berê xwe bide li wê derê şivanê erdê, (waye) xwedayê rojê hat³⁸. Qet deverekî erdên me xirab nebuye, qet kesekî bajarên me dîl negirtiye û qet deverekî civaka me têk neçuye. Fermanê bide bila xwarinpêj û sakî xwarin û vexwarinê bidine wî.

(Ji pey vê berdewamiya stûna dudemîn kêr e. Diyarê, di nivisarê de Xwedayê rojê ji bo daxwaza Appû pêkbîne alikariya wan dixwaze. Nivisar ji stûna didome.)

Jina Appû ducanî ma. Meha yekemîn, meha dudemîn derbas bû; meha sisemîn, meha çaremîn, meha pêncamîn, meha şeşemîn, meha heftemîn, meha heyştemîn û nehemîn derbasbû çû. Bi hatina meha dehemîn re jina Appû kurek anî dunê. Dapîrokê zarok rakir û danî ser çokên Appû. Appû pir dilşad bû û ew li ser çokên xwe hilpêtikand. (Appû got):

- Xwedayan rêya xirab hilbijartine, hingê bila wî kurê min re bêjin Navxirab.

³⁸ Xwedayê rojê, di navbera mirov û ajalan de dadgeriyê dike. Şivan û efendiyê mirova ye.

Jina Appû cara dudemîn ducanî ma. Bi hatina meha dehemîn jina wî kurek (dîsa) hanî dinê. Dapîrokê zarok hilda û da Appû. Apû got:

- Bila navekî wî rind hebe. Vê carê xwedayan rêya rast hilbijartine, herwaha bila navê vî zarokî jî Navxwaş be. Zarokên wî mezinbûn û gihîştin çaxa xamatî bûnê.

Piştî ku zarokên Appû gihîştin û mezin bûn, ew ji Appû [cihê] bûn û mala xwe jî veqetandin. Birayê Navxirab, gote yê Navxwaş:

- Em ji hev veqetin û cihê bijîn.

Navxwaş gotê:

- Tu çi [dixwazî bêjî]?

Wîna bersiv da Navxwaş:

- Wek çawa çiya cûda cûda ne; weke her çemek çawa bi serê xwe diherike; weke çawa xweda cihê dijîn, em jî dikarin ji hev cihê bijîn. Ez van mînan dikarim zêde bikim: Xwedayê rojê li Şîpparê de, xwedayê hîvê li Kûzîna'yê de, xwedayê bagerê li Kummiya'yê de, Îstar li Nînîvê de, Nanaya li Kişşîna'yê de, Mardûk li Babîl'ê de dijîn. Herwusa divê em jî weke xwedayan cihê bijîn.

Herdu bira jî hev cihêbûn. Xwedayê rojê ji ezman temaşeyî wan dikir. Ji ber ku Navxirab ji bo xwe [.....] hilda û [.....] da birayê xwe. (du rêzik peritîne.) Dema xwedayê rojê ji ezmên wan dinyêrî, birayê Navxirab çêleka baş ji bo xwe hilda, ya nebaş jî da birayê xwe. Hingê xwedayê rojê got:

- ji naha pê ve bila çêleka birayê Navxwaş bijûndar be û bizê.

(Dahatiya vê stûnê şikestiye. Lê beşeke piçûk ku behsa birayê nav baş dike tenê maye. Dîsa jî derbareyê lihevnekirina herdû birayan çawa çareser dibe, hizrek li serê mirov de biserûber dibe.)

Dema ku ew gihîştine Şîppar'ê [] xwedayê rojê pesnên birayê Navxwaş da. [û li ser vê Navxirab] dest bi nifiran dike. Ji ber vê egerê xwedayê rojê [.....] got:

ÇÎROKA ÇÊLEKÊ Û MASÎVAN³⁹

Xwedayê rojê ji ezmen berê xwe dide jêrê çêleke kok dibîne. Ew çêlek li mêrgeke bi adan diçêre. Dilkêşîya wî bi çêlekê re çê dibe. Xwedayê rojê xwe veguhestand mirovekî ciwan û paşê jî ji bo bi çêlekê re şabe dakete li ser ruyê erdê. Qestî ji ber zîrar dayîna çîmên mêrgê bi çêlekê re hêrsa xwe tîne. Piştî hinek axaftin (û kiryanan) çêlek ji wî ducanî dimîne.

Piştî mehên canîbûnê yên ededî çêlek dizê û zarokêkî tîne dunê. Çêlekê (serê xwe bilindkir) li ezmên û go[te xwedayê rojê]:

- Ez ji ber vê buyera kirêt digirîm! Divê çar lingên [golikekî] hebin, ji bo çi min evê du ling anî li dunê?

Ji pey re çêlekê devê xwe mîna şêrekî vekir, mîna pêlêkî lêhiyê çû ser zarok û xwast wî daqurtîne.

Xwedayê rojê, ev rûdana dît û zarok ji destên wê xilas kir û derxiste li ezmên. (Paşê), wî zarokî dide xwedayekî dinê, fermanê dide wî ta ku zarok bibe li çiyê. Ji bo guhê wan li ser zarok be, fermanê dide balinde, teyr û maran jî.

Piştî demeke dirêj masivanek ji bo gerê derdikeve li çiyên û tê cem wî zarokî. Hingê balinde difirine ezmên, mar dikeşin dikevîne qulikên xwe. Erka wan diqede, êdî wî zarokî ji bo xwe hêlînek dîti bû.

Masîvan vê buyerê encama pejirandina bergeranên xwe dihesibîne û zarok hildibe hembêza xwe. (Dibêje):

- Diyare min xwedê [.....] kir. Xwedayê rojê ez dîtîm û ji ber xatirê vî zarokî berê min da li vê derê. Hêy xwedayê rojê, te ez ji bo berjewendiyên vî zarokî anîm li vê derê. Ji ber ku te dizanibû zarokên min tune ne. (Ez) bendeyê xoşewîst yên xwedayê rojê me, ji bo wî nanekî somûn datînim li vê derê⁴⁰.”

³⁹ T. H. Gaster, *Les Plus Anciens Contes de l'Humanitee*, Paris 1953; *The Old Stories the World*, Boston, 1953.

⁴⁰ Hîngê nan jî weke boraqê pêşkêşî xwedayan dikirin.

Masîvan zarok hilda û hejand, kêfa wî pir lê hat û hilda bir. Dema ku gihîşte bajarê Urmayê li ser kursiyekî rûnişt. Jina xwe re waha got:

- Min baş guhdarke! Vî zarokî hilde here odeya xewê, li nav nivînan de dirêj be, hindî biqîre da ku bila bajarvanî bêjin jina masîvan zarokek aniye dunê. (Hingê) hin kes nan, hin kes bîrayê, hin kesên dinê jî dê goşt bînin.”

Jina masîvan miroveke pir jîr bû. (demek ji deman) fermaneke masivan ji paş guhên xwe re avêti bû. Ji ber wê egerê ew ji adankariya xwedanan (bêpar mabû.) Lê belê paşê, êdî bi rajêrîyekî gotina mêrê xwe guhdarkir. Kete odeya xewê û kire qîreqîr. Dema ku şêniyê bajêr (dengê wê) bihîstin waha gotin: -

- Hişbin û guhdarkin, diyare jina masîvan kurek hanî dunê.

Piştî wan gotinên wusa şêniyê bajêr dest bi anîna hin tiştan kirin. Yekî nan anî, yekî dinê jî goşt û bîra jêre anî.

ÇÎROKA KEŞŞÎYÊ NÊÇÎRVAN⁴¹

Demek ji deman Keşşî'yê neçirvan hebû; bavê wî miribû û digel dayika xwe disekinî. Her suba zû radibû diçû li çiyayê û her êvarê jî bi curbecur heyvanên nêçîrê vedigeriya malê. Neçirvanekî pir zîrebû. Heta debara xwedayan jî wî pêk dihanî û her cara ku êvaran vedigeriya mala xwe ji nav nêçîrên xwe de çend heb jî pêşkêşî xwedayan dikir.

Lê belê rojekê ji rojan her tişt tê guhêrandinê. Dile Keşşî dikeve xwîşka Udubşarrî ya bedew û bixawên. Ji nav heft xwîşkan de cilweyan bi ya piçûk re çêdike û (paşê jî) bi wêna re dizewice. Lê belê neçîrvaniyê tewr ji bîr ve dike û her roj li malda rûdinê û tim û tim mêl û bala wî li ser jina wî ne.

Diya Keşşî ji ber vê rewşê pir xemgîn e. Bang li wî dike û dide şermê û dibêje:

- Keşşî, tu jêhatîtirîn nêçîrvanê bajêrbûyî, ji te wêrektir û merxastir kesek tune bû. Nuha jî li xwe binyêre! Tu bi xwe notila nêçîrekî ketî xefîkê! Her çendî xwedayan xureka xwe qedandine û diya te birçî maye jî, tu karekî tenê dikî, ew jî rûniştina te bi jina te re ye. (Ango), wê hiş û aqilê te ji serê te birye⁴².

Li ser van gotinan, Keşşî wek ji nûve zîndî dibe, di kêliyê de radihêje rima xwe, bang li tejiyan dike û ji bo nêçîrê diçe çiyayê Natarayê⁴³.

Lê dema ku mirovek xwedê ji bîr neyne, xwedê jî wî nayêne bîrya xwe. Keşşî gihîşte li quntara çiyê, lê xwedayên xeyîdî nêçîr li ber çevên wîna veşartin⁴⁴. Sê mehan li ser hev tînî û birçî li wan çiyayên digere, ji ber quretiyê venagere mal û hema wusa berela digere. Di encamê de hewqasî diweste ku

⁴¹ H. G. Güterbock, The Hittite Version of the Hurrian Myths, American Journal of Archaeology 52, 1948.

⁴² T. H. Gaster s. 130

⁴³ H. D. Vries, s.45

⁴⁴ H.G. Güterbock, KE s. 69

lingên wî diterpilin û ew dikeve xarê û li bin siya derekî de jixewra diçe. Lêbelê, devera ku Keşî lê radizê, qewilgeha hecûca ye. Wan bejnbostên bêd li çiya dijiyan û tade li rêwiyan dikirin. Dema ku hecûcan lê nihêrî ku Keşî li nav erdê wan de di qewilgeha wana de radizê, dora wî xelekêk çêkdikin û xwe hildavêjin, dest bi zirtik û çirtikan dikin, dixwazin wî qet qetî bikin.

Lê li çiyên ne bitenê hecûc hebûn, giyanên miriyan jî li wan deran dijiyan. Dema ku hecûcan (gnom) li dora Keşî xelek çêkin, giyanê bavê Keşî jî, li bilindahiya çiyê ew temaşedikir û ji bo kurê xwe diqilqilî. Dixwast wî ji nav lepên hecûcan xilasbike. Ji nişke va hizrek dikeve bîrya wî.

Dengê wî mîna brûskeke divizîne û waha dibêje:

- Hecûcno, ji bo çî hûn xwe diwestînin. Hûn nukarin wî parçe parçeyî bikin? Hema bi tenê paltoyê wî derxin, ewê fêm bike ku we ew sezakiriye. Çimkî dê serma bike û bilerize û piştî demeke kurt ji bo xwe ber agir germ bike dê vegere mala xwe!

Bavê Keşî baş dizane ku hecûc hez ji diziyê dikin.

Hecûc dibêjin:

- Belê, belê em paltonê wî hildin.

Êdîni kuştina wî ji bîr dikin û paltonê wîna dikişînin û diçirînin.

Keşî demekî şûnde hişyar dibe, dinyêre ku êdî roj çûye ava, ba û baranê berê xwe gohurandiye, mij û morana kameyî ya êvarê ji erdê rabuye. Lê diqefile. Ji nişke ve destê xwe dibe li ser milê xwe, heylo! Paltonê wî tune bû. Keşî bi xiroşî li nav gihayên ustûr û deviyên wê derê paltonê xwe digere; di vê navberê de bayê sar tê, mîna ku dor û berên Keşî diçirîne, guj pif dike û weke qemçiyekê şirqîniyê li piştê wî dike û disojîne. Hingê meheke destpêka zivistanê ya sar bû. Kêliyekî ji dûr ve dengê kûzîn û fîzîna kûçikan hate guhên wî.

Di encamê de Keşşî, li peş bagera tirsnak ruyê xwe vedigerîne, piştî xwe dide felekê û berê xwe jî dide ronahiya tenêbûnê ya li newalê⁴⁵.

*(Piştî valabûneke di nivisarê de behsa heft xewnên Keşşî tê kirinê. J nav vana de sê xewn tewaw, serhev şeş xewn mane.)*⁴⁶

Di xewna duyemîn de Keşşî li ber deriyekî pir mezin e, her çiqasî bêhevî be jî dîsa dixwaze wî deriyê vebike; piştî gelek hewildanan ew di hundir de asê dimîne. Di xewna sîsemînde, hinek tiştan ji çiyayê Natara, dibe li Sippar'ê, xulam jî alikariya wî dikin. Di xewna çaremîn de: Ji ezmên parçek kevîr ji zinarekî dikeve xarê û ji nav xulamên wî de bendeyekî xwadê dipelixîne. Di xewna wî ya pêncemîn de: Bavê Keşşî yê xoşewîstê xweda agirekî dadide. Di xewna wîna ya şeşemîn de: Keşşî di ustiyê xwe de berstuyekî û jêrê ji paniya jinekî dibîne⁴⁷. Xewna heftemîn de: Keşşî diçe nêçîra şêran, dema ku ji deryê hewşa malê derdikeve rastî Damnaşşara⁴⁸ û maran dibe.

Keşşî li berbangê hişyar dibe, vedigere malê û xewnên xwe ji diya xwe re vedibêje. Bê hêviye û ji diya xwe re waha dibêje:

- Eger careke dinê ez herime çiyayê hecûcê dîsa bixwazin min qet qetî bikin! Ez çi bikim?"
Diya wîna bersivê didê û dibêje:
- Qet netirse kurê min, tu vê strana kevn bîne bîra xwe:

*“Kurte-demekî şunda ji nûve xwe verast dikin.
Hengama fûrîna çeman av tê ser bajêr,
Bajarê mezin dilerize, lê herdem ser piya ye.*

⁴⁵ T.H.Gaster a.g.e., s. 130-131

⁴⁶ B. De Vries, a.g.e. s., 46

⁴⁷ Dibe ku xalxalekî dibîne.

⁴⁸ Damanassaraş jî xwedayekî ku nave wî zêde derbas nabe. B. de Vries, a.g.e., s. 47-49. Akt. A. Alpman, Hitit Mitolojisi.

*Pir caran mirov diqîre (û dibêje): Ezê bimirim;
Zarok deng lê dike û dibêje:
li wê derê bi tenê binale,
lê bi wan xewnên negirîng re neyê girêdan,
vegere li çiyar,
ji ber ku qet neqenciyek jê te nukare!”*

*(Herwaha, piştî ku Keşî vê helbestê guhdar dike dîsa
vedigere li çiyar û dibe nêçîrvanekî jêhatî.)*

هه‌و‌نا‌مه‌ی کتێب

ÇÎROKÊN GURPARANZAḤ⁴⁹

Ji çîrokên GurparanzaḤ bi tenê du parçeyên şikestî mane. Ji vana yek “*GurparanzaḤ û Dicle*” ye. Mijara wê axaftina di navbera GurparanzaḤ û Dicle’ye. AranzaḤ navêkî horiyar e. Çîroka dinê jî derbareyê pêşbirkê ye. GurparanzaḤ û hinekên dinê ku dixwazin qîza Împakrû’re bizewicin. Ji ber vê sedemê Împakrû di navbera wana de pêşbirkekî lidardixe. Ev çîrok bi navê “*GurparanzaḤ û Kevan*” jî tê zanînê.

Piştî ku GurparanzaḤ dema sefereke nêçîrvaniyê de çen heb ajalên dirinde dikuje, Împakrû tevî şêyist cengawerên wî vedigerin Aggadeyê. GurparanzaḤ ji nav “*şêyist şah û heftê lehangen*” de li ser kursiya şerefê rûniştibû. Piştî ziyafetê daxwaza tîr û kewanan û hedefê kirin. Di nêçîrvaniyê de GurparanzaḤ şêyist *şah û heftê lehangen* têk dibe.

Li pey pêşbirkê GurparanzaḤ û Împakrû diçine razanê. Ji bo nîşana serkeftinê gulavên bêhna xwaşik li xwe didin û her devera ku ew diçinê bêhna xwaş belavî li wan deran dibe. Ji pêpilekî re hildikişine odeya xewê.

(*Ev dera çîrokê şikestiyê. Jina wî dijî rawestana zewaca Tatuzili’yê destnîşan dike.*)

⁴⁹ Ji aliyê H.G. Güterbock, Kumarbi Myths, s. 68-69 hatiye wergerandinê.

هه و النامهه كئيب

DESTANA KURDO

Ev destan li ser şahê Mitaniyan Keret/Kirta (B.Z. 1500) ango damezrênerê devleta Mitaniyan hatiye gotinê. Berhemekî Serdema Mefreqê ango ya Tuncê ye. Di derbareyê Kîrta de nivisên zêde tune ne. Ji bilî Efsaneya Kîrta yan jî Keret û li ser mohrekî bi Zimanê Akadî “*Šuttarna DUMU Kîrta* LUGAL *Maîtanî*”⁵⁰ “*Şûtarna kurê Kirta (Kurdo) şahê Mîtaniyan*” ti nivisarên dinê hîna peyda nebûne. Sedema vêna ya sereke heya naha nedîtina xopanên payîtextê Mitaniyan bajarê Waşşukaniyê ye.

Ev efsaneya Kurdo bi Zimanê Ugarîti hatiye nivisandin. Ango ûgarîtiyan ew bi şeweyê samiyan, angoreyî dem û devera xwe lihev anîne. Lêbelê, dîsa jî wek efsaneya horiyan tê zanînê. Ji ber ku şêwazên ayîn û navê lehengên sereke yê vê destanê bi Zimanê Horiyan e. Mîna: *Kîrta/Keret, Hurriya, Khabur*⁵¹ û hwd.

Di xwemaliya nivisarê ya bi tîpên mixî de navê Kurdo mîna *krt* hatiye nivisandinê. Lêkolîner û vergervanan jî *krt*⁵²,

⁵⁰ *Šuttarna navê şahê mitaniya ye.*

DUMU (bi Zimanê Akadî) ‘kurê’
Kîrta ‘Kirta’
LUGAL (bi Zimanê Akadî) ‘şahê’
Maîtanî ‘Mîtanî’

⁵¹ Albert T. Clay, *The Origin of Biblical Traditions, Hebrew Legends in Babylonia and Israel*, s. 96, üçüncü kitap, 1999; Prof. Sayce ji bo wateya Xabûr dibêje: “*Çemê mirine*” yan jî “*dayîka çemê mirinê*”. Herwaha di nav Zimanên Samiyan de wateya çemê Xabûr geriyane. Diyarê ji ber ku mesela mirinê di vî navî de heye herkesî bi çavê mirinê lê nihêrîye. Di kurdî de *Xabûr* wateya ‘xuroş’, ‘fûryayî’ û ‘gujê’ dide. Ango dema ku ava wê radibe dor û berên xwe xirabdike, cadar û necandaran hemû tiştên berkevin dibelîne. Dibe ku ji ber vê egerê navê “*çemê mirinê*” lêkirine..

⁵² R. Follet, *Le poème de Krt mtyhe social?*, *Biblica* XXX VII, s. 341-348, 1956.; John Gray, *The Krt Text in the Literature of Ras Shamra, A Social Myth of Ancient Canaan*, second edition, Leiden, E. J. Brill, 1964.

ango navê lehengê sereke yê destanê eletexmînî bi guncaviya Zimanê Fênîkiyan kirine Keret yan jî Kirta. Wek tê zanînê di Alfebeya Ugaritiyan de dengên mîna *u, o, i* tunene. Ji ber vê egerê ew tîp bi dengên *û, î* yê bilêvkirine. Bi guman divê rastiya wî navî *Kurdo* be. Bilêvkirin û bidengvedana navê Kurdo her çiqasî di kurdiya nûjên de tê bikaranînê jî, nayê wateya ku ew pêyiveke yan jî navekî nûjen e. Piraniya navên kurdî kurt in. Heta navên biyanî yê ku ketine nav Zimanê Kurdî jî tên kinkirinê. Mîna: Mehemed → *Memo*, Nureddîn → *Nûro*, Seyfeddîn → *Sêfo*, Hesên → *Heso*, Huseyîn → *Huso* û hwd. Ev cure guhorandina navan diyare kevneşopiyek beriya hezaran sala ye û ji Zimanê Horiyan mîrat maye. Ji ber ku navên horiyan jî (ji bilî navên şahên Mîtaniyan yê Hînd-Ewropî) wusa kurtin.

Mînakî:

Zimanê Horiyan

Tiş-atal

Unab-şennî

Tadû-Heba

Haşu-keldî

Arum-Atal

Zimanê Kurdî

Tasê Ato

Onê Şêno

Dada Hewê

Heşê Kelo

Aramê Ato

Ji van mînakana mirov dikare bi hezaran bide. Ji ber van taybetiyên herdû zimanan navê Kirta/Keret di vê pirtûkê deweke Kurdo hatiye nivisandin. Herwusa rastî û mafdariyeke dîrokî ya Wejeya Horiyan jî destnîşan dibe. Bê şik, mîtolojî, efsane, huner, dua û niyaz, nav û biwêj di nav hemû gelan de belaw dibin. Ango dibine malê hemû mirovahiyê. Lê, ji wana her yekek ji kaniyekê derketine û paşê jî weke çemekî pir şaxeyî berê xwe dane hemû deverên cihanê. Çavkaniya vê destanê jî horî ne. Dengvedana pêyv û navên horiyan bi şêweyê baştirîn û rastirîn bi kurdî tên bilêvkirin.

Bilêvkirina Keret an jî Kirta angoreyî dengvedanê Zimanê kenaniyan ango samîyan e. Kurdo yan jî Kurda di zimanê wana de buye Kirta/Keret. Ev jî di zimanê wana de tiştekî bi-

destûr e. Heta îro bi Zimanê Erebi Kurd yan jî Kurdo weke Kird û Kirdî têye bilevkirin. Ji ber van egeran dikarin bêjin ku navê destanê yê rastî Destana Kurdo ye.

Li derbarê *Destana Kurdo* du hizir hene: hinek lêkolînêr dibêjin ev destan bi tenê efsaneyê⁵³. Hinek lêkolîner jî dibêjin ku bingehê wê yê rastiyê jî hene⁵⁴.

Di destanê de şahek navê xwe Kurdo heye. Bi mirina zarokên wî ûrt û ocaxa wîna belav dibe. Her tiştên wî hene. Lê belê kurên wî yên ku cihê wî dagrin tune ne. Ji ber vê egerê pir xemgîn e. Di xewnê de xweda El⁵⁵, ewê çawa bibe xayî zarok rê û durban nîşanê wî dike. Her ew jî an goreyî xewna xwe diçe erîşî li ser bajarê Ûdûm'ê dike ta ku şahê wê derê Pabîl keça xwe Horiyayê bide wî.

Lê belê beriya ku ew Horiya'yê bibe, diçe li parasgehêkî û li peş xwedayan sond dixwe dibêje: "*Eger ez Horiyayê bibim û kurên min çêbin ezê zêr û ziban pêşkêşî parastgehê bikim.*"

Herwaha, ew Horiyayê dibe û di dawiyê de heft kur û şeş keçên wana çêdibin. Piştî heft salên wî derbas dibin, soza Kurdo dikeve bîrya xwedayan. Xweda dibêjin: "*ew li ser soza xwe nesekinî divê me çî dayê emê şunva jê bistînin*". Kurdo nexwaş dikeve û derdê wîna bê dermane. Bi tenê xweda dikarin çareyekî jêre bibînin.

Destan bi şêweyekî bi xwaşbînî diqede û Kurdo pak dibe û radibe li ser piyan. Di vê destanê de tekoşîna ji bo desthilatdariyê di navbera kur û bavê de heye.

⁵³ Akt. Constantîn Daniel, Gindirrea Feniciena in Texte, Editura ştiinţifică şi enciclopedică, Bucureşti, 1979; I. Engell, Studies in Divine Kingship in the Ancient Near East, s. 116, 1967, Oxford.

⁵⁴ Akt. a. g.e.; R. de Langhe, gotara *Ritual and Kingship*, di pirtûka Myt, Ritual and Kingship, s. 122, London, 1958.

⁵⁵ Ugaritiyan weke El nîşanda ne. Lêbelê El, di horiyan de Teşşûb e. Ango herdu nav jî di nasîna xwedayê bagerê de ne.

Destana Kurdo bi kar û xebatên civakî hatiye dagirtinê. Her çiqasî mijara wê di navberan mirov û xwedayan de rû bide jî, angoreyî psîkolojîya mirovan hatiye amadekirin. Di vê destanê de rewş û şeweyên aborî ya gel, rewşa çînên civakî, şeweyên şahxwedayî ya siyasî, taktîk û plansaziyên şer, têkiliyên di navbera mirovan û yên di navbera mirov û xwedayan, têkiliyên di navbera xwedayan, têkiliyên di navbera bav û kuran, bav û keçan, xwîşk û birayan, dayîk û bavan, sêvî û hejaran hemû jî eşkerene. Ji ber vê sedemê mirov dikare bêje ku hevhanîna vê destanê pir însaniye ango li ser rastiyên civakê amade kirine.

Tablêta Yekemîn

Stûna I.

TARÛMARA MALBATA KURDO

1. [Derbarê Kur]do
2. Şa[hê] [.....]
3. [.....].. weke [...]
4.
5. Suxrevanê [xoşewîst] yê El,
6. [.....] a xirabiyê. Malbat
7. [.....] hêza xwe ji dest da
8. [.....] Xaniyê [.....]
9. [Şa]hê ku heft [bir]ayên xwe hebû,
10. (belê) heft kurên dayîkê nebût bibûn⁵⁶
11. bo Kurdo (çi bêjim), binemala⁵⁷ wî tuneyî bû⁵⁸
12. ma çi bêjim hêwirgeha Kurdo buye xopan⁵⁹
13. Jina wîna ya bimahr⁶⁰ çû (bin erdê).
14. Jina wî ya mafdar

⁵⁶ Diyare tevî Kurdo, ew heyşt birana.

⁵⁷ Di vê derê de diyar dike ku, bê nifş dimîne.

⁵⁸ Ango hemû mirin, jiyana ji dest dan.

⁵⁹ Dema ku mirovên malbatê hemû mirin, mal tenha û xalî dibe.

⁶⁰ Hingê zewac bi pêymanan fermî dibû. Di nivisarê de “..ya bi zagonî”.

15. ya ku bi qelen⁶¹ û cihêzê hanîbû ew çû!
16. Zarokên dayîkekî wî bi destxistibû,
17. (lê belê) sêyekek ji wana mirin bi sip û saxlemiyê,
18. çaryekek ji wana (berhewa bûn) bi nexwaşiyê,
19. pêncemek (ji wan) revand û bir webayê
20. yê şeşemîn ji hêla pêlên daryayê hate belandinê
21. yê heftemîn bi lêdana şûr kete xarê⁶²
22. helîna wî xopane bû ji herhêlê ve
23. peyçûnên wî berzebûn⁶³ ji kerkesi ve⁶⁴.
24. Ew tunebûn, neman ji kokê ve.
25. Ew, dikeve odeya xwe û digirî,
26. Serhatinê bîrtîne û hêsrana dibarîne.
27. Rondik dikişin berbî jêrê weke cobarekî,
28. dikevin erdê (weke) şekelan⁶⁵,
29. ruyê nivînên wîna şildibe
30. him digirî him jî bixewre diçe;
31. dema digiriya xew dikete çavan;
32. xew xuyange⁶⁶ bi hev re hatin,
33. lê xew serket û ew raket;
34. di xewna xwe de jî şaş û metal e
35. di xuyangê de xwêda El dadikete (jêr),
36. bavê mirovahiyê El nêzikê dibe.
37. Gazî wî dike û dibêje: “Kurdo! Ev çi hale te ye, tu ji ber çi digirî?
38. Ji ber çi hêsrana dibarîne suxrevanê xoşewîst ê El?
39. (Gelo) ew dixwaze hukumdariya
40. [Bo]xe⁶⁷, ya bavê xwe, yan deshilatdari[ya]

⁶¹ Ji hingê ve qelenê jinan he ye.

⁶² Ango bi lêdana şûr hate kuştinê.

⁶³ Ango mirin, tunebûn.

⁶⁴ Hemû zarokên wî.

⁶⁵ Şekel, pîvaneke pereyên zîvî yên dema kavhare ye.

⁶⁶ Xiyal, dîdenîyê di xewnê de.

41. weke ya bavê mirovahiyê?”
42.
43. (peritiye)
44. (peritiye)
45. (peritiye)
46. Peritiye)
47. (peritiye)
48. (peritiye)
49. (peritiye)
50. (peritiye)
51. “..... [çi hewcêye ku⁶⁸
52. (min hebe) zîv û (lajwerdê) zer],
53. [zêran] û tevî çavkaniya jê derdikeve,
54. [li koleyên] heya mirinê, tawleyên
55. [hespan], li zad û dexlê kurên xizmetkarê?
56. Kuran [diyarî min] bike
57. diyariyekî bide bin ta ku bila nifşê min hebe”
58. [Boxe], (ango) bavê wî [bersiveke]
59. (bi) nazik (dide) di nav giriyên Kurdo re,
60. dema ku suxrevanê xoşewîst ê El
61. digiriya, (El gotê): “Here xwe bişo û sorbike⁶⁹,
62. des[tên] xwe [heya ber enîşkê] bi[şo],
63. ji tiliyan heya li sermil⁷⁰
64. (û) bikeve [bin siya reşmalê]⁷¹,

⁶⁷ Boxe ji xweda El re dibêjin. Herwusa Bavê mirovahiyê jî El'e. Di horiyan de Teşşub, xwedayê bagerê boxe ye.

⁶⁸ diyare di rêzikên nuhîbuyî de Xweda El behsadayina zîv û zêran dike, lê belê Kurdo wana qebûl nake.

⁶⁹ Hingê, ji ber bedew yan jî bi tesîr xuyabike padişahan ruyê xwe boyax dikirin. Rûdîna lêkirî bi ruyên xwe ve girêdidan. Paşê ji ber şahiyên bi tenê hineyê destê xwe dikin.

⁷⁰ Horiyan, dema ayînan de xwe pîr û paqîş dikirin. Ev edet ji wan derbasi nav hîtît û samiyên jî buye. Diyare şeweyê destmêja musulmanan jî ji wir hatiye.

65. mihekî bi [destê xwe bigre],
66. berxeke bora[qê bila di] destê teyê rastê de,
67. gisikek di herdu [destên te de be],
68. hemû genimê ku ji ber nanê [te] maye;
69. hûr û puzûrên hinek balin[de]yan⁷² jî hilde,
70. boraqê bibe, mêyê valake [li piyaneke
71. ji zîv, hingiv jî bila di hundirê seheneke zê]r de be.
72. Hilkişe li bilindahiya [bir]cê,
73. li ser qentera diwêr runê; destên xwe bilindke
74. bervî ezmên (û) pêşkêşî bavê xwe
75. Boxe ango El bike; gazî Baal bike
76. bi boraqa xwe ve; bo kurê Dagan⁷³
77. bi (pêşkêşiyên te yên) neçîrê ve bila dakeve jêr
78. Kurdo! Ji sewkiyê dakeve û amadeke
79. wan xurekên ji embaran
80. û çewdarê ji kulînê.
81. Nîn bipêje ji bo pênc,
82. erzaq amadeke jî bona şeş mehan;
83. îjar bila piraniya artêşê tev bigere
84. mal bi xwarinê bêne dagirtinê.
85. Ê piranî bila bihevre derkevin.
86. Leşkerên te (dê bibe) hêzekî pir mezin
87. sêsid carî bi deh hezaran:
88. Ê piyade jî bê jimar
89. ewên bimeşin bi hezaran mina çilkên baranê,⁷⁴
90. û bi dehhezaran, notila barana payîzê.⁷⁵

⁷¹ Ji ber ku hori her çiqasî di asta şahan de bin jî, ajalvanî karên wan yên sereke bû. Ber vê egerê li çêregeha reşmal ango kon hebûn. Ev jî eşkere dike ku ev şah Kurdo niv-koçer e.

⁷² Horiyan, balinde jî nêta boraqê serjê dikirin û pir caran jî ew dişewitandin.

⁷³ Baal, kurê Dagan'e. Samiyan Baal beramberî Teşşub, Dagan jî beramberê Kummarbî bi kar anîne.

⁷⁴ Dixwaze bêje bi şêweyekî himbizî.

91. Biçin du heb du heb di meşa xwe de
92. sê heb sê heb dê biçin di gavên wan de.
93. Ewê tik tenê dê derê mala xwe kilît bikin⁷⁶
94. helbet, jinebî dê bibin kirêdarên wan,
95. nexwaşê di ciyê xwe de bimînin
96. kor bi despelkê rêya xwe bigerin
97. heta kesên nû zewicî jî dê biçin
98. û jina xwe vegeşîne ji yekî dinê⁷⁷
99. bibe biyaniyê evîndara xwe.

*(Ev artêşa yê bimeşe û piştî heft rojan bighêje li
Ûdûm'ê.)*

Ustûna III.

1. Notila kuliyan, heyanî ber tenhayê
2. bimeşe, roja yekê, dudê, sisê û ya çarê,
3. a pence û roja şeşê li avêtina tavê re⁷⁸
4. li roja hefta tuyê bighêjî li ber deryayê
5. Udum, Udum'a ku her derê wê tijî av e.⁷⁹
6. Hingê dorû beran dagirke, dora
7. gundan bipêçe; biqewitîne ji meydanan
8. jinên ku pûş û ezinga berhevdikin
9. Biqewitîne ji zeviyan û ser bîrên avê
10. jinên ku avê jê derdixine; dîsa ji ser kaniyan
11. jinên ku (cêran) tije av dikin. Aram be
12. rojekê, ya dudyan, ya sisiyan, ya çaran, ya pêncan
13. û roja şeşan jî tîrên xwe nepekînin
14. bervî bajêr, heta kevirên piçûk jî (nevêjî).
15. Roja hefta, şah Pabîl, bi hilatina rojê re,
16. dê nukaribe razê ji ber hengame û boriniya

⁷⁵ Barana payîzê gurtir û himbiztir e. Ji ber ku çilkên baranê hûrtir in.

⁷⁶ Ji ber ku teneyê ne jin ne jî zarokên wî hene.

⁷⁷ Dixwaze bêje ku hertim, jina wî de bîra wî de be.

⁷⁸ Ango li berbangê yan jî dema ku roj hil tê.

⁷⁹ Udum, payîtextê şah Pabîl'e û Kurdo dijî wî derdikeve seferê.

- boxeyên xwe yên kotanê,
17. ji ber şemateya zirîniya kerên xwe,
 18. ji ber orîniya gayên kotanê, reyîna
 19. seyên birçî; hînge ewê peyivdaran
 20. bişîne li cem te, ango li ba Kurdo, (dê bêjin):
 21. peyxama şah Pabîl (ev e):
 22. “aha bi tera zîv û (lajwerdê) zer; zêr, tevî çavkaniya jê dertê
 23. her çiqasî dixwazî koleyên heya mirinê
 24. sê hespan û erebeyekî
 25. ji qata kurê berdestê
 26. keremke bigre Kurdo (mebesta) diyariyên hevhatinê.
 27. Hêy şaho! Ji tewrekî aştiyane, vekîşe,
 28. ji mala min; dûr bisekine Kurdo
 29. ji hewşa min. Êriş neke
 30. li Êdîma mezin, Êdûm’ a baş avdayî,
 31. Êdûm diyariyeke El’e, xelateke
 32. ji bavê mirovahiyê.”
 33. Hîngê tu qasidan vegeerîne, (bêje wana):
 34. “Pêvistiya min nine zîv û (lajwerdê) zer,
 35. zêr tevî çavkaniya jê derdixin û koleyên heya mirinê
 36. (hefsar û rextan) yê sê hesp û erebeyan
 37. ji qata kurê berdestê?⁸⁰
 38. Tiştê ku li mala min nine, wê bide min:
 39. Ka bide min Hûriya duşîze,
 40. delaliya malê, zadegana te ya despêkê,
 41. ewa ku kişînoka xwe weke dilnîwaza Anat’ê⁸¹,
 42. ewa ku bedewbûna xwe weke ya Athtartê⁸²,
 43. ewa ku guliyên xwe ji kevirên laciwêrd, biruyên wê
 44. notila hinek fîncanên ji heqîq û yaqûdê.

⁸⁰ Dibe ku ev pêvya berdestê, ji bo keşejinê tê bikar anînê.

⁸¹ Xwedawenda Anat’ê, xwîşka (carnan jî jina) Baal. Dijî xwedayê Mot şerdike û Baal ji mirinê vedigerîne.

⁸² Xwedawenda Astarte, jina El.

45. Ezê westa xwe ji niqandina çavên wê hildim,
46. ji ber ku di xewna min de (ew) diyarî mikir, El, bavê
47. mirovahiyê, di xuyangê de bervî min kir
48. ewê bîne dune, nifşên Kurdo
49. û kurekî bo xulamîya El”.
50. Kurdo hişyar dibe, mixabin hemû jî berhemê xewna
51. xulamê El in; bi tenê xiyal e.
52. Ew xwe dişo û sor dike,
53. dest û milên xwe dişo
54. û tiliyan xwe, heya ser milan.
55. Ew dikeve bin siya reşmalê, u digre
56. berxa qurban û bi destên xweyê rastê,
57. gîsikekî ciwan bi herdu destan
58. û çend pîvan ji nanê herî baş
59. û varikek ji girt, mabesta bor[aqa] balinde.

Stûna IV.

1. Ew (meyê) valadike li badeyek zîvîn
2. Hingiv di hundirê amanek zêrîn de û hildikişo
3. jorê li ser bircê, û siwarê
4. li ser qentera diwar dibe. Li wêre bilind dike
5. destên xwe bervî ezmên, li jorê û qurbanê dide
6. Bavê xwe Boxeyê El (û) gazî jêr dike⁸³
7. [Baal] kurê Dagan
8. [gelek xurek pêşkeş] kir.
9. (paşê) Kurdo ji [ba]nî hate xwarê
10. û xwurekan li embarê amade dike
11. gênim derdixe ji kulînê⁸⁴
12. nan da petinê ji bo pênc (mehan)
13. erzaq ji bo şeş me[han]
14. leşkerekî pir jimar, [arteşek] bi rastî,

⁸³ Ango, niyazan dike û berdigere.

⁸⁴ Ev, rêzik divê jorê buya. Ji ber ku divê piştî genin ji kulînê bîne paşê nan çê bike.

15. kombû û meşiyân bi hev re.
16. Leşkerê wî hezekî mezin,
17. hewqasî sêsid carî deh hezaran
18. dimeşin bi hezar hezar mina çilkên baranê
19. [dimeşin bi] deh hezaran mina çilkên barana payîzê,
20. dimeşin dudo dudo bi meşa xwe,
21. dimeşin sisê sisê bi gavên xwe.
22. Her çi kesê bi tenê deryê xwe kilîl dike,
23. tabî jinebî dê kirêbike
24. nexwaşê di nav cihê xwe de be
25. korê rêya bigere bi destepêlkî
26. heta zavayên taze jî diherin,
27. jina xwe dispêrînin yekî dine,
28. dibin biyaniyek digel evîndara xwe.
29. Ewê notila kuliyan vegirin li her hêlên deverê
30. mina sîsirkan li heya ber devera tenha.
31. Dimeşin dûr û dirêj
32. rojek û dudu, berya dema hilatina [ro]jê
33. di (roja) [sis]emîn de
34. ew dighêjin hewirgeha îbadetê
35. ya A[thîratê] ji Tîr'ê û ya Elat'a⁸⁵
36. ji Sî[don'ê]. Li wê derê
37. Ku[rdo'yê] dilovan niyaz kir (û got):
38. “Êy, xwadiya Athîrat'a ji Tîr'ê û tu Elat'a ji Sîdon'ê
39. eger ez Huriya'yê bibim
40. mala xwe û wê bixim
41. li hewşa me, bi giraniya wê didim
42. bi zîv û sê carên jî zêr.
43. Ew meşiya rojek û dudya,
44. roja sisemîn û roja çaremîn.
45. Paşê, li hilandina rojê re, di pêncemîn (rojê) de
46. ew gihîşte Ûdûm'a mezin,

⁸⁵ Elat, navekî dinê yê xwedawenda Athîrat'ê ye. Li bajarê Tîr'ê jêre digotin Athîrat, Lê li Sîdonê navê wê Elat'bû.

47. bajar-şahiya Ūdûm'ê ya têra xwe [avdayî]
48. ew dadigire hawîrdoran
49. û dorpêç dike gundan
50. diqewitîne jinên li çolê êzingan berhevdikin
51. û yên wan doran li pey qirş û qalan digerin.

Stûna V.:

1. Ew diqewitîne jinên avê ji bîrê dikişînin
2. û ji li ser kaniya ku (cêrên xwe) jê tije dikin.
3. Ew bêdeng dimîne rojekî û duduyan,
4. sisyan û ya çaran,
5. a pêncan û herwusa roja şeşan.
6. Lê danê rojhilanê, li roja heftan,
7. Pabîl şah nukare razê
8. ji ber boriniya boxeyên xwe,
9. ji ber derdê zirîniya kerên [xwe],
10. [ji ber] orîniya gayên kotanê
11. [sedema] kewte kewta (dirinde)
12. kûçikên (fena). Ji ber van egeran
13. Pab[i]l şah dengêkî bilind gazî jina xwe dike:
14. “Guhdarke, kerema xwe jinê [.....] ... [.....]
15. [.....] hevsera min
16. [.....] pêyxamê
17. [.....]..
18. [.....].
19. [.....] bila amade bike
20. [.....] li detên wî
21. [.....] belê, ez destûrê didimê”.
22. Bi dengêkî bilind ew gazî [.....]
23. [.....]..... kerek
24. [.....]
25. [.....]
26. [.....]
27. [.....bo]raq

28. ..[.....]
29. [.....]
30. [Wê]çaxê herin li war[gehê li ba Kurdo]
31. û [ji Kurdo re bê]jin, xweşbîno!
32. [(Keremke) waye] pêyxama [Pabîl şah:]
33. “Bigire [zîv û (lajwerdê z]er
34. zêr û tevî kaniya jê dertê
35. û koleyên [heya mirinê]
36. [sê] hespê tevî zîn û rextan û erebeyan
37. [ji tewla kurê berdestkê]
38. [keremke bigire Kurdo, (weke) mebesta hevhatinê]
39. [bi aşîtî vegere dagir neke]
40. [Ûdûma mezin, Ûdûma bi av û baş şilak],
41. [ku ûdûm diyariyeke ji El’e]
42. [xelatek ji bavê mirovahiyê ye],
43. [dûr bikeve, hêy şaho, ji mala min],
44. [here] dûrkeve [Kurdo], ji xaniyê min”.

Stûna VI.:

(Çar rêzikên ji vê ustûnê peritîne)

QASID PEŞNIYARÊN AŞTIYÊ JI KURDO RE DIBÎN

1. Qasid êdî nasekinin, bayê bezê
2. [qes]ta [çûna ba Kurdoyê] dilovan dikin
3. ew dengê [bili]nd bi zar û ziman bûn:
4. “Pêy[xama Pabîl şah ev e]:
5. Tuyê hildî [zîv û (lajwerdê⁸⁶) zer],
6. zêr bi tevê kaniya jê dertê
7. û koleyên [heya mirinê],
8. hesp û erebe
9. ji [ji tawleya kurê berdestke].
10. Kerem ke hil[de Kurd]o [mabesta

⁸⁶ Lajwerd sînonîma metal e. Ango, mîsê zer e.

diyariyeke hevhatinê].

11. [here] bi xêr û sil[ametî]; [eriş]neke li ser
12. Êdû[m'a] mezin ya avî û şilak,
13. Êdûm, ji ber ku (ev) Êdûm diyariya
14. El'e, diyariyeke ji bavê [mirova]hiyê ye.
15. Dûr bikişe, hêy şaho, ji mala min
16. der[keve] (here) Kurdo ji hêwirge[ha] [me]".
17. Ê [Kur]do'yê dilovan bersi[vê] dide:
18. "çi pediviya min dê hebe bi zîv
19. û (lajwerdê) ze[r],
20. bi zêr û kaniya jê derdixin û
21. bi koleyên heya mirinê, bi zîn û zengî sê hespan
22. û erebeyên ji tawleya
23. kurê berdestkê? Tuyê bidî min
24. ewa ku [nîne] di mala min de: Bide
25. min duşîza Huriya'yê
26. delaliya we, zadegana te ya destpêkê
27. ewa ku dilkêşiya wê weke dilkkêşiya
28. Anatê, bedewbûna wê jî ya Athartê
29. bîbikên çavên wê mîna cewherê yaqûd
30. pêluyên çavên wê mîna fîncanên ji eqîqê;
31. ji ber ku El, di xewna min de, wî, (ango) bavê
32. mirovahiyê, di xuyanga min de, diyarî min kir
33. da ku ew bîne dunê nifşê Kurdo
34. û kurekî suxrevanê El".

III K

Stûna I.:

.....

DEMA PESÎNDAYÎNA HORÎYA'YÊ !

(li vê derê valabûneke dirêj heye.)

1. [Her çi kesên bir]çîbin ewê destê wan bigire;
2. her çi kesên têhnî bin ewê destê wan bigre;
3. ewên [.....]

4. li Kurdo, li wê rastê.
5. Çawa çêlek li pey golikên xwe dikin borînî
6. û çawa zarokên serbazan diqîrine dayîkê xwe
7. Herwusa Ûdûm'ê jî kufe kuf be li pey wê.
(*Ji vir û pêve 20 rêzik kê min*)

Stûna II.:

XWEDA BI ZEWACA KURDO QAYÎL DIBIN Û MIZGÎNIYA HEYŞT KURAN DÎDÎN

1. Boxeyê [.....]
2. [.....] Baal'ê pir hêz,
3. [.....] Yarîx, şahzade,
4. [..... Kotx]ar-Xesîs
5. [.....] şahzade Rahmo (û) Reşev,
6. [civî]na xwedayan, ya bi sisêyan
7. [li pey] vê, Kurdo'yê xwaşbîn rûdinê
8. ..[...]. [..] li mala xwe. Ew dikeve hundir
9. datîne li [.....]
10. [ji pey re] Baal'ê herî xu[rt] hate
11. civîna xwedayan û wî got:
12. “[anaha], here, êy diltenik,
13. [xwedayê] mezin ê dilbîn, ewrariya [Kur]do'yê
14. xwaşbîn, dilovaniya suxrevanê El bike”.
15. Xwuda [El] (hinge) girtibû
16. piyaleyek di destê (xwe) de, badeyek
17. di [destê (wî) rastê de] û pîroz dike
18. [bi şah], xwedayê herî mezin El didomîne
19. b Kurdo'yê [xwaşbîn]: rehma xwe lê anî
20. suxrevanê [xoşewîst] yê El, (digot):
21. “dive tu hevs[erekî] bînî, êy Kurdo, dive tu
22. Jinekî mala xwe, duşîzeyekî bînî
23. li hêwirgeha xwe. Evê heft zarokan bîne dine
24. heta dê heyîşt zarokan bîne dunê.
25. Ewê bîne dunê leheng Yasîb,

26. yê ku dê daqurtîne şire A[d]îrat'ê
27. û dê bimije ji bistanên Anat'a ciwan
28. biadane [.....]
(ji vir û pêve panzdeh rêzik kêmin)

Stûna III.:

PIŞTÎ XILASIYA HOMANDINÊ PÊŞBÎNIYA ŞEŞ KEÇAN JÎ VEDIBÊJÎN

1. “ [Tu zaf payebilind bî], êy Kurdo,
2. [ji nav] bajar-dewletên li ruyê erdê”
3. [di civîna] ku serdest tên digelhev
4. [û ew (Huriya)] wê ducana
5. dotan be ji.
6. Ewê ji bo te dotekî bîne dunê (nave wê) T[.....]t
7. ewê ji bo te dote[kî bîne dunê (nave wê)]
8. ewê ji bo te dote[kî bîne dunê (nave wê)]
9. ewê ji bo te dote[kî bîne dunê (nave wê)]
10. ewê ji bo te dote[kî bîne dunê (nave wê)]
11. ewê ji bo te dotekî bîne dunê (nave wê) [Dîmanat] be.
12. Tu bi nav û deng bî êy [Kurdo]
13. ji nav mezinên ciha[nê]de,
14. (dema) di komcivîna serokan de
15. ya herî ciwan ji nav wana de, yê bibe ya herî pîr.”
16. Tovê wî (diçe) wargeha xwe
17. ew ducanî dibe û (Horiya) kurekî ji bo wî tine li dunê,
18. Ew ducanî dibe û ji bo wî kurekî (keçekî) tine li dunê.
19. Lê (li dawiya) heft salan
20. (hejmara) Kurên Kurdo hewqasî li qewldanê bûn,
21. û keçên Horiyayê jî, her wusa bûn,
22. hemû ev e. Ê kete bîrya Atrat'ê
23. soz û qewlên wî yên ku dabû wê û Elat'ê.
24. Ew dengê xwe bilind dike û bang dike:
25. “lê dinyêrî, ka [Kur]do soza xwe nayêne cîh?
26. Ê ezê jî belêna [xwe şunva bikeşînim.

.....
(Heft rêzik peritî ne)

Stûna IV.

.....
(pênc rêzik peritîne)

KURDO HEVSERA XWE RE DÏBEJE BÎLA ZÏYAFETEKÎ AMADE BÎKE Û “BOXE” Û “MAMÏZAN” JÎ DAWET BÎKE!

1. Bi dengekî bilind [wî gazî jina xwe kir:]
2. “Guhdarke [wey xanima Horiya],
3. şerjê bike, ji nav cangeyên te yên [xurt], yên zêde
xwedîkirî,
4. devê [cê]rê meyê veke,
5. bangê heftê boxeyên⁸⁷ (parêzgerên) min
6. û her heyîşsed xezalên (nivîsvanên) min
7. parezgerên bajar-dewleta Xabûr’a [mez]in
8. [.....].. [.....].. [.....]
9. [.....]... [.....].. rûdinê
10.
11.[.....]....
12. Xanima Horiya guhdarî dibe,
13. ew canegê herî kok û xwayîkirî şerjê dike,
14. devê cêrên mêyê vedike,
15. gazî parezgerên wî dike,
16. ew dewet dike katibên wî û giregirên Xabûra mezin,
17. ên Xabûra, baş av û adanbuyî.
18. Ew dikeve mala Kurdo,
19. ji [pêlikên] hêwirgeha wan
20. û ew bervî [.....], ew diçin.
21. destê wê li ser piyalê dirêje û

⁸⁷ Di nivisarê de behsa boxe û xezalan tê kirinê. Lê belê ev bi wateya cînasî hatiye gotinê.

22. kêra goştî ew datîne.
23. .Û xanima Horiya axaft:
24. [ji bo bixwin] û vexin min gazî wekir,
25. Kurdo efendiyê we [.....]”
(*ji vê pê de 15 rêzik peritîne*)

Stûna V.

9.7. HORÛYA ZÛYAFETEKÛ AMADE DÛKE

(*Li vê derê du rêzik kêmin*)

1. [ew canegê herî ko]k û [xwayîkirî şerjê dike],
2. [devê cêrê]n [meyê vedike],
3. [gazî] [parezgerên wî dike,
4. [.....].. [.....]
5. [.....]... [.....]..
6. Bervî hêwirgeha [....] .. [... ew pêşta diçin].
7. destê wê li ser piyalê dirêje û
8. [kêra goşt]tî ew datîne.
9. [û] Xanima Horiya dibêje:
10. “Ji bo bixwin û vexwin min gazî wekiriye.
11.
12. [bi (hale)] Kurdo bigirîn,
13. [bi şîn û xemgîniyê re] weke borîniya boxeyan
14. (hûn) [mina li ser] mêytekî bigirîn,
15. [.....] ûin [....] li dilê xwe
16. [.....] mirî tili[yê]n....
17. [....] yên El.
18. Bi çûna royê avara, Kurdo
19. bi rastî wê here; (dema ku) roj tarî be
20. efendiyê me (wê bemire) û [Ya]sîb wê bi hukumdarê
me yê hemû deveran,
21. ji pey [Kurd]o’yê nazik re.
22. mirovekî ciwan dê bibe hukumdarê me,
23. jinên me li ser [.....]..
24. [Yasib] wê derxe parezgerên Xabûra mezin,
25. yên Xabûra tijî av û adanî

26. ew Xwedayê dilfireh [.....]
27. bi daxwaziya baş [.....]
28. [wîna] [.....] tijekir
29.

(*Dor û berên hîjdeh rêzikan peritî ne*)

Stûna VI.

HORIYA MÊVANAN VEDIXWÎNE ZIYAFETEKE NÛ

1. “Guhdar bikin, gelî [....].....[...] ..
2. ji carekî dîsa [bux]in û vexwin min hûn vexwandine
3. [Kur]do efendiyê we, boraq[ekî] pêşkêş dike”
4. ji ber Kurdo ew [digirîn?]
5. Şîn û hawara wana mina boriniya [boxe]yan e.
6. Di xuyangekî de [.....] [Kurdo] [.....]

II K

JI DEVÊ KESEKÎ NAYÊ NASÎNÊ RE PEYVA CÎNAZE DER TÊ.

Stûna I.

1. Di derbareyê Kurdo’de:
2. “weke [sey]ên berderê mala te, wusa em dûr dikevin,
3. weke hinek qerewilên berderê te ne.
4. Lê (tu) bavo, ma tu jî dimirî mîna mirovin dinê?
5. Ma wê li berderê te jî bigrîn ji ber wendahiyên?
6. Ma dê jinên lawjeyan bejin, lo bavo, xem û kedera min?
7. Ê wê bo te bigirî, bavo çiyayê Baal,
8. Sapon⁸⁸, keleha⁸⁹ pîroz,
9. (ew) kela herî xurt ma wê binale?”
10. Lê [Kur]do kurê El, dola dilovan û pîroz e.⁹⁰

⁸⁸ Mala xwedayên Kenaniyan.

⁸⁹ Kela, bi wateya bajar-dewlet hatiye bikaranînê

⁹⁰ Herwaha, dixwaze bêje dolê “*dola xweda el’e.*”

11. Ew çû ba bavê xwe, bi girî û şîvan
12. û diranên xwe sîqand; dest bi axaftinê kir
13. û bî şîn û girî (gotê): “Em kefxwaşin bo jîna te, wey bavo,
14. ji ber bêmiriniya te, em serbilind bûn!⁹¹
15. Weke hinek kûçikan, em li mala te wendayîbûn⁹²
16. Em weke seyên parasvan li ber derê tene!
17. Ma rastî tu jî dimirî bavo, weke (mirovên dinê) ?
18. Ma derî dê bê vekirinê⁹³ ji bo kesên bi feryad û fîgan digirîn re?
19. Ma jin wê bistirên⁹⁴, êş û kedera min lo bavo?
20. Çawa dê bê navkirin ‘Kurdo’yê kurê El’
21. nifşê dilovan û yê pîroz?
22. Gelo xwadê jî diêşin û dimirin?
23. Dolê dilovaniyê, gelo yê bimire?”
24. Kurdoyê nazik bersivê dide:
25. “kurê min megirî, feryad û fîganan meke
26. ji bo min. Nemiçiqîne kurê min
27. kaniya çavên te û ya serê te
28. ji ber rondikan. Gazî xwîşka xwe Dîmanat’ê bike,
29. keça min ya ku hezkariya wê
30. xurt e. . Ewê ji bo min bike girî û binale.
31. [Xortê] hêja, bi xwîşka xwe re rastiyê bêje,
32. Bêje bila ew bo min bigirî, ji ber ku ez dizanim
33. xwîşka te (miroveke) berkeftiye.
34. Ewê dê avê berde li ser deştan⁹⁵
35. tiştta ku derkeve ji qirika wê jî bighêje ser girikan⁹⁶

⁹¹ Hizra mirovên wê demê Kurdo kurê xwedê ye û herwaha ew jî weke xwedayan bê mirine.

⁹² Ango kesekî ji bilî Kurdo, şênîyê malbatê tişttek nedihesibandin.

⁹³ Ango, ji bo mirov bêne li ser termê wîna.

⁹⁴ “dê kilamên şînê bêjin”

⁹⁵ “bi hêsrên çevan”

⁹⁶ Diyare dibê je qîrîn û hawara wê.

36. [Hêviya] li tarîkbûna Xanima⁹⁷
37. Şapaş⁹⁸ û vexistina çirayan (û)
38. tomariya (stêrkan) be û hingê bi xwîşka xwe
39. Dîmanat'ê re bêje (ku): 'Kurdo'yê bavê me,
amadekariya
40. boraqekî dike (û) şah me vedixwîne
41. li ziyafetê. Borîjenan bigre
42. û çembala xwe jî aliyê teyê rastê.
43. (paşê) here li pêş qerwaşan raweste
44. bavê te dê [diyarîya] te jî dayne⁹⁹.
45. Bi niyazan ve û ewê wana qayîl be.¹⁰⁰
46. Hingê Îlhû, xortê hîlbijartî,
47. [lî]ta xwe hilde destê xwe
48. û [rim]ê jî di destê rastê de
49. [û] wê nêzikî (be)¹⁰¹
50. [heya] ew tê, dibe êvar.¹⁰²
51. [xwîş]ka wî, ji bo avê bikişîne derket.
52. Wê hingê ew datîne li ser loda riman.
53. (Ew) hingê birayê xwe dibîne û
54. bi [gurçikên] birîndar dikeve li ser erdê,
55. [li ser] birayên xwe digirî (dibêje):
56. “[Ma gelo nex]waşe, şah?
57. [ji ber nexwaşiyekê dinale] Kurdo, bavê te?”
58. [û] îlo, xortê tewrî jîr, [bersivê dide]:
59. “[bibîze] şah nexwaş [nîne],
60. [çi êşên] [Kurdo'yê] bavê tê tune ne,
61. [Kur]do boraqekî pêşkêş dike,
62. şah me te vedixwîne ziyafetê.

⁹⁷ Dema roj diçe ava

⁹⁸ Xwedawenda rojê

⁹⁹ Tiştên ji bo ayîna dema boraq dayîne

¹⁰⁰ Ango dê dua bike, û xwedayê jî bipejirîne.

¹⁰¹ Dibe ku behsa devera boraqdayînan e. Ango parastgeh e.

¹⁰² Di nivisarê de wek şevê hatiye wergerandinê. Lê dibe ku êvar rastir be.

Sûna II.

1. ... [.....]
2. ...[.....]
3.[.....]
4. Û [.....]
5. Pûxa[t¹⁰³
6. [.....] te re
7. jinekê [.....]
8. Birayê te [.....]
9. tu [.....]
10. ewê biqîre: [.....]
11. [.....] bide bila vexwe
12. Tu [.....]
13. û bi avê tevde
14. ew nêzikî birayê xwe dibe [û dipirse]:
15. “Ji bo çi min di nav agiran de dihêli, [bira]?”
16. Çend mehin ew [nexwaş] e?
17. Ji kingê ve [Kurd]o di nav ciyan de ye?
18. Û [îlo]’yê¹⁰⁴ xort bersiv dayê:
19. “Ji sê mehan vir de nexwaş[e],
20. Çarbû (çi) Kurd[o] pê hesya.
21. Ya rastî, Kurdo vedimire!
22. Tuyê tirba wî dorpêçkî, tu yê nişan bikî [ci]hê wê:
23. Dema dorpêçê dibê çend heb bircan jî daynî ser¹⁰⁵
24. weke gencineyeki, weke deriyekî, [.....]
25. weke kumbetekî [.....]
26. [.....] ji ber ku min [.....]
27. lê jinên ku [.....] cîbecî dikin
28. her çi hesên tên [.....]
29. tînin [.....] û vala dikin

¹⁰³ Keçeke ciwan e.

¹⁰⁴ Li nivisarê deev nava *îlhû* hatiye nivisandinê. Min ew angoreyî kurdî, wek îlo nivisand.

¹⁰⁵ Tirba bîrdariyê ye.

30. [.....] heft [.....”]
31. [.....] Îlo bersivê didê:
32. Digiriya û qirçe qirça diranan bû, bi îskîni
33. dengeki bilind, (dibêje): “Em li jiya[na te] qayîlin
[b]avo
34. û bi bêmiriniya te em xwaşhalbûn;
35. weke hinek kûçikan, em li mala te wendayîbûn
36. em weke seyên parasvan li ber derê tene!
37. Ma tuyê bimirî bavo, weke mirovan?
38. Ma derî dê bê vekirinê ji bo kesên bi şîn î şîvan re?
39. Ma jin wê bistirên, êş û kedera min lo bavo?
40. Ma xadê jî dimirin?
41. Ma nifşên [dil]ovan ne cawîdanin?
42. Wê bo te b[igirî] bavo, çiyayê Baal,
43. Sa[pon], kelaha herî pîroz.
44. Kela[ha] herî xurt wê binale, kelaha herî me[zin].
45. Qaşo Kurdo ku[rê El’e],
46. dolê Lutpan¹⁰⁶ û [kadeš]”
47. Bi girî ew diçe [ba bavê xwe],
48. ew dikeve od[a Kurdo],
49. bi du [.....]
50. cihekî [.....]rûdinê
51. bi giriyanê [.....]
52. çiya ...[.....]
53. Herdu destan [.....]
54. feryad û figan dikir [.....]
55. [.....][.....]
- (valabûn heye)

¹⁰⁶ Navekî xweda El e.

Stûn III:

(30 rêzik peritîne).

HIŞKESALÎ RASELITIYE Û COTKAR DERDÊ BARANÊ DE NE

1. Ew zêytê valadi[ke]
2. An[at] erdê û ezmên derketiye geşt û gerê,
3. dighêje heya seriyê dine erdê , heya ber kêleka avan.
4. Ji bo xakê, bar[an] kaniyek ji kaniyên Baal'e;
5. herwusa, ji bo beyaran dibarîne yê Herî bilind;
6. Ji bo genim nîmet e. Bi şûvê re
7. adan û berekete barana Baal
8. û bona deştê dibarîne qencê qencan.
9. Şahî û dîlane bona genim xaka avdayî mîna
10. genimê kose yê di zeviyan de.
11. Ji ser neprûçkê û gidîşan
12. bilind dibe sere karkeran,
13. çav li jorêne, ewên gênim diçinin;
14. qediyaye nanê wan ê (li) teştê,
15. miçiqîbû mêya wan a li hebanokê
16. tewabuye rûne şe le yê wan ê di kûz[ê de].
17. Ew [diçin ?] li mala Kurdo
(ji vir û pê ve 18 rêzik peritî ne)

Stûna IV.¹⁰⁷

KESEKÎ NENAS, ANEGOREYÎ FERMANÊ BANG LI QASIDÊN XWEDAYAN DİKE

1. [.....] El
2. "Guhdarke

¹⁰⁷ Weke stûna III. di vê derê de jî valahiyek mezin he ye. Ji ber vê egerê derfeta ku mirov w3e biwxîne nîne. Lê belê bi şeweyekî guman mirov dikare bêje ku xweda El dixwaze hişkesaliyê çareser bike, ji ber vê egerê bi rêya berdevk û qasidan, bang li xwedayan dike.

3. Tu her jîrî mîna (xwedayê) El, mîna Boxeyê herî dilovan,
 4. Gazî berdevkê, Îlş bike;
 5. Îl[şê] karmendê mala Baal,
 6. û jina wîna ya ku gazîkera [xweda]wendaye,
 7. Ew bang li Îlşê berdevkê El (?) dike,
 8. Îlş, karmendê mala Baal
 9. û jina wîna ya ku gazîkera xwedawenda ye.
 10. (Ewê) dilovan, xwedayê dilgeş bersivê dide:
 11. “Binyêre Îlş, berdevkê El,
 12. karmendê mala Baal
 13. Û jina te, ya ku gazîkera xwedaw[enda ye].
 14. Hilkişin li ser serbanê avahîyê
 15. li keleyê banokê¹⁰⁸
 16. Sê [.....].
 17. [.....] heta[.....]
- (ji vir û pêve 27 rêzik peritîne)*

Stûna V.

1. (*peritiye*)
2. (*peritiye*)
3. (*peritiye*)
4. (*peritiye*)
5. (*peritiye*)
6. Û (ewê) dilovan [xwadayê dilgeş dest bi axaftinê kir:]
7. “[Kîjan] xwadê, [dikare naxwaşiya] Kurdo derman bike,
8. [neqenciyê] ji nava wî vekişîne?” [xwedayan]
9. bersiv nedan. Ducarî, sêcarî] gote wana
10. pirsiyara wî: “Kîjan xweda dê dermanke
11. vê nexwaşiya wî, [neqenciyê] jê vekişîne?”

¹⁰⁸ Dibe ku, behsa deverke dinê li vê derê tête kirinê. Biguman dibe ku pêyva bircê ye.

12. Qet xwedayekî jî ber[siva] wîna neda.
13. [cara çara], ya pênc a li ser hev pirskir: ["kî ji we nav xwedayan]
14. Êşa (wî) dermanke (û) [neqenciyê] jê bikişîne?"
15. Hiç xwedayekî bersiva wî nedanê. Cara şeşan a heftan
16. pirsaxwe dubarekir: "[ji we] xwedayan kiyê
17. Êşa wî dermanke û neqenciyê jê vekişîne?"
18. Qet xwedayekî jî bersiv neda.
19. Û Lutpan¹⁰⁹, xwedayê dilgeş got:
20. "Herin kurên min, (hûn) di axurên xwe de bisekinin¹¹⁰
21. Li ser textên (xwe) yê zadeganiyê danîşin, û ezê
22. pêkbînim, bê şik ezê
23. (tiştêkî) wusa çêkim bila [eşeka]a wî dermanbe û
24. neqenciyê vekişînim." El, mistek xwalî hilda,
25. tevî toza ardî [li destê rastê]
26. histirand tiştên heyî di [...].
27. Ejderhayek(?)[.....]
28. [.....] ejderhayek (?)
29. (*peritiye*)
30. (*peritiye*)
31. (*peritiye*)
32. (*peritiye*)
33. Piyalekî [hildide destê xwe yê rastê]
34. ba[deyek di destê rastê de]:
35. (*peritiye*)
36. (*peritiye*)
37. (*peritiye*)
38. (*peritiye*)
39. Tu, Saa[tagat¹¹¹]
40. [..... Ku]-
41. rdo. ... [.....]

¹⁰⁹ Navekî sînonîm yê El e.

¹¹⁰ Drîver, weke "herin li ser textên xwe" wergerandiye.

¹¹¹ Afînêreke ji hêla El hatiye afirandin û fermanberê wîna ye.

42. [.....]
43. Di devê Saata[gad de]
44. xwedayê El [.....]
45. j ser kelahan re [difire]
46. nexwa[şiya]
47. neqenci[ya]
48.[.....]
49.[.....]

(Ji vir û pêva 8 rêzik peritîne)

Stûna VI.

1. (Tu êy) [mir]in! binkeve; (tu êy) Saatagat
2. Serkeve!”. Ê Saatagat diçe;
3. ew yekser dikeve mala Kurdo;
4. digirî bi avêtina gavan re;
5. demek kete hundir xemgînû;
6. ew li ser sed heb kelha re firiya;
7. firiya çû li ser gund û bajaran re
8. bi gopalekî , [derxist]
9. neqencî ji sere wî;
10. ew zivirand û xwêdana wî şûşt
11. gewriya wî vekir ji bo xurekê.
12. Bi rastî mirin hatibî tunekirinê, Saatagat jî
13. serkeftibû.
14. Kurdo'yê camêr, ferman da
15. got: “Guhdarke xanima Horiya,
16. tavalê berxekî serjêke¹¹²
17. dixwazim bixwim, dewarekî jî dixwazim bila kok
be¹¹³.”
18. Xanima Horiya ew guhdarkir,
19. wê berxek serjê kir û wî ew xwar,

¹¹² Diriver, pêyva emr weke mîhê vergerandiye. Ev pêy di Kurdî de wateya mer 'pez' dide û ji Zimanê Horiyan mîrat maye.

¹¹³ Ango, xurt be.

20. dewarek (serjêkir) û ew êdî têr e. Herwusa
21. carek dudu, Kurdo rabû ser xwe,
22. Ew rûnişt li ser textê paşatiya xwe ,
23. li ser kursiya vesîbûnê ya semyanî.
24. Yasîb¹¹⁴ hînge di qesra xwe de dima
25. û îblîsê di zikê wî de halan didayê, [digot]:
26. “here li ba bavê xwe, Yasib¹¹⁵, here
27. li ba bavê xwe û bibêje, yekser bi
28. Kur[doyê] camêr re bêje: ‘[guhê xwe] veke
29. û guhdar ke:
30. [kingê êrişek çêbe], tu direvî, [berê xwe didî] li [çiyân];
31. tu buyî sedema ketinê ya di bin derbên belayê de
32. tu nukarî beravaniya mafên jinebiyê jî bikî
33. tu nukarî mafê derdnakan bidêyî;
34. nexwaşî buye hogirê te yê nav nivînan,
35. êş û nalînên te hevaltiya hev dîkin.
36. rabe li ser (ji kursiyê) taku ez bibim şah,
37. peya be (ji text) taku ez lê danîşim.’
38. Yasîbê ciwan derkete hafa bavê xwe, daquland
39. û bi devkî dibêje: “kerema xwe guhdarke, lo Kurdo,
40. camêro tu guhdarke, guhê xwe bibe li ser min:
41. Çaxa êrişan tu direvî, diçî xwe dispêrî li çiyân,
42. tu xwe vedişêrî;
43. dema derd hate ser te, te hîşt hêza te bikeve;
44. tu nukarî berevaniya mafên jinebiyê bikî;
45. tu nukarî mafê derdnakan bidêyî,
46. tu naqewitînî her ewên hejaran dirûçînin,
47. tu nanekî nadî sêviyê li pêş çavên te
48. jinebiyê didî pişt xwe;
49. nexwaşî buye hogirê te yê nav nivînan
50. êş û nalînên te hevaltiya hev dîkin.

¹¹⁴ Yasîb, navekî horiyân e û ji pêyva kurdî *ya asîb* ango yê ji Teşşub hatiye. Lê şêveyê bilêvkirina samiyân buye Yasîb. Teşşub xwedayê bagerê ye.

¹¹⁵ Yasib kurê Kurdo’ye û çav berdaye li hukumdariya bavê xwe.

51. Ware dakave ji (text) taku ez desthilatbim,
52. rabe (li ser kursiya) şahtiyê da ku ez lê danîşim”.
53. Kurdo’yê camêr bersivê didê: “Horon¹¹⁶
54. bila bişkêne, kurê min bila Horon bişkêne
55. sere te. Bila Athart (bişkêne)
56. kiloxê te, ji çiyayan re bikevî!
57. Salên te
58. û dê bêjin

Mohr: *Ev destana Îlîmîlku nivisand û diyarî
Niqmandu kir*

هه‌و‌نا‌مه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

¹¹⁶ Navê vî xwedayî bi tenê dema nifiran hatiye nivisandinê. Diyare gelekî tirsnak e. Paşê ev xweda ji hêla yûnaniyan ve hatiye bişavtinê û navê wîna kirine Asklepois. J. Gray, The Cananite God Horon, JNS, 9, 1949, S. 27-34.

هه و النامهه كئيب

ŞIVIRA NANKOR¹¹⁷

Piraniya çîrok û helbestên horiyan ji bo fêrebûn û îbretê ne. Ji ber vê egerê hemû gelên dor û beran hikara perwerde û fêrebûna çîrokên horiyan pejirandine. Herwusa weke çand û kevneşopiyên xwe li wan xwayî derketine.

Çîrokên horiyan hemû jî weke kompozisyon geleki dagirtîne. Ji bilî destpêk, geşedan û encamê beşa çaremîn ya van çîrokan jî heye, ku ew jî ya kemperiya qehremanan û serûwanên wana ne. Ev beşa dawiyê di heman demî de zengilê çîrokeke nû jî lêdixe.

Di şeweyê çîrokbêjiya horiyan de terbiye û perwerdeya wana jî eşkere dibe. Diyare, civaka horiyan bi aliyê rewîşt, weş û lebatê ve pir pêşkevtî ne. Hezkirina ferdên malbatê, têkiliyên di navbera mezin û piçûkan de, hezkirina ax û welêt, xwayî derketina kedê, giringiya çand û hunerê, paqîşiya beden û malê, rêzgirtina ol û ayînan buyerên sereke ne. Ya herî girîng jî çanda pesin û rêzdariya merxasan e.

Di çîrokên horiyan de buyer di navbera mirovan xwe bi xwe, navbera mirov û heywanan, navbera heyber, heywan û mirovan, navbera heyber û mirovan, di navbera mirov û xwedayan de rû didin. Çîroka *Şivira Nankor* jî ji vana yek e.

Mijara “Şivira Nankor“:

“Rojekî ji rojan, demekî ji deman şivirek (nalînek) baniyekî (çiyayekî) diçêre. Çiya nalînê li ser xwe diqewitîne. Ew jî serê xwe hildide û diçe çiyayekî (baniyekî/beyabanekî) dinê. Li wê derê çêriya û kok û qelaw bû. Şivir/nalîn yekcar hers ve hat û nifir da çiyayê lê diçêriya. Go: ‘Agir li vî çiyayî keve, brûskên xwedayên bagerê lêkevin û bila bi êgir bisoje!’ Dema ku çiya/banî van gotinên şivirê dibîze, dilê xwe de

¹¹⁷ Hurr. nail nave ‘şivirê’ye. Lê belê di Kurdiya Nûjen de mirov dikare weke nalîn bi kar bîne. Ji ber ku nalîn di Zimanê Kurdî de cinasanave xezalê ye. Di wêjeya klasîkî ya kurdî de sembola nave nalîn an jî nalan e. ; KBo 32.14 i 1-25//ii 1-25; Neu 1996: 74-77.

dixulxule û pir ber xwe dikeve. Ji ber vê egerê ji nalînê dixeyîde û jêre dest bi ciyûn û çîdaran dike û dibêje: ‘Wey! ev şivira ku li ser sînga min dixwe û vedixwe nifiran min dike ha? Şalê, tîra nêçirvanan lêkeve, bila kewgir wê bigrin û donê wê biqijilînin, bila çerm û qaşilên wê bigurên/hildin!’“

Ev dawiya çîrokê nîne. Çîrokbêj wê tefsîr ango şîrove dike û dibêje: “Lê, tiştta ku min dixwast ez bêjim ne ew e. Ew ne şivir/nalîn e, mirovek e. Wî mirovî cih û warê xwe/arduya xwe terikand û çû welatekî dinê. Ew jî mîna şivirê nankor derket û di derbarê welatê de xwe xirab axaft. Lê belê xwedayên welatê wî jî neleta xwe lê anîn û herwusa ew bû mirovekî neletî û nifirlêbuyî.

Li kutahiya çîrokan wusa diqede, yan jî çîrokên bi coş û xiroşî ji nûve dest pê dikin. Li heman demê di dawiya çîrokên horiyên de bangewaza çîrokek nû tê kirinê.

Mînakî: “Hûn dev li vê çîrokê berdin, ezê ji were yeke dinê vebêjim. Lê, hûn vê baş guhdarkin. Ji ber ku ezê çîrokeke bi fêrebûn û îbretê dagirtî ji we re vebêjim.”

Di kemperiya horîkî û kurdî de: *nalî*, şivir e. Ango pezkûvî yan jî xezal e. Lêbelê di Wejeya Kurdî de têngîniya şivirê weke nalînê jî tê nasîn. Nalîn, hem nav, hem jî têngîniyeke bi Zimanê Horiyan e. Navê çiya jî bi horîkî *paban*, orartuyî *baban* e. Ango ev nav di kurdî de buye banî û beyabanî. Di xwandina bi Zimanê Horîkî û şîroveya wê bi Zimanê Kurdî de wekeheviya herdû zimanan ji xweberê eşkere dibe.

Şivira Nankor bi horîkî:

1. *Nali edi[ye]niş pabanniş melahum,*
2. *nali ulbini pabanni habanab.*
3. *Wuru[b] [t]elu tapşu pabanni şidarillum :*
4. *“Ai nauniye pabanni amelanni tarriş*
5. *u idelanni Teşşubaş, amelanni tarriş ! “*
6. *Pabanni haşimae paru[b] iştani(yi)da,*
7. *nali pabanniş şidarna kulurum :*

8. ”*Iyat(ta) šeduiliyaniš šidara nalliš ?*
9. *u kutte nali kebillašuš !*
10. *haide karen[n]ašuš !*
11. *haidenne aše kebillašuš !*
12. *ašhima[e] karen[n]ašuš ! “*
13. *[n]aali maaannuubur maaanni taršuwaani*
14. *anti taaḥi maaanni aartiitani [t]ùúri*
15. *uulwiineema aammiiib uummiinni*
16. *wuúúru [t]eelu tapšuú*
17. *aartiima amariilluum*
18. *aarti-binéeš eneeš šitilaai*
19. *kuuleeš anti tiiibšaari*
20. *ulaabwaa kaduulli*
21. *amuumaaap šalhuula*
22. *mataaappa kaduulli*

Analîza Çîrokê bi Zimanê Kurdî:

1. ***Nali edi[ye]niš pabanniš melahum***
Nalîn bedeniş baniyîş melahî
Baniyî nalîn ji bedeniş m/nehêla¹¹⁸
2. ***nali ulbini pabanni habanab***
nalîn aliyê hanê beyabanî heband/hevand
nalînê (xwe) heband¹¹⁹ baniyê hêla dinê
3. ***Wuru[b] [t]jelu tapšu pabanni šidarillum***
Fericî tel/til çespî banî/beyabanî cîdar/çîdar¹²⁰
Fericî til (û) çîdar çespande beyabanî¹²¹
4. ***Ai nauniye pabanni amelanni tarriš***

¹¹⁸ “çiyê nalîn ji ser xwe qewitand”

¹¹⁹ Ango xwe hebande çiyayekî; çû çiyayekî dinê.

¹²⁰ Hurr. šidar ‘nifir, ayîk û lenet’ê. Di Zimanê Kurdî de çîdar heye û tewrekî seza danê ye. Ango mina toqa neletê ye. Herwusa wateya neletê jî dide.

¹²¹ Ango “fericî li jorê û nifir li çiya kir”. Çespandin, digel îspatê, wateya erdê xistin, lêxistin û înfazê jî dide.

- Eva naniye banî qemiranî agiriş (jî)
agir/adiriş naniyê banî biqemirîne¹²²
5. *u idelanni Teşşubaş, amelanni tarriş !*
û zidelanî Teşûbiş gum lê hanî atiriş gumîn lê
û ziddê wêTeşûb jî (bi) adiriş gumîn lê haniya!
6. *pabannî haşîmae paru[b] iştani(yi)da*
banî hajê ma pîrbû¹²³ xweyîşaniyê de
banî hajê ma (û) pîr bû di xweyîşaniyê da¹²⁴
7. *nalî pabannîş şîdarna kulurum*
nalîn banîyiş çîdaran qalurimî
banî jî nalînê re çîdar qalerimî¹²⁵
8. *Îyat(ta) şeduîliyaniş şîdara nallîş*
heyhat¹²⁶ sedinîn¹²⁷ çîdara nalîn
heyhat, nalîna ji (min) sediniye jî diare¹²⁸ çîdaran.
9. *u kutte nali kebillaşuş!*¹²⁹

¹²² Ango got: “ *bila agir li çêreya vî çiya keve*” Kurdî qemirandin rengê sotina tiştan e.

¹²³ Pêyva *pîrbû* di wateya tijibûn angî bi hêrsketinê jî dide.

¹²⁴ Xweyîştanî da ‘xwe bi xwe, hundirê xwe de, hişê xwe de, dilê xwe de’, Ango dibêje “Baniyîş/çiya hajê bû/bihîst û di dilê xwe de qehirî”

¹²⁵ *qalerimî* ji pêyvên *qal* ‘behs’ o ‘pêveka ergativê’, *rimî* ‘wek rime’, Hervaha tê wateya *pêyvên mina rime tûj*.

¹²⁶ *heyhat*: ‘hela lê binyêrin’, ‘heyf û mixabin’, ‘hey lo, wey lo, tey lo’

¹²⁷ *sedinîn* sînonîma ‘sekinandin’, rawestan, nîştin’êye. Ji bilî vîna mirov dikare pêyava sitarê jî bi kar bîne. Heta dikarin rengdêra şadiyaniyê jî bi kar binin. Hingê dibê Nalîna ku min şadiye jî bi çîdar e. Ev peyiv ketiye Zimanê Latînî jî: Latînî *sedentaryus* ‘nîşteci, bineci, xweyêci’

¹²⁸ Peyva *diare*, di devokê Suleymaniyê de wateya dayînê tê gotinê.

Herwusa di horîkî de jî di wateya dayînê de ye. Horîkî *şîdara* ‘nifir dayîn, dayîna dijûnan’.

¹²⁹ Horîkî *kebillaşuş* ji bo ‘nêçîrvanê balindeyan’; bi çivîkan re jî dibêjin *aşuş*. Di Zimanê Kurdî de hêlînê re dibêjin aşîyan. Lê belê ev peyiv erebî û farsî de jî heman mehnê de ye. Diyare ji horîkî derbasî nav erebî û farsî buye. Analîz: Horîkî *aş-* di kurdî de *as-* a li despêka asîman e; *-uş* jî di wateya firandinê dide. Ango ya ku li ezmên dimîne. Herwaha kurdî du wateyên pêyva buhuştê hene: buhuşt ‘firîn’, buhuş ‘cinet’. Ji ber van sedeman horîkî

- û kute, kuşt nalîn kebilaşûş
Bikuje nalînê kewan aşiyaniş!¹³⁰
- 10. haîte karen [n] aşûş!**
hayte xwarên¹³¹ aşûş
te hildin/bigrin aşiyaniş xwar!
- 11. haîteen aaşe [k]jibeeîlaşûş**
hildin g/xwaşê wê keban aşûş
hildin xwaşê/goştê (wê) kewan aşiyaniş
- 12. ašhîma[e] karen[n]aşûş**
qaşixê¹³² xwarên aşûş,
qaşilê/qaşixê wê jî aşiyaniş xwaran.
- 13. nalî maanûbûr maannî tarşûwanî**
nalîn mendebirê¹³³ mane¹³⁴ terşwan¹³⁵
Ew menî di birê nalînê ye ma ne terşewane¹³⁶

kebillaşûş ‘neçirvanê balindan’ mirov dikare weke *kevjen buhuştîş* ‘yê ku tîrê davêje firindeyan’ yan jî *kevan aşiyaniş* ‘yê ku kewê di hêlînê de digirê’ biselimîne.

¹³⁰ *bikuje* ‘kutan, lêdan’ e. *pêyva kuştinê* jî guncav e. Di cevherê herdû kiryanan de tundîtî heye. Kewaşiyaniş ji nave kew û aşiyaniş ‘balinde, çivîk, hêlîna çivîkan’. Diyarê nave kewê yan jî bilevkirina dudemîn keb ji horiyaniş de maye. Kew di herêma horiyaniş de ango li Kurdistanê de balinda sereke ya neçirvaniş ye. Diyarê nave wê û neçirvanişê ji hev derhatine. Bi Zimanê Horiyan *kebillaşûş* nêçirvanê balinda ye.

¹³¹ *qerewil* ‘çavdêr, nobedar, zêrevan’ Herusa, wateya nêçirvan jî jê dertê.

¹³² *Qaşil* yan jî *qaşix* herwaha wateya çermî jî dide. Di helbestê de dibêje “bila çermê wê jî nêçirvan hildin.” Herwusa taybetî erkên qaşil û çerm hevşêwe ne.

¹³³ *mendebir* ji *pêyva men* ‘tiştê tê menkirinê, nayê pejirandinê’ û ‘debar ‘idare, rêvebirin’; pir caran weke *mendebûr* têye bi kar anînê.

¹³⁴ *man e* ‘maye, ma, ma ne’

¹³⁵ *Pêyva tarşûwanî* di Zimanê Horiyan de wateya ‘meriyaniş, însaniş’ derbîran dîke. Min di paradîgma wê ya kurdî de *pêyva terşewan* ‘ajalwan, terşdar’ bi kar anî ye. Diyarê *pêyva kurdî terş*, heyvanên kedîkirî, pez û dewar’ ji Hurr. *Tarşûwanî* yê mîrat maye. Herwaha mirov weke jîndarê ku ajalên kedî dîke hatiye hizirkirinê.

14. *an-ti taahî*¹³⁷ *maannî*¹³⁸ *artîtanî*¹³⁹ [t]juurî
 anê dî toxî (me) manî ardûtan direve
 hanê dî toxîmanê ku ji ardûtan direve¹⁴⁰
15. *ûlwînema amiîb*¹⁴¹ *ûmiînî*¹⁴²
 bilî ameyîş bû omanî
 Ew ameyîşê bilî omanî bû¹⁴³
16. *wûrûoda*¹⁴⁴ [t]elu *tapşû*¹⁴⁵
 rênîn, berî da tel û¹⁴⁶ tepişî

¹³⁶ Dixwaze bêje: ‘ew ne nalîn e, ew mirovek e.’ Herwusa men de bir ‘rewşa tê men kirinê, ne ji birên/refên’ angoyê dîzanin nîne, mane ‘dimîne, man’

¹³⁷ Hurr. *taahî* ‘mêrik’, min guncavê wê pêyva kurdî ya *toxî* ‘bo toxim, tovî’ bi karanî. Mêr, weke yê ku toxim direşîne hatiye şîrovekirin.

¹³⁸ Hurr. *maannî* ‘nîne’ Di Zimanê Kurdî de me- ‘pêşeka ku pêyvan vedigerîne rengêşewazê neerênî yê. Angoyê piraniya xwe de tê serê lêkerên fermanî. Mînakî: meçe, mexwe, mevê, medê û hwd. Di yare me- ji Zimanê Horiyan, ne- jî Proto-Hind-Ewropî ma ne.

¹³⁹ Hurr. *artî* ‘bajar’ *artîtanî* ‘bajarê xwe’ ye. Di kurdî de *ardû* ‘ocax’ yanê devera kû agir û dû jê bilind dibe ye. Ji ber vê egerê ew şûna bajar yan jî devera ku mirov ji dayîkê dikare cih bigre.

¹⁴⁰ an, in, cînava îşaretê ye û piranî dî Zaravê Dimilkî de tê bi kar anînê. Di kurmançî de şûna hanê tê gotin. Ev rêzika ku buye ‘hanê dî toxî menî *ardûtan direve*’ Angoyê wateya ‘ew ne merive ji bajarê xwe direve’ dide.

¹⁴¹ Hurr. *amm* ‘gihan, ragihîştin’; *amiîb* ‘ragihîşte, gihîşte’. Wergra vê lêkerê di Zaravayê Dimilkî de ameyîş ‘hatin’, di kurmançî de jî wûşeya amade guncav in.

¹⁴² Hurr. *ûmiînî/ominî* ‘welat, nîştiman’, di kurdî de weke ûman yan jî oman di helbest û nivisarên wêjeyî de tên nivisandinê yan jî gotinê. Pêyva ûman’ê ji horiyan bo kurdî ma ye. Heta gelê Anatoliyê jî vê pêyvê bi kar tîne. Zêdetir ji hêla civatên Elewî tê gotinê. Paradîgma ‘*omanê bilî wêna amade bû*’ wateya çû weletekî dinê dest nîşan dike.

¹⁴³ Angoyê: ‘hate/çû weletekî bilî yê xwe.’

¹⁴⁴ Hurr. *Wûrûoda* ‘nêrîn’ carnan jî di hinek devokan de weke ‘rênîn’ tîye bilêvkirin. Ji bilî wêna mirov dikare gotinên mînanî berî da, fericiya jî bide ber hevokê.

¹⁴⁵ Hurr. *taps* ‘nizim’, *tapşû* ‘tepisî’ di kurdî de tepisî angoyê ‘hate xarê, daket, nizim bû’ ye.

¹⁴⁶ Kurdû tûl/tel û tepişî ‘hilpekîn, qurebûn, dûman rakirin û hwd’

- berî da li tel û tepişi¹⁴⁷
17. artîma amarîlûm¹⁴⁸
ardûm gemarî lêm
gemar kir lem ardûm.
18. artîbineş eneş şitîlai¹⁴⁹
ardû enîyaş ji tehlî
Şenîyên ardûnî jê tehlî ne.
19. kûleş¹⁵⁰ **antîtîbşaarî**
xilas an dî tewsîrê
Xilas anaha tewsîrek dinê¹⁵¹
20. ûlabwa kadûlî¹⁵²
bilê bi vê gotarê
bilî bi vê gotarê
21. amûmaap şalhûla¹⁵³

¹⁴⁷ Pir qure bû, nefsa wî bilind bû.

¹⁴⁸ Hurr. **amarîlûm** ‘xirabî, nebaşî’ ye. Min di hevokê de pêyv mîna gemarî û lêm bi kar anîye. Ev herdû rengdêr jî di meneya pîsî û xirabiyê de ne. Herwusa: **ardûme gemariya lêm** ‘bajarê xwe gemarî û lêm’ dike ye.

¹⁴⁹ Hur. **şitîlai** ‘nelet, nifir’. Li jorê **şidara** di wateya ‘nelet’ û ‘nifirê’ de hatiye nivisandinê. Ji bo weke **şitîlai** be min şûna pêyva çîdar, rengdêra tehlî nivisand. Herwusa: **enîyêş ardûnî jê tehlî ne** dibe ‘pîrozên ardûnê/bajêr wî tehlin.’ Yanê, ‘ji wî hêrs in.’

¹⁵⁰ Hurr. **kûleş** di wateya ‘bihêlê’ hatiye vergerandinê. Dibe ku *xulase* ‘dawî’ rastir be.

¹⁵¹ Nivisara **kûleş antîtîbşaarî** ‘bihêlê çîrokeke dinê bêjim’. Min weke *xilas anaha tewsîrek dinê* selimand. Ango peşniyariya gotina çîrokeke/tewsîreke dinê dike. Herwusa selimandin bi cihê xwe de ye ango bi tekûz e.

¹⁵² Hurr. **kad** ‘got’, **kadûlî** ‘bêjim, gotarî bim.’ Di navbera Zimanê Kurdî yê kevn û nûjen de gelek çar dengên / û r cih dughorînin. Herwusa Hurr. **kadûlî** di kurdiya nûjen de buye *gotarî*. Herwusa: Hurr. **ûlabwa kadûlî** di Kurdiya nûjen de *bilî vê bo we ev gotara* rast e.

¹⁵³ Hur. **amûmaap şalhûla** ‘mesaja min bibîzin’, Min di vê derê de weke *xema min bo salixiya* ango hizra min bo soloxdariyê. Di navbera saloxdarî û bihîstinê de têkelî hene. Ji ber ku *salix*, bihîstina tişt û buyeran e. Dîsa şûna mesajê pêyva *xem* hate nivisandinê. Xem tê wateya hizrê. Herwaha mesaj amûrê hizrê ne.

xema mi(n) bo salixî lê (bin)
xema min naha bo salixdariya

22. *matapa kadûlî*

embaze (bi) gote lê
gotareke bi embaze ye.¹⁵⁴

Şivira Nankor bi Kurdiya Nûjen:

1. Baniyê nalîn ji bedeniş m/nehêla
2. nalînê (xwe) heband baniyê hêla dinê
3. Fericî til (û) çîdar çespande beyabanî
4. agir/adiriş naniyê banî biqemirîne
5. û ziddê wêTeşûb jî (bi) adiriş gumîn lê haniya!
6. banî hajê ma (û) pir bû di xweyîşaniyê da
7. banî jî nalînê re çîdar qalerimî
8. heyhat nalîna ji (min) sediniye jî diare çîdaran.
9. Bikuje nalînê kewan aşiyaniş!
10. te hildin aşiyar xwar!
11. hildin xwaşê/goştê (wê) kewan aşiyaniş,
12. qaşilê/qaşixê wê jî aşiyar xwaran.
13. Ew menê/ne di birê nalînê ye, maye terşewane
14. hanê dî toxîmanê ku ji ardûtan direve
15. Ew ameyîşê bilî omanî bû
16. berî da li tel û tepişî
17. gemar kir lem ardûm.
18. Şenîyên ardûnî jê tehlî ne.
19. Xilas anaha tewsîrek dinê
20. bilî bi vê gotarê
21. xema min naha bo salixdariya
22. gotareke bi embaze ye

¹⁵⁴ Ango ‘anaha çîrokeke îbretê dine ji we re bêjim“.

Ferhengoka Şivira Nankor

| | | | |
|------------------|------------------|------------------|-----------------------------|
| <i>ai:</i> | eger | <i>kulur-:</i> | gotar, got car |
| <i>am-:</i> | sotin, şewat | <i>melah-:</i> | mêla xwe, wê li ha |
| <i>amar:</i> | gemar, xirabî | <i>mannu-:</i> | men e, nîne |
| <i>ami:</i> | cem, cemî | <i>mat:</i> | metih, jîr |
| <i>amu-:</i> | xem, mesaj | <i>nall:</i> | nalîn, şûl |
| <i>anti:</i> | hanê dî, anû | <i>nauni:</i> | nanî, çêre |
| <i>arti:</i> | bajar, ardû | <i>pabani:</i> | banî, beyaban, çiya-banî |
| <i>aşe:</i> | goşt, bi goşt | <i>par-:</i> | peranî, cinawir, |
| <i>aşh-:</i> | çerm, qaşiq/x | <i>purode:</i> | (lêdan) |
| <i>edi:</i> | beden | <i>şalhû:</i> | seh, salix |
| <i>en:</i> | en ..., îni | <i>şedu-:</i> | şidî, qelaw, kok |
| <i>ha-:</i> | girtin, qefandin | <i>şidar-:</i> | çidar, jidar, nifir |
| <i>haban-:</i> | çû ban, heband | <i>tahi:</i> | zilam, toxim |
| <i>haş-:</i> | bihistin, hajê | <i>tapşu:</i> | çepsî, tepisî, jêr |
| <i>id-:</i> | qet, parçe | <i>tari:</i> | adir, agir |
| <i>iştani:</i> | içênî, xweyişanî | <i>tarşuwan:</i> | mirov, teres |
| <i>iya:</i> | çiya, bo çî, aya | <i>telu:</i> | til, tilo, jor |
| <i>kad-:</i> | got | <i>tibşar:</i> | tebsîr |
| <i>karenî:</i> | karitwan, | <i>turi:</i> | terikî, dûrî |
| <i>nêçirvanê</i> | çivîka | <i>u:</i> | û |
| <i>kebili:</i> | kewbir | <i>ulbi:</i> | bilî |
| <i>kut-:</i> | kuta, kuşt | <i>umînî:</i> | welat, oman |
| <i>kul-:</i> | gal, qal | <i>wur:</i> | fêr, feric |
| <i>kuleş:</i> | xilas, bihêle | | |

هه و النامهه كئيب

ĀIROKA TASĒ¹⁵⁵

1. *kāzi tabli-ni-ž*
2. *ḥēlōv-a tab-ašt-ō-m*
3. *tab-ašt-ō-mmuž-ōl-ō-m*
4. *ēlg(i)-āe tun-ōšt-u-m*
5. *agōrn(i)-a ag-ul-ūva*
6. *širn(i)-a-mma taž-ul-ūva*
7. *tab-i-rī-ma ove-ne-ž*
8. *šid-ār-a kābli-ne-ž:*
9. “*āi tab-i-ri (i)f(f)u-vi*
10. *šōni sikk-ūl-(i)li*
11. *egepš-ul-(i)li-ma egē-ni*
12. *fandani ḥērāri*”
13. *tab-(i)rē-nni ḥaž-i-māi*
14. *fār-u ištān(i)-ī-da*
15. *tab-(i)rē-nni alu-īb*
16. *ḥill-ib ištān(i)-ī-da:*
17. “*iyā-t(ta) tab-iliya-ni-ž*
18. *šid-ār-a kabal(i)ni-ž?*”
19. *Kāzi table-ni-ž*
20. *šidarn(i)a kulūrum:*
21. “*idie(n) kāzi*
22. *Teššōba ēlgi sammal-ašt-u(e)ž*
23. *kūd-u kāzi*
24. *pellē-ni ēlg(i)-i-lla.*”
25. *kāzi mānn-ōbur*
26. *mānn-itaržuvāni*
27. *andi fūtki mānn-i*
28. *atta(i)-i-vi tōruve*
29. *teg-ēšt-a-b talmūv-a-b*
30. *atta(i)-i am-ōl-ud-ō-m*
31. *Atta(i)-i-vi-ne-ž-na ene-ž šid-i-lāi*

¹⁵⁵ KBo 32.14 i/ii 42.52

Analîza Çîroka Tasê bi Zimanê Kurdî:

1. *kāzi tabli-ni-ž*
kûzê tablenas
tablenas (hesinkar) kûzek
2. *hêlōv-a tab-ašt-ō-m*
hilovanî tabestî
bi hilovanî tabestand (rokir)
3. *tab-ašt-ō-m muž-ōl-ō-m*
tawbest mijolî
tawbestand mijûland (şikil da)
4. *ēlg(i)-āe tun-ōšt-u-m*
bi qalikê tanî bi beste
qalik tanî bestîne
5. *agōrn(i)-a ag-ul-ūva*
qewarniya haquluva
(h)anî ew qewart bi qulan ve
6. *širn(i)-a-mma taž-ul-ūva*
sirnî toz lê hilva
sirme (kir) toza wê lê hilda
7. *tab-i-rī-ma ove-ne-ž*¹⁵⁶
tevirimê hovane jî
tevrê hovane jî
8. *šid-ār-a kābli-ne-ž*¹⁵⁷
çîdare¹⁵⁸ qabilnasî

¹⁵⁶ Horîkî *tab-i-ri* di wateya mîs yan jî maden hatiye gotinê. Ev pêyv ji Zimanê Horiyan derbasî yê someriyên jî buye. Di zimanê Kurdî de bi wateya tab yan jî tab tê bi kar anînê. Ango ev pêyv di wateya tund û sertkirina lajwerdan tê bi kar anînê. Ji bilî vê, kurdî tevr: amrazê kolanê ye. Ji ber vê egerê di helbestê de *tab-i-ri* weke tevir hate selimandinê.

¹⁵⁷ Horîkî *kablînezi* di wateya 'hosteyê xwe, yê ku ew çêkir' de ye. Di kurdî de qabil 'yê ku dikare', pêyva qabiliyetê ji wir hatiye. Di helbestê de *kablînezi* weke qabilnasî hate wergerandinê û ev jî tê wateya kesê xwaddî qabiliyet, hoste, hunermend, pîşesaz.

- çîdar dan qabilnas
9. *'āi tab-i-ri (i)f(f)u-vi*
ew tawbirî hafê
ew tevrê li hafê¹⁵⁹
10. *Šōni sikk-ūl-(i)li*¹⁶⁰
şeneyî şikîle
şene (dest) lê (bi)şikê
11. *egepš-ul-(i)li-ma egē-ni*
gebso lê ma têkinî
gebsoyî li têkeve
12. *fandani hērāri*¹⁶¹
pendînî xera arî⁶⁴
hindanî xerab arê be.
13. *tab-(i)rē-nni haž-i-māi*
tabiranî hajê ma
tevirbir hajê ma (hajê bû)
14. *fār-u iştan(i)-ī-da*
farişî îştanê da
ferişî xweyiştanî da
15. *tab-(i)rē-nni alu-īb*
tevirbir ilê bo
tevirbir galgalî bu
16. *hill-ib iştan(i)-ī-da:*
halo bi îştanî da:

¹⁵⁸ Horîkî *şidar* 'nifir, nelet' di wergera kurdî de weke çîdar hate selimandinê. Ji ber ku çîdar bi xwe pêyveke ku mehneya wê ya sizakirinê, ya bendkirinê û ya avêtina bendîxaneyan tê gotinê. Ango ji bo kesan bê liv û lebat bihêlin qeyd û çîdar dikin. Ango azadiya wî ji destan digrîn. Ji azadiyê bêpar hîştinê mezitir nifir û nelet nînin.

¹⁵⁹ "Ev tevrê li hemberê min", hafê 'li hember, rûberû, li ser'

¹⁶⁰ Horîkî *şonî* 'dest' di wateya şene 'tirmix' bi kurdiyê re mîrat maye.

¹⁶¹ Horîkî *fandanî* di wateya aliyê rastê hatiye gotinê. Di wergera kurdî de wejke hindanî 'aliyê, hêla, li cem, terefa' hat selimandinê. Horîkî *herarî* ji hêla lêkolîneran weke mil hatiye wergerandin. Lê belê dibe ku xera/xerab rastir be.

- halo bi xweyîştanî da
17. “ *iyā-t(ta) tab-iliya-ni-ž*
 çiyê te tableyanîş
 aya bo çî tableya hanê
18. *šid-ār-a kabal(i)ni-ž?*
 çîdariyara qabilşînaz ?
 çîdaryarê qabilşînas e?
19. *kāzi table-ni-ž*“
 kûzî tablenas“
 kûzî re tabilşînas
20. *šidarn(i)a kulūrum:*
 çîdaran ku lorî ma:
 hema çîdar lorand
21. “ *idie(n) kāzi*
 “etîne kûzî
 biqetîne kuzî
22. *Teššōba ēlgi sammal-ašt-u(e)ž*
 Teşşûba elgeyî şemaq lêş
 Teşûb helqêya (wê) şemaq şikeştiş
23. *kūd-u kāzi*
 keto kûzo
 ket kûz (kûz ayêt)
24. *pellē-ni ēlg(i)-i-lla.*”
 bi lûlê bi helqe lê“
 KN: holanê (lûleyê) helqe lê
25. *kāzi mānn-ōbur*¹⁶²
 kûzî menabere
 ew kuzî ne mutebere
26. *mānn-i taržuvāni*
 an terşewan e¹⁶³

¹⁶² *kāzi mānn-ōbur* “ew kûz nîne“

¹⁶³ Horîkî *taržuvāniv* ‘mirov, insan’ di Zimanê Kurdî de weke terş ‘keriyê ajalên mîna pez û dewaran’, terşdarî û terşewanî jî di wateya karê xayîkirina ajalan e. *mānn-i taržuvāni* ‘en/ew terşewan e/mirov e’

en/ew terşewan e

27. *andi fûtki mānn-i*¹⁶⁴

handî fitikî menê

hanê dî pitikê mene

28. *atta(i)-i-vi tōruve*¹⁶⁵

atayê wî torebîye; atayî dirûvbûve

torebîyê tatayê xwe ye, dirûvê tatayê xwe ye.

29. *teg-ēšt-a-b talmūv-a-b*

têgîşt û telmavî bû

gihişt û telmavû bû¹⁶⁶

30. *atta(i)-i am-ōl-ud-ō-m*

tatayî mehêlîne

tatayê xwe naemilîne

31. *atta(i)-i-vi-ne-ž-na ene-ž šid-i-lāi*

tatayê wînaş êniyêş zidê vî layî

eniyêş (xwedayên) tatayê wî jî zidê wî lawî ne

Çîroka Tasê bi Kurdiya Nûjen:

1. *tablenas (hesinkar) kûzek*
2. *bi hilovanî tawbestand (rokir)*
3. *tawbestand mijûland (şikil da)*
4. *bi qalikê tanî bi beste*
5. *(h)anî ew qewart bi qulan ve*
6. *sirme (kir) toza wê jî hilda*
7. *tevrê hovane jî*
8. *çîdar dan qabilnas*

¹⁶⁴ Horikî *futki* 'kur, law' di kurdî de wateya *pitik* 'zarokê piçûk' tê bi kar anînê.

¹⁶⁵ *atta(i)-i-vi tōruve* "dujminê bavê xwe ye". Hurr. *atta* 'bav' di kurdiya nûjen de weke *tata* hinek binzaravan de tê gotinê. Hurr. *toruve* 'dujmin' di kurdi de weke *dirov/derew*, di Avestayê de *dirûv* 'iblis' tê bi kar anîn. Herwaha di kurdî de 'torebûn' ango hêrsketin jî di vê çarçûvê de ye. Ji ber vê egerê mirov dikare bi çend heb wateyan biselimîne.

¹⁶⁶ *Tel*, di kurdî de meneya *bejnê* tê kar anînê.

9. ew tevrê li hafê
10. şene (dest) lê (bi)şikê
11. gebsoyî li têkeve
12. hindanî xerab arê be
13. tevirbir hajê ma (hajê bû)
14. ferîşî xweyîştanî da
15. tevirbir galgalî bu
16. halo bi xweyîştanî da
17. aya bo çi tableya hanê
18. çîdaryarê qabilşînas e?
19. kûzî re tabilşînas
20. hema çîdar lorand
21. biqetîne kuzî
22. Teşûb helqêya (wê) bi şemaq şikeştîş
23. ket kûz (kûz avêt)
24. holanê (lûleyê) bi helqe ve.
25. ew kuzî ne mutebere (ew ne kûz e)
26. en/ew terşewan e
27. hanê dî pitikê mene
28. torebiyê tatayê xwe ye (dirûvê tatayê xwe ye).
29. gihişt û telmavû bû
30. tatayê xwe naemilîne
31. eniyêş (xwedayên) tatayê wî jî zidê wî lawî ne

SIRÛDA TEŞŞÛB¹⁶⁷

1. *Širadili Teşşub*
sirûdilêm Teşşûb
sirûdê dilêm a Teşûbê
2. *Kumminivi t[alāv(i)ožij] ēvri*
Kumminevê tolazê gewre
gewre û tolazê Kuminê¹⁶⁸
3. *talmaštîli šidori*
telmišta sît-horiyan
dilmestê sît horiyan
4. *nigri eženēvi Āllāni*
nokera ezenê Allaniyê
û Allaniya nokera xozanê¹⁶⁹
5. *Teşşub farižanna*
Teşşûb ferêzana
Teşşûb hat verêzana
6. *Allaniva šeglu*
Allaniyêva şaxilê
li şaxê Allaniyê ve
7. *[h]aigalli kešhi*
kaşê payhelê
Li palgeha kaşî
8. *nahhōža kibudu*
nîxayîşî¹⁷⁰ qubedê¹⁷¹

¹⁶⁷ KBo 32.11; KBo 32.13, 32-13 i 1-6; KBo 32.13 | 7-11; KBo 32.13 | 12-16;
KBo 32.13 | 17-22

¹⁶⁸ Tolaz, di Zimanê Kurdî de mirovên lümpen re dibêjin. Lê belê car caran jib o mirovên bilez û bez, yên jêhatî re jî vê pêyvê bi kar tînin.

¹⁶⁹ Kurdî xozan 'erdê berê hatiye çandinê'. Li di rêzikê de ew bi wateya erdê hate selimandinê. Horîkî *eze*, *îzî*, *eşe* di meneya 'erd, cih' de ye. Herwaha ji nav peyvên kurdî de peyiv û navên têkiliya xwe bi erdê cih re hene mirov dikare di şîrovekirinê de bi kar bîne. Weke: xozan, zozan, axzevî, êşîg û hwd. *Nigrî eženēvi Āllāni* 'dergevana dunya bin erdê Allani'. Allani hevnavê xwedawenda Hebatê ye.

- nîx bû li qubê de
9. *[š]arrî Teššub fažumai*
 şêrî¹⁷² Teššub¹⁷³ fizirî/wajêma¹⁷⁴
 Serwer Teşûb fizirî
10. *Šegan avalineven(e)a*
 Şeqanê awalliyenê
 ji şeqamên hawaliyê¹⁷⁵
11. *Teššub agab kilānab*
 Teşşub neqebê galtenabû¹⁷⁶
 Teşşûb di neqeba galteyan de bû
12. *kešhini naħħab*
 kaşê hanê nîxibî¹⁷⁷
 kaşê hanê nixibî
13. *aviğar(i)nevenella ur(i)il(la)*
 avigarineven¹⁷⁸ li gorên lê
 hewalê hawirgeyek goreyê¹⁷⁹
14. *Adminē keligeleštum*

¹⁷⁰ Hurr. *naħ*: danîştin, rûniştin e. Di kurdî de ev pêyv bi tenê dema ku hestirê didine rûniştinê tê gotinê. Ango bi hêstirê re dibêjin: *îx yan jî nîx*.

¹⁷¹ qube: Avahiya bilind, taq (ango cihê şanaziyê taybet ji bo rojên taybet, mirovên leheng hwd.)

¹⁷² Hurr. *šarrî*: şah, qiral. Min ji bo vî bernavî, nave şêr bikar anî. Ji ber ku şêr jî şahê daristanê ye.

¹⁷³ Teššub, xwedayê bagerê yê horiya ye. Gotina nave teşşûb di Kurdiya nûjen de jî heye. Dema ku nifiran yekî bikin dipêjin “*teşeba/tezeba xwadê te keve*.” Ango “*brûska xwadê tekeve*”; *Tez/tîj* ‘tûj, rim’, *tîşk* ‘brûsk berq’

¹⁷⁴ *fizirîn*: bê agah û bê ku bê zanîn çûn, revîn û hwd.; *wajgerî*: serlêdan, bo karekî yan jî buyerekî serlêdan.

¹⁷⁵ *Šegan avalineven(e)a* ‘ji bervî meydana 3600²’; *ji şeqamên hewaliyê* tê wateya ‘jirêya sereke ya meydana herême’.

¹⁷⁶ *galte*: henek, yarî, kêfxwaşî. Ango “Teşşûb li wê neqebê de dilşad bû”.

¹⁷⁷ *Li kaşê hanê (n)îxibî* (îxbû): ‘li textê hanê danîşt.’

¹⁷⁸ *avigar*: 1800 metro. *Avigarineven* li jorayî: 1800 mt. li jorayî (lingên kursî yê)

¹⁷⁹ Horîkî uri ‘nig, pê’ di wateya goreyê çih girtiye. Ji navê goreyê jî têgiştinê ku demên berê bi kurdî nig yan jî pî re digotin ûrî.

- dimîne kelexhilišta
gelekî keloşke dimana wî¹⁸⁰
15. **Teşşub şattağamāmora**
Teşşûb şatagamamo ra¹⁸¹
Teşşûb jitev xumxumê re
16. **Şurrû timer(i)ne eżeni¹⁸² tûr(i)ne**
çirra temirîna ezmanê dîtirê¹⁸³
çirrand temiriya xozanê dîtirê.
17. **himzathōži Allāni¹⁸⁴**
ximzêhhoze Allani¹⁸⁵
Xizê mpozê Allani
18. **Teşşubva piduffa avida¹⁸⁶**
Teşşûbve pida avîda¹⁸⁷
Ji Teşşûb ve bada çavîn¹⁸⁸
19. **el(i)a¹⁸⁹ fağruž(i)a tândib**

¹⁸⁰ “hewalê hawirgeykiye goreyê”, “dimaneya wî gelekî keloşk e” di wateya ‘nigên kursiya wî 1800 mêtroyî bilindin’ hatiye selimandinê. Hewalê ‘hewqasî’, hawirge ‘dor û berên pîvana wê tê zanîn’, gore ‘gorên ku pê dikin, yan jî nig’, dimane ‘ya lê, yan jî ser dimîne’, gelekî ‘pir, bilind’, keloşk ‘çiya û şaxên ji tehtên bilind’.

¹⁸¹ Teşşûb tevî Şatagmamo

¹⁸² Hurr. *eżeni*: erd, xak, ax. Hurr.: *hawirnî*: ezman’e. Van herdû navan di Kurdiya Nûjen de cih guhortine. Herwusa *eżeni* buye ‘ezman’, *hawirnî* jî buye hawîrdor ango erd.

¹⁸³ Ango çûne dinya bin erdê. Hurr. **tûr(i)**: ‘jêrê, bin’. Lê belê di kurdî de buye dûr. Dîsa koka navê tirbeyê jî ev nava ye. Tirbe: ‘dunya yanjî xaniyê bin erdê. Yan jî cihê venegerê.

¹⁸⁴ Xwedawenda dinya bin erdê. Xanim, xatûn, şahbanû.

¹⁸⁵ *xeml û xwaş(ike) Allani*, ango Allaniyê xwe xemilandiye. Alanî: xanim, xanima Teşşûb e.

¹⁸⁶ Hurr. avî, abî: av/ab ango rû. Di kurdiyê de dibêjin av û rû.

¹⁸⁷ (li) Teşşûb ve pêda avî de ‘berê xwe zivirande Teşşûb)

¹⁸⁸ *Çavîn*, di wateya rû, av û rû ango deveran ku çav têde ne.

¹⁸⁹ Hurr. *el(i)a* ‘alayî, cejn, mirîcan’, Hurr. *fağr* ‘fexir’, Hurr. *tân* ‘kirin’. Herwusa: *el(i)a fağruž(i)a tândib* “cejneke/alayîke fexr tanîn/çê kirin. Di

- eliya fexirêziya tani bû
helhelî bi fexrêzî/fexrî tanî bû
20. *negri eženive allāni*
nokerê ezenivê Allani¹⁹⁰
Allaniya nokera xozanê
21. *uvom¹⁹¹ nūbi pedari*
qewim nūbî pêdar
qewimand de hezar (nūbî) pêdar¹⁹².
22. *Teššubva šavōžini avi*
Teššûb şabaşîna aviya¹⁹³
Seva/seba şabaşiya Teššûb
23. *uvōm nūbi*
qewimand dehhezar
24. *pedari kungallē¹⁹⁴*
pêdarê qûngulî/qûngirî
25. *kīgi nūbi šurōm¹⁹⁵*
sêg dehezar şûrman¹⁹⁶
ku sê dehezar şûrvanan.
26. *šīri māng(i)a tīdibāde¹⁹⁷*

kurdî de lêkerê *dikarim* carnan vediguhêze dibe *ditanim*. *Dikarim* ji Proto-Hint-Ewropî, *ditanim* jî horî ye.

¹⁹⁰ *Nogerê erdê Allani*: Nobedarê dinya bin erdê

¹⁹¹ Hurr. *uvom* ‘serjêkir, kuşt uhwd.’ Di kurdî de qewimand, ango ew li kuştinê qewimand. Hurr. *nūbî* ‘dehhezar’, Hurr. *pedarî* dewar e. Di kurdî de pêd yan jî pêd di wateya simên dewaram de jî tê gotinê. Ango ajalê bi du siman.

¹⁹² Qewimand nūbî pêdar ‘deh hear yên bi pê ango çarpê serjêkir.’

¹⁹³ *Teššubva šavōžini avi* ‘ji bo hilovaniya Teššûb’ ‘bo şabaşîna av ruya Teššûb *av rû* ‘sinc, qencî, namûs’ û hwd.

¹⁹⁴ Hurr. *kungallē* ‘miha dûv qalind’ ango, “deh hezar mihê dûv qalind serjêkir.”

¹⁹⁵ Hurr. *šurōm* ‘şûrveman’, ango bi şûran kuştin serjê kirin.

¹⁹⁶ Şûroma, yê ku bi kêr detî de. Şerjê dike.

¹⁹⁷ *šīri māng(i)a tīdibāde* ‘hesabê jimarane çênebû’ weke sira/jimar têda-pêda menegiya hate selimandinê. Ango “behesap hatin serjêkirin”.

- sirê menegiya têdapêde
sira/jimar menegiya têda-pêda
27. **Šežve havirni**¹⁹⁸
şîş û havirnî
şîşeg û virnî
28. **šagari**¹⁹⁹ **šurōm**
şaxarî şûrimî
sixir şûr û rimî bûn.
29. **farinn(i)nāma**²⁰⁰ **mūsib**²⁰¹
firinîmî mîsa bûn
firinime li mîzan bûn
30. **tapšāgina sugmušab**
tepesîganan jiyekmeşab²⁰²
tepsîgan/sakî jiyêk meşiyān
31. **Fandarinināma agib**
fardarinîmê re qaqib²⁰³
qaqib arêda firna darî re
32. **neğirn(i)a mallad(e)ael(la)**
negeraniya malada
nîgeranniye li malê de
33. **Unib hîr(i)ia**²⁰⁴

¹⁹⁸ Horîkî. *šežve* ‘şîşek, gisik’ *Hurr. havirni* ‘berx’. Di kurdî de gîsikê dermalê re dibêjin *şîşeg*, berx û golikê nû zayî re jî dibêjin *virnî*.

¹⁹⁹ *Hurr. šagari* ‘nêrî’ min ew wek sixir ,dewar’ nixand. Ji ber ku sixir ne bi Zimanê Tirki ye. Ji pêyva *suxre* der tê. Ango, ajalên ku ji bo *suxretiyê bikar tînin*.

²⁰⁰ *nanpêj*

²⁰¹ *Hurr. farinn(i)* ‘nan’, *mūs* ‘mase’ *farinn(i)nāma mūsib* ‘li ser masê rêzbûn). Min farinni ve firinî anga ya ji firnê, anga bi navê nanî nivisand.

²⁰² Yên *tepsiyān/siniyan* digerin.

²⁰³ *firindarîmê* ‘avêtina firinê’, *heqîb(andin)*; *qaqib* ‘qazan’ e.

²⁰⁴ *unib hîr(i)ia* ‘dema anîn’. Min *hanîbûn hera* ‘her hanîbûn/dema ku hanîn’ nivisand. Di kurdî de pêyva her pir wateyî ye. Wateyên wê yê yekser û yên nekser hene. Ji van ewên neyere yek jî jib o demê ye. Ango gava ku ji bo kîjan dem, cih, rengdêr û hwd. Bi kartê, dema wê hinge jî diyar dike.

- hanîbûn xuliya
 xuleya ku hanîn
- 34. *ažuginiva šarri***²⁰⁵
 azxanivî şêrî
 wî serwerî aşxwar
- 35. *Teşşub aźōgini***
 Teşşûb azoxa xwe xwar

Sirûda Teşşûb

1. sirûdê dilêm a Teşşûbê
2. gewre û tolazê Kuminê,
3. dilmestê sît horiyan
4. û Allaniya nokera xozanê.
5. Teşşûb hat verêzana
6. li şaxê Allaniyê ve.
7. Li palgeha kaşî
8. nîx bû li qubê de.
9. Serwer Teşşûb fizirî
10. ji şeqamên hawaliyê
11. Teşşûb di neqeba galteyan de bû,
12. kaşê hanê nixibî
13. hewalê hawirgeyek goreyê
14. gelekî keloşke dimana wî.
15. Teşşûb jitev xumxumê re
16. çirrand temiriya xozanê dîtirê.
17. Bi xizêm poz de Allaniyê
18. Ji Teşşûb ve bada çavîn
19. helhelî bi fexrêzî/fexrî tanî bû
20. Allaniya nokera xozanê
21. qewimand de hezar (nûbî) pêdar
22. Seva/seba şabaşiya Teşşûb.

²⁰⁵ *ažuginiva šarri* ‘aşxwar şêrî’ Hurr. azzik ‘xwarin’ di kurdî de jî aş e. Hurr. azzik. Kurdî ya zik.

23. qewimand dehhezar
24. pêdarê qûngulî/qûngirî.
25. Sê car dehezar şûrvanan
26. sira/jimar menegiya têda-pêda
27. şîşeg û virnî,
28. sixir bi şûr û rim (kirin).
29. Firinime li mîzan bûn
30. tepsîgan/sakî jiyêk meşiyar
31. qaqîb arêda fîrna darî re
32. nîgeranniye li malê de.
33. Xuleya ku hanîn
34. wî serwerî aşxwar
35. Teşşûb azoxa xwe xwar

1. NÎVÎSARA ŞAHÊ HORÎYAN TÎŞ-ATAL²⁰⁶

Analîza bi Kurdî:


| <u>Horîkî</u> | <u>Kurdî</u> |
|-------------------------------------|--------------------------|
| 1. <i>Tiř-atal</i> | Tasê Ato |
| 2. <i>endan</i> | endamê |
| 3. <i>Urkeř</i> | Jorkaş |
| 4. <i>pûrlî</i> | pîrî, pîrozî, pîr û pakî |
| 5. NERGAL | NERGAL ²⁰⁷ |
| 6. <i>pařtôm</i> | bestanm, bestand |
| 7. <i>pûrûli</i> | pîrî, pîrozî |
| 8. <i>andî allî</i> | an dî ilê, dilê |
| 9. <i>Lubadag-ař</i> ²⁰⁸ | Lobadagiř |
| 10. <i>řagr-ô-in</i> | suxrê în e |

²⁰⁶ Wilhelm, *Die Inschrift des Tiřatal...*, in: *Urkesch and the Hurrians, Studies in Honor of Lloyd Cotsen: Bibliotheca Mesopotamica, vol. 26, Malibu, Undena Publications, 1998, pl. XIV.*

²⁰⁷ Xwedayê dogehê li Mezopotamya'yê.

²⁰⁸ Xwedayekî proto-horiyan

- | | |
|-----------------|---------------------|
| 11. (y)emeni(n) | yên, ên |
| 12. tašpi alli | çespî xwalî |
| 13. êni-ya | eniyan |
| 14. hav-aya | hêviya/hawara wa/wî |
| 15. haz-ô-ve-in | hajênavê |



Nivisara Tiš-atal (Muzexana Luwrê) û destnivisa mixi yatablêta Tiš-atal

TIŞ-ATAL BI KURDÎ

„Tasê-Ato endamê Jûrkaş ev pîrozgeha NERGAL bestand. Lûbadagiş suxrereyê in e (wê ye). Emenên (ewên) çespî xwaliyê bikin, Lûbadag jî inî (wîna) çespî ne. Eniyan hawara wî hajê navê.“

DUAYEK BÎ ZIMANÊ HORİYAN²⁰⁹

Ev pêyvên bi Zimanê Horiyan li dema ayînekî de ji bo pesindarî eşkerekirina navên xwedayan hatine gotinê. Di nav pirtûkxaneyên hîtîtiyan de gelek nivisarên bi Zimanê Horiyan jî hatine dîtinê. Mijara piraniya wana yên wêjeyî û ayînî ne. Tê gotinê ku hîtîti di bin saya Çanda Horiyan da bûn. Bandora Çanda Horiyan li ser gelên herçar hêlên welatê wan buye.

1. *hur-li-li-ki-iş-ša-an me-ma-I*^d *Hebad m^ružⁿni*
2. *haž-o-l-ēž*²¹⁰ *Hebad*^d *Šarruma haž-o-l-ēž*
3. *Daru*^d *Dagidum*^d *Hodena*^d *Hodellur(i)r[a(<na)]*²¹¹
4. *haž-o-l-ēž en(i)-na heyaronna ašt(i)-o-hhe-na*
5. *wimmašš-i-až šalann-i-až haž-o-l-ēž*

-
6. *tōni tābri haž-o-l-ēž*^{GB} *kešhi*
 7. *adāni haž-o-l-ēž āgrošhe huprošhi*
 8. *haž-o-l-ēž nerambi šalanni*
 9. *[h]až-o-l-ēž nu-uš-ša-an*^{LU} *AZU*

Analîza Duayê bi Zimanê Kurdî

1. (Ew Hurîkî dibeje): Hebat/Hewa (tu) Mezinî!
2. hez û hesanî²¹² (ji bo) Hewa (Hebat) û Şero yê me!

²⁰⁹ Dennis R. M. Campbell, Observation on the Lyric Structure of Hurrian Songs and the Fragment KBo 35.39., ChS 1/5 1 iii

²¹⁰ Di wateya bi rûn ve mesih kirine. Bi tekûz wateya rûnkirinê dide û di nav kiryarên kurdî de mina qijilandin, kizirandin bi kart e. Di niyazê de behsa rune ron ango qijilî hatiye kirinê.

²¹¹ Îro jî kurd di niyaz û bergerên xwe de dibêjin *xweda û xwedaleran*.

^d *Hodena* û ^d *Hodelluri*, xwedawendên horiyan yên çarenivîsê ne.

²¹² Min di vê babetê de bi zanetî biwêja hez û hesanî bi kar aniyê. Ji ber ku mesihkirin tê wateya hez kirin û hesandinê. Mîna pišta yeki mizdin, sere zarokekî mizdin û hwd. Ça hebe *Hesan* di kurdî de nave kevirê rûni ye û pê metalan tûj dikin. Herwaha horî û hîtîti di ayînê de rûn weke teberikê bi kar tînin.

3. Dara, Degidî (û) Xudeyan Xudaleran re!²¹³
4. hez û hesanî (ji bo) heyaniya/xiriyana²¹⁴ êniyên²¹⁵ sîti xanan!²¹⁶
5. hez û hesanî (ji bo) keştiya lê nîştinê!
6. Hezî ji (bo) Wîmaş û Şalanayê²¹⁷,
7. hez û hesanî (ji bo) keştiya ji tewrê tewiyan!
8. hetanî hez û hesanî (ji bo) axreşê hebrosê!
9. hez û hesanî (ji bo) neramên şalanan²¹⁸!
10. Hez û hesanî (ji bo) nîşanên lo lo AZÛ!²¹⁹

²¹³ Ev navy an j3ı sînonîma nave xwedayên horiya ne.

²¹⁴ Hur. *deyari*, Kurdî xir 'hemû', *heyaronna* jî dibe xiranan ango hemuyan.

²¹⁵ Hur. Enî, Kurdî 'xweda, en bilind', eniya 'xwedayan'. Kurdî enî, îni, êni wateya pîroz, roja pîroz, roja îniyê derbîran dike. Pêyva en şûna paşeka -tir, -tirê dibe en bilind, en nizim, en xurt û hwd. Herwaha ketiye nav Ziman3e Tirkî jî.

²¹⁶ Hurr. *ašti/ašte* 'jin', di Zimanê Kurdî de buye sit, sitî, sîtê. Herwusa *ašt(i)-o-hhe-na* di kurdî de weke sitî xanan, ango sitê xanan+sitî xaniman.

²¹⁷ Ango şabaşî li xwîşka xwedayan re.

²¹⁸ Şala, di wateya xwîşkê de ye; nera jî dayîk e. *haž-o-l-ēž nerambi šālanni* wateya mesihdikim xwîşk û dayîkê. Ji ber ku xwedawenda Hebat'ê dayîka,

²¹⁹ LU logorama ji Zimanê Sumeriyan e. Di hemûnivisarên mixî de, dema behsa mirovan tê kirinê wek kilîlekî tê ser navan. ^{LU}AZU mirovê li Azu'yê ye. Diyare behsa kesekî ji wê derê dike. LU di kurdî de buye lo 'bangawaza ji bo mêran'.

BORAQ Jİ BO AŠTARTE Ū ŠAUŠKA²²⁰

1. [dbḫ: tṯrt]²²¹ *boraq Šauška²²² (yê re)*
 2. [qrat: bgrn]²²³ *di eywanê de ji ber xwe dixwînin.*
 3. [aṯxlm: ṯutkd] [asxulumma²²⁴ sauskada]
Aš ṣuxulî (bi) Šauška (yê) re,²²⁵
 4. [agndym: ṯdndy] [agandijama sadandija]
bi Agandijama ū sadandija re,
 5. [inmty: inxzy] [en-umasija eni-xadzidzija]
enê hemasê, enê xwehesiyê re
 6. [kzgd: inxmnd] [kudzugada eni-xamunda]
Kušuhê²²⁶ (re), enê Xumanê re
 7. [nntd klt] [ninatada kulitada]
Ninattayê, Kulittayê
 8. [nbdgd: wlbtdm] [Nubadigada, walibibetadama]
Nubadig re di warêbabeta de
 9. [aṯxlm tu: ṯk tizrpnm] [asxulumma sauskatizrpnm]
[asxulumma sauska tiaxra (e) painima (?)]
aš ṣuxul bixura painima (?) (teberik) Šauškayê re
-
-
10. [wbbt: aṯxlm] [wbbt: asxuluma]
